

# KANÎZAR

Kovara Zimanê Kurdî hejmar 6 6-7 /2016

## Naveroka Hejmara 6

### Sernivîsar

Vekolînên kurdî bi hemû zarên me

### Husein Muhammed

Cînav – peydabûn û bikaranîna wan

### Nirxandin

"Ferhenga Termên Matematîkê"  
ya Dilawer Zeraq û Mem Wenda

### Ehmed Kirkan

Ferhengnasiye û Ferhengnasiya M. Malmisaniyê

### Nasandin

"Kurterêziman û ferhengoka kurdî" ya Samuel A. Rhea

### Peter Trudgill

Ziman û grûpî êtnîkî (wergêran: Hesen Qazî)

### Roşan Lezgîn

Di çapemeniya kurdî de tecrûbeya Newepelê  
(ji zazakî: Husein Muhammed)

### Fêrgîn Melik Aykoç

Tewang

### Emîr Hesenpûr

Lexical modernization and purification

### Théotime Chabre

Languages of a stateless nation

### Zarname

Ferhengoka zimannasî ya kurdî-inglîzîa

### Kurterêbera rastnivîsînê

## Sernivîsar

### Vekolînên zimannasî bi hemû zarên me

Kovara zimanê kurdî *Kanîzar* di belavkirina vekolînên zimannasî yên kurdî de bi pirzarî anku pirlahceyî berdewam e. Di vê hejmarê de em komeke vekolînên zimannasî bi kurmancî, soranî û zazakî pêşkêş dikin. Herwiha em cih didin du nivîsarên bi inglîzî yên li ser zimanê kurdî.

**Husein Muhammed** vê carê bi berfirehî peydabûn û awayên bikaranîna cînavan di kurdî de vedikole. Lêkolîna wî ya dirêj dê di hejmara 7 de jî bidome.

**Ehmed Kirkan** dîroka ferhengsaziya kurdî – bi taybetî ya zazakî – bi pêşkêşî xwandevanên me dike. Berhemeke din ya derbarê weşanên bi zazakî nivîsareke **Roşan Lezgîn** e ku em li vê derê wergera wê ya kurmancî belav dikin.

Di vê hejmarê de jî em weşandina kitêba profesor **Peter Trudgill** ya li ser zimannasiya civakî (sosyolingwîstîk) bi soranîkirina **Hesen Qazî** didomînin. Mijara vê carê têkiliyên navbera zimanî û komên etnîkî ye.

**Fêrgîn Melik Aykoç** vê carê bi berfirehî û bi nimûneyên mişe li ser tewangê anku tewandin û çemandinê di kurdî de dinivîse.

Nivîsarên me yên inglîzî yek ji **Emîr Hesenpûrî** ye û derbarê dîroka nûjenkirin û paqijkirina peyvên di zimanê kurdî de ye. Nivîsara din ya bi inglîzî ji **Théotime Chabre** ye û li ser "zimanên neteweyekî bêdewlet" anku derbarê rewşa zar û zimanên kurdî ye.

Wek berî niha jî, di vê hejmarê de jî em du berhemên li ser zimanê kurdî (yeke nû û yeke kevn) dinasînin û dinirxînin. Ya kevn kurterêzimana kurdî ya **Samuel A. Rhea** ji sala 1869 e. Ya nû jî "Ferhenga Termên Matematîkê" ya **Dilawer Zeraq** û **Mem Wenda** ye.

*Zarname* anku ferhengoka Kanîzarê ya peyvên zimannasî ya kurdî-inglîzî vê carê jî hatiye berfirehkirin û li dawiya kovarê tê weşandin. Li dawiyê herwiha kurterêbera me ya rastnivîsînê jî hatiye belavkirin.

Bi hêviya ku bi dilê we be!

# CÎNAVÊN KURDÎ – PEYDABÛN Û BIKARANÎNA WAN

**Husein Muhammed**

## 1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Di zimannasî û rêzimanê de, **cînav** (bi inglîzî *pronoun*) ew peyv in ku dikarin cihê navdêran yan jî komikên navdêran. Navê cînavan jî ji vê tê: cî-nav anku cîgirên navan yanî peyvên ku cihên navan/navdêran digirin.

Cînav yek ji komên serekî yê birrên peyvên in (li gel navdêr, lêker, rengdêr û hokeran.) Cînav bi xwe ji çendîn jêrkoman pêk tî:

- **cînavên kesî** (bi inglîzî *personal pronouns*): ez/min, tu/te, em/me, hûn/we, ew/wê, wî, wan
- **cînavê lêveger** (*reflexive pronouns*): xwe
- **cînavên beramberiyê** (*reciprocal pronouns*): hev, hevdu, hevûdin, yekûdu...
- **cînavên nîşander** (*demonstrative pronouns*): ev, ew, vê, vî, van, wan...
- **cînavên pirsyarkî** (*interrogative pronouns*): kî, çi, kîjan...
- **cînavên têkiliyê** (*relative pronouns*): yê ku, ya ku, yên ku...
- **cînavên nediyar** (*indefinite pronouns*): her, ti, hin, ya/yê/yên din...

Di rêzimannasiya kurmançî de çendîn formên peyva cînav hatine bikaranîn: cînav, cînavk, cihnav, cihnavk. Forma soranî bi piranî "cênaw" e. Ji bilî van, herwiha peyva "pronav" ji "pro-" ya ewropî (bidin ber "pronom" ya fransî yan "pronoun" ya inglîzî) û "nav" anku "navdêr" ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatibû çêkirin û bikaranîn û heta vê dawiyê jî hin kes bi kar tînin lê xebitandina wê ber bi kêmbûnê ve ye. Herwiha peyva "zemîr" ya erebî (carinan di bin tesîra tirkî de bi forma "zamîr") jî di rêzimannivîsîna kurdî de (b taybetî di zazakî de) tê emilandin.<sup>1</sup>

<sup>1</sup> Binêrin bo nimûne: Îbrahîm Seydo Aydogan: Rêzimanên kurdî û termînolojiya wan ya zimannasî:

<http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/lb.Seydo-terminoloji.pdf>



Di vê vekolîna xwe de em ê ji van peyvên forma “cînav” bi kar bînin hem ji ber ku ew ji yên din kurttir û siviktir e û hem jî bi taybetî ji ber ku li gor lêgerînên me ew di rêzimanivîsîna kurmancî de niha ji formên din zêdetir tê bikaranîn. Bo nimûne, di lêgerînên bi alîkariya Google, mirov dikare bibîne ku “cînav” beramberî van peyvên din di kurdî de serdest e.

Li cihê peyva “kesî” di gotina “cînavên kesî” de ji aliyê hin nivîskarên ve peyvên “kesîn” yan “kesane” jî hatine bikaranîn. Herwiha hin caran peyva erebî “şexs” jî bi heman wateyê tê nivîsîn.

Di warê cûreyên cuda-cuda yên cînavan de termînolojîya me hê baş cihê xwe negirtiye bi taybetî jî ji ber ku – ji bilî cînavên kesî –cînavên din yên kurdî kêr hatine vekolîn. Yek ji kêr kesên ku ew bi pîralî li ser parvekirina cînavan rawestiye û hewl daye navên zimannasî jî ji komên cuda yên cînavan re peyda bike, Deham Ebdulfettah e di kitêba xwe “Cînav di Zimanê Kurdî de”.<sup>2</sup>

Bi qasî ku mimkin be, em ê termînolojîya heyî û cihgirtî bi kar bînin. Eger navê komeke yan diyardeyeke têkilî cînavan cihê xwe negirtibe û çendîn peyvên cuda di nav rêzimanivîsîna me de bê bikaranîn, em ê tê bikoşin li gor şertên peyvsazî û wenasî forma maqûl bibijêrin. Eger du yan zêdetir formên baş hebin, em ê ya zêdetir li kar bixebitînin.

Carinan hin peyv hatine çêkirin lê li gor peyvsaziya xwe yan jî wenasîya xwe, bi qenaeta me, ne di cih de ne. Hingê em ê diyar bikin ka ew çima bi kêr nayên û hewl bidin li gor zimanên din, bi taybetî li gor inglîzî, navekî nû jê re çêkin.

## 2. EV VEKOLÎN Î YÊN BERÎ WÊ

Cînav yek ji birrên serekî yên peyvên in (li gel navdêr, lêker, rengdêr û hokeran). Lom hema-hema di her rêzimanameya kurdî de behsa wan jî tê kirin. Lê dîsa jî bi dîtina me vekolînên tîr û tesel hê li ser vê mijara bingehîn nehatine encamdan.

Tek berhema taybet li ser cînavên kurmancî kitêboka “Cînav di kurdî de” ya Deham Ebdulfettah e. Wek din, cînav tenê wek beşek ji rêzimana kurdî, bi kurtî, di kitêbên rêzimanê de ketine ber vekolîn û nivîsînê.

<sup>2</sup> Kitêb hem li Dihokê û hem jî li Diyarbekirê hatiye çapkirin. Malpera *Zimannas* ew li ser Internetê belav kiriye:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/05/15/cinav-di-kurdi-de/>

Nivîsîna li ser cînavên kurdî heta niha bi giranî li ser cînavên kesî û mijara çemandina anku tewandina wan rawestiyaye. Cînavên din bi kurtî tîn behskirin an jî heta bi temamî tîn piştguhixistin. Ew ne baş hatine rêzkirin, ne sinifandin û ne jî bikaranîna wan ya cuda di ware çemandinê de bûye mijara vekolînên kafî.

Cînavên kesî wek raveker hatine behskirin (bo nimûne “kitêba min”) lê ne wek raveber (bn. “ez ê reben”, “tu yê hêja”).

“Vekolînên” li ser cînavan yê heta ji vekolînên zimannasî zêdetir ferzkirinên “filan awa rast e, bêvan şêwe şaş e”. Cînavên devokî nehatine vekolîn – her kesî tenê behsa formên “standard” û “rast” kiriye.

Berhevdana cînavên kurdî/kurmancî di navbera zar û zimanên din de yan kêma in yan qet peyda nabin. Peydabûna cînavên kurdî anku etîmolojiya wan nehatiye vekolîn. Rastnivîsîna cînavan – bi taybetî nivîsîna wan û peyvên din ji hev cuda yan bi hev re (“ez ê biçim” yan “ezê biçim”, “tu yê hêja” yan “tuyê hêja”) nehatine behskirin.

Yek ji mijarên kêma-vekolandî, bi dîtina me, kurtbûn û ketina yan kurtkirin û xistina cînavan e. Herwiha kirpandina cînavên kurdî jî heta niha bi qasî pêwîst bala zimannasên kurd û biyanî nekişandiye ser xwe.

Ev vekolîna me ne ji valahiyê dest pê dike. Me hewl daye hem encamên vekolînên cuda-cuda yê li ser zimanê kurdî bi vê vekolînê bigihînin hev, hem wan di vekolîn û sinifandina wan de vekolînên navneteweyî yê derbarê cînavan<sup>3</sup> li ber çavan bigirin û hem jî dîtînen xwe di gelek warên hê di kurdî de venekolandî pêşkêş bikin.

<sup>3</sup> Çavkaniya me ya serekî ya navneteweyî *Pronouns* (Cînav) ya D. N. S. Bhat e:  
[https://books.google.fi/books/about/Pronouns.html?id=-w2H9xRjJCMC&redir\\_esc=y](https://books.google.fi/books/about/Pronouns.html?id=-w2H9xRjJCMC&redir_esc=y)

### 3. CUDAHIYA CÎNAVAN JI BIRRÊN DIN YÊN PEYVAN

#### 3.1. Wekheviyên cînav û navdêran

Ji nav birrên din yê peyvan (navdêr, rengdêr, hoker, lêker), cînav bi taybetî dişibin navdêran. Hem navdêr û hem jî cînav:

- dikarin wek biker (kirde, subjekt, fail) bên bikaranîn:
  - o *Heval* dibêjin
  - o *Ew* dibêjin
- dikarin wek berkar (bireser, objekt, mefûl) bên xebitandin:
  - o *hevalan* dibînim
  - o *wan* dibînim
- xwedî formên neçemandî (netewandî) û çemandî (tewandî) ne:
  - o *heval* → *hevalê*, *hevalî*, *hevalan*
  - o *ew* → *(e)wê*, *(e)wî*, *(e)wan*
- xwedî formên yekhejmar û pirhejmar in:
  - o *sêvekê* / *sêvan*, *bajarekî* / *bajaran*...
  - o *wê* / *wan*, *ez* / *em*, *tu* / *hûn*...

Ji xwe – wek ku ji navê cînavan jî diyar e – cînav li cihê navdêran tên bikaranîn:

- *heval* dibêjin → *ew* dibêjin

Herwiha cînav li cihê komikên navdêrî (noun phrases) jî bên bikaranîn. Mebest ji “komika navdêrî” navdêrekî raveber û ravekerên wî ne. Bo nimûne (di nimûneyan de komika navdêrî di nav kevanên kujîdar [...] de hatiye nivîsîn:

- [*bira*] *hat* → *ew hat*
- [*birayê min*] *hat* → *ew hat*
- [*birayê mezin*] → *ew hat*
- [*birayê min ê mezin*] *hat* → *ew hat*
- [*birayê min ê mezin yê pir hêja*] *hat* → *ew hat*

### 3.2. Cudahiyên cînav û navdêran

Tevî gelek wekheviyan jî, dîsa cînav û navdêr bi çend awayên giring ji hev cuda ne:

**Ji aliyê çemandinê ve** navdêr bi piranî li gor heman rêbazê diçemin lê çemîna cînavan bi piranî awarte û istisnayî ye, ne li gor ti qeydên diyar in. Piraniya navdêran li gor mêyîtî, nêrîtî û pirhejmariyên paşgirên “-ê, -î, -an” di halê çemandî de werdigirin:

- sêv (mê) → sêvê, sêvan
- bajar (nêr) → bajarî, bajaran

Lê çemandina cînavan kêr-zêde “keyfî” ye û ne bi ti qeydên giştgir e:

- ez → min
- tu → te
- em → me
- hûn → we
- ew → wê / wî / wan

Lê di çemandina kesê sêyem “ew” de cînav jî di rastiyê de dişibin çemîna navdêran. Tarîxiyên formên çemandî yên cînavê “ew” wiha bûn: “ewê, ewî, ewan”. Heta niha jî ew li gelek deveran li kar in lê formên “wê, wî, wan” serî ji wan standiye formên qusandî “wê, wî, wan” niha serdest in. Mirov dikare bi hêsanî bibîne ku varyantên “wê, wî, wan” li gor çemandina navdêran in:

- ew → ewê (bidin ber: sêv → sêvê) → wê
- ew → ewî (bidin ber: şêr → şêrî) → wî
- ew → ewan (bidin ber: gund → gundan) → wan

**Ji hêla watenasî ve navdêr binaverok in, naveroka cînavan tenê ji pêşrewa wê diyar dibe.** Mebest ji vê ew e ku naveroka navdêrekê ne giranî bi hevokê ve girêdayî ye. Bo nimûne, bêyî ti hevokê jî, wek peyveke bi tenê jî em ê kêr-zêde fehm bikin ka mebest ji “sêv” an “heval” çî ye. Lê wate û naveroka cînavan, bo nimûne ya peyva “ew” “vala” ye: bêyî kontekstê, ti tişt ji peyva “ew” nayê fehmkirin.

Naveroka cînavan ji **pêşrew** an *antedenta* (bi inglîzî *antecedent*) wê diyar dibe. Di zimannasiyê de mebest ji *pêşrewê ew* navdêr an komika navdêrî ye ku paşî cînav li cihê wê tê bikaranîn. Bo nimûne:

- Xox xweş in. Evîndarê wan im. (Xox pêşrew anku antecedent e û wan cînav e.)
- Dotmama min a delal helbestvan e. Wê du dîwan dane çapkirin. (Dotmama min a delal pêşrew e û wê jî cînav e ku cihê dotmama min a delal digire.)

**Ji aliyê berfirehbûnê ve navdêr berfirehtirîn anku mezintirîn birra peyvan e lê cînav dikarin wek biçûktirîn an tengtirîn birra peyvan bînin hejmartin.** Navdêr herwiha birreke vekirî ne lê cînav birreke girtî ne. Mebesta me ji “vekirî” ew e ku peyvên nû (“endamên nû”) dikarin li komê zêde bibin. Navdêr ji her birra din ya peyvan pêşwazîkertir e anku hêsantir peyvên nû yê çêkirî yan jî ji zimanên din wergirtî qebûl dike.

Mebest ji “cînav birreke girtî ne” jî ew e ku cînav birreke peyvan a wisan in ku qet (yan bi hêsanî) peyvên nû lê zêde nabin.

**Ji aliyê dîrokî ve cînav xweragir û navdêr veguhêzbar in:** Piraniya cînavên kurdî ji zimanê makezimanê proto-hindûewropî heta niha di kurdî de hene. Ne hejmareke mezin ya cînavên nû lê zêde bûye û ne jî jê ketiye.<sup>4</sup> Berevajî wan, piraniya navdêrên kurdî yê niha ne ji proto-hindûewropî ne anku yan bi nisbî nû hatine çêkirin yan jî bi hin peyvên ji hin zimanên din hatine veguhastin.

**Ji aliyê avanî (struktûr) yan dirêjahiya xwe ve cînav bi piranî ji navdêran kurttir in.** Piraniya cînavên bingehîn yê kurmancî du- yan sê-herfî ne:

- duherfî: ez, tu / te, ew / wê / wî, em / me, we
- sêherfî: min, hûn, wan

Heta ji hin ji van cînavên sêherfî re jî di zimanê devkî de formên “mi, wa” yê duherfî hene.<sup>5</sup> Li aliyekî din, di hin devokan de varyantên 4-herfî jî peyda dibin (forma kurmanciya standard di kevanokan de):

- “hewe” (we) di hin devokên kurmanciya rojhilatî de (bo nimûne li Dihokê)

<sup>4</sup> Ev qeyd û bend ne bêistisna ne. Bo nimûne, cînavê “her” (wek di peyva “herkes”) de ji zimanên îranî derbazî tirkî bûye.

<sup>5</sup> Li aliyekî din, di soranî de hejmara cînavên sêherfî zêdetir e: ême (em), êwe (hûn). Herwiha di soraniya mukriyanî de li cihê cînavê “to” (tu) yê duherfî forma “eto” heye û li şûna “min” (ez) ya sêherfî jî varyanta “emin” jî li kar e. Wek di hin devokên kurmancî de, di hin devokên soranî de jî “hingo” ya pênc-herfî jî peyda dibe.



- “vêna, vîna, vêya, viya, wêna, wîna, wêya, wiya” (vê, vî, wê, wî) di hin devokên kurmançiya navendî de (wek mînak li Mêrdînê)<sup>6</sup>
- “wana, vana” (wan) di çendîn devokan de<sup>7</sup>

Di hin devokên sinorî yê navbera kurmançî û soranî de li herdu aliyên heta cînavêkî pêncêrfî jî heye: “hingo” ku formeke neçembar ya li cihê “hûn, we” yê kurmançiya standard in.

Herçî navdêr in, ew di kurdî de bi piranî ji sê yan zêdetir denga/herfan pêk tên tevî ku hin navdêrên duherfî peyda dibin.

Hemû cînavên neçemandî û çemandî bi formên xwe yê serdest di kurmançiya nivîskî de yekkîteyî ne (li gor devokan û di soranî de herî zêde dukîteyî). Piraniya navdêrên xwerû yê bingehîn jî di kurdî de yekkîteyî ne lê hemû navdêrên çemandî bi kêmkî dukîteyî ne. Herwiha hemû navdêrên pêkhatî jî dukîteyî yan pirkîteyî ne.

**Ji aliyê ravekirinê ve.** Pevgirêdana navdêran wek raveber bi navdêr, cînav an rengdêrên ravekerên wan ve di kurdî û piraniya zimanên îranî de diyardeyeke giştî û berbelav e. Di ravek an ravekirina navdêran de peyva serekî li destpêkê ye û ravekera wê an şirovekera wê – ya ku maneyeke taybet didiyê – li pey tê. Bo nimûne:

- sêva Fatê (ne her sêv)
- sêva wê (ne her sêv yan ne sêvên kesên din)
- sêva sor (ne sêvên ji rengên din)

Di nimûneyên me de “sêv” **raveber** e anku dikeve ber ravekirin û şirovekirinê û “Fatê, wê, sor” **raveker** in anku wê rave / şirove dikin: li vê derê xwedîya sêvê yan rengê sêvê diyar dikin.

Wek prensîp, cînav jî di kurdî dikarin bibin raveber:

- ez ê reben
- tu yê hêja
- ew a min
- ew ê sor

<sup>6</sup> Bi eslê xwe ev ne cînavên xwerû lê yê pêkhatî ne ji gotinên “wê-ya han, ew-a han” û hwd.

<sup>7</sup> Bi eslê xwe “wana, ewana” pirhejmariyên duçarî ne, ji “ew-an-a[n]”. Bo pirhejmariya duçarî di navdêran de, binêrin:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/05/01/pirhejmariya-ducari/>

Lê peyvên ku ravekeriyê re ji cînavên “ez, ew, em, hûn” re dikin di pratîkê de kêma in. Ravek wek prensîp li gel cînavê “ew” (nêr, mê, pirhejmar) zêdetir heye lê di pratîkê de bi taybetî kurmanciya navendî û ya nivîskî hingê cînavê “ew” diavêje û tenê cînavên têkiliyê “(y)ê, (y)a, (y)ên” bi kar tîne:

- ew ê hêja → yê hêja, ê hêja
- ew a sor → ya sor, a sor
- ew ên mezin → yên mezin, ên mezin

Ji hêla berhevdanê ve jî cudahiyan navdêr û cînavan hene. Gelek ji navdêrên kurdî dikarin bêyî ti pêşgir an paşgirên peyvsaz wek rengdêr jî bî bikaranîn û berhevdan. Bo nimûne, “şêr, ker, piling, kûçik” navên hin heywanan in anku ji aliyê birrên peyvan ve navdêr in lê ew di heman demê de dikarin wek rengdêr jî bî bikaranîn.<sup>8</sup>

- şêr: wêrek
- ker: bêaqil

Heman peyv dikarin wek rengdêran bî berhevdan:

- “şêr, şêrtir, şêrtirîn, herî şêr” wek “mezin, mezintir, mezintirîn, herî mezin”.

Lê cînav wiha nayên berhevdan:

- “ez, \*eztir, \*eztirîn, \*herî ez”

<sup>8</sup> Bo bikaranîna wiha ya navên gelek heywanan, binêrin Kovara Kanîzar, hejmar 5: *Heywan bi mecazî*: <https://zimannas.wordpress.com/2016/04/07/heywan-bi-mecazi/>

## 4. CÎNAVÊN KESÎ

### 4.1. Cînavên kesî di kurdî de

Mebest ji cînavên kesî ew cînav in ku dikarin cihê navên kesan bigirin.

Cînavên kesî di kurmancî de “ez, tu, em, hûn, ew” û formên wan yê çemandî “min, te, me, we, wê/wî/wan” in. Ev formên serdest yê kurmanciya nivîskî ne. Bo varyantên cuda yê devokî û zaravayên din yê kurdî, li jêrtir binêrin.

Di rêzimanivîsîna kurmancî de gelek caran behsa cudakirina cînavan li gor formên wan yê xwerû/neçemandî (netewandî) û çemandî (tewandî) tê kirin. Lê ev tenê yek ji awayên parvekirina cînavan e. Di kurmancî de cînav (hemû yan hin ji wan) dikarin li gor çend rêbazan bîn parvekirin

- **hejmara rêzimanî:** yekhejmar “ez/min, tu/te, ew/wê/wî” û pirhejmar “em/me, hûn/we, ew/wan”
- **kesê rêzimanî:** kesê yekem (ez), kesê duyem (tu), kesê sêyem (ew)
- **cînsê rêzimanî:** bo nimûne mê “wê” û nêr “wî”

Di kurmancî de du desteyên cînavan hene. Yek ji wan xwerû ye yan neçemandî ye (netewandî ne), yê din jî çemandî ne (tewandî ne). Di tabloya li jêr de em ê formên serdest di kurmanciya nivîskî de wiha ne (bo formên devokî li jêrtir binêrin):

cînav	neçemandî	çemandî
1. yekhejmar	ez	min
2. yekhejmar	tu	te
3. yekhejmar	ew	wê / wî
1. pirhejmar	em	me
2. pirhejmar	hûn	we

**3. pirhejmar**

ew

wan

Wek ku ji tabloyê diyar e, formên çemandî di hemû cînavan de ji formên neçemandî cuda ne. Di kesên yekem û duyem de yên yekhejmar (1. ez/min 2. tu/te) ji yên pirhejmar (1. em/me 2. hûn/we) cuda ne.

Lê kesê sêyem yê yekhejmar yê neçemandî û kesê sêyem yê pirhejmar yê neçemandî herdu jî wek hev in anku "ew" in. Lê dîsa di halê çemandî de ew jî ji hev cuda ne: yekhejmar "wê/wî", pirhejmar "wan".

## 4.2. Mane û mebesta cînavên kesî

### ez / min

Di zimannasîyê de cînavê "ez / min" bi navê "cînavê yekem yê yekhejmar" tê nasîn. "Ez" cînavê yekem yê yekhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "min" jî cînavê yekem yê yekhejmar yê neçemandî anku netewandî ye.

Ev cînav hingê tîn bikaranîn dema ku qiseker behsa xwe dike:

- Ez kurd im.
- Ez van tiştan dinivîsim.
- Ehmed min nas dike.
- Min got.

Anku qiseker (kesa/ê ku diaxive) û qiseber (kesa/ê ku behsa wî tê kirin) eynî ye û keseke/î bi tenê ye. Ew dikare mîr an jî jin be. Ji bilî di hin çîrokên xeyalî de, ew illeh mirov e (ne heywanek an tiştek e) ji ber ku tenê mirov diaxivin û bi zimanê me behsa xwe dikin.

## tu / te

Navê cînavê "tu, te" di zimannasiyê de cînavê duyem yê yekhejmar e. "Tu" cînavê duyem yê yekhejmar yê xwerû anku neçemandî / netewandî ye. "Te" jî cînavê duyem yê yekhejmar yê çemandî yanî tewandî ye.

Ew cînav hingê tê bikaranîn gava ku qiseker behsa guhdarê gotinên xwe dike:

- Tu kurd î.
- Tu van tiştan dinivîsî.
- Ehmed te nas dike.
- Te got.

Kesa/ê qiseber bi xwe guhdara/ê yan xwandevana/ê gotinê ye û keseke/î bi tenê ye. Ew dikare mên an jî jin be. Bi piranî "tu, te" mirovek e. Lê hem di hin çîrokên xeyalî de û hem jî di hin axiftinên mirovan yên ji heywanên kedî re de, "tu, te" dikare heywanek jî be. "Tu, te" dikare herwiha dikare herwiha Xwedê yan jî xwedawendekî / îlahekî din jî be ku mirov daxwaz û ricayên xwe jê dike. Bo nimûne:

- Xwedêyo, tu xêr bikî.
- Xwedêwo, ez ji te rica dikim ku gunehên min efû bike.

Carinan bi merema ihtiram û rêzgirtinê ev cînav di nava hevokê de jî (ne tenê li destpêka hevokê) bi T-ya gir tê nivîsîn. Bi taybetî gava ku mebest jê Xwedê ye, wisa tê kirin. Lê gelek caran di nameyan de ji kesên qedirgirtî yan hêjadîtî jî wisa tê bikaranîn. Vê dawiyê bi vê mebestê, gelek caran li cihê cînavê "tu, te", cînavê "hûn, we" tê xebitandin (li jêrtir binêrin).

## em / me

Navê cînavê "em, me" di zimannasiyê de "cînavê yekem yê pirhejmar" e. Bi gotineke din, ew formên pirhejmar yên cînavê "ez, min" in.

"Em" cînavê yekem yê pirhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "me" jî cînavê yekem yê pirhejmar yê neçemandî anku netewandî ye. Cudahiya cinsê rêzimanî di vî cînavî de jî peyda nabe. Anku "em, me" dikarin hemû jin bin, hemû mên bin an jî hinek jê jin û hinek jî mên bin.

Cînavê "em, me" hingê tê gava ku mexseda qiseker yek ji van komên mirovan be:



- qisekerek û guhdarek (em = ez û tu)
- qisekerek û çend guhdar (em = ez û hûn)
- çend qiseker û çend guhdar (em = em û hûn)
- çend qiseker û guhdarek (em = em û tu)
- qiseker û yek an çend kesên din yê wek qisekerê/î lê ne guhdar (em = ez û ew)

Carinan cînavê "em" bi maneya qiseker an nivîser tenê jî tê bikaranîn. Ew carinan bi mebesta mezinahiya xwe qisekerê/qisekerê lê carinan jî bi merema nefsbîçûkiya qisekerê/î tê xebitandin:

- Xwedê di Qur'anê de bi piranî cînavê "Em, Me" bi kar tîne gava ku mebest jê Xwedê bi tenê ye. Gelek caran paşa û şabanû jî heman formê diemilînin. Ev awa bi mebesta mezinahî û ezametê ye.
- Qiseker û nivîser gelek caran cînavên "em, me" dibêjin an dinivîsin tevî ku mebesta wan kesek bi tenê ye jî: "di vê vekolîna me de" (tevî ku nivîser kesek bi tenê be jî). Ev bikaranîn bi qesta nefsbîçûkiyê ye û bi merema rêgirtina li ber xwemezinkirinê yan xwedanpêşiyê ye ji ber ku hingê cînavên "ez, min" nayên bikaranîn.

## **hûn / we**

Cînavê "hûn, we" di zimannasiyê de bi navê "cînavê duyem yê pirhejmar tê nasîn. Bi gotineke din, ew formên pirhejmar yê cînavê "tu, te" ne.

"Hûn" cînavê duyem yê pirhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "we" jî cînavê duyem yê pirhejmar yê neçemandî anku netewandî ye. Cudahiya cînavê "hûn" di vî cînavî de jî peyda nabe. Anku "hûn, we" dikarin hemû jin bin, hemû mêr bin an jî hinek jê jin û hinek jî mêr bin.

Hejmara kesên ku bi cînavên "hûn, we" tên behskirin an gazîkirin, dikarin du yan zêdetir bin. Mîmkin e ku hemû hazir û guhdar bin yan jî wergirên heman peyamê bin. Lê herwiha gengaz e ku tenê yek yan jî tenê hinek ji wan kesan guhdar an wergirên peyamê bin lê mebesta "hûn, we" herwiha kesên din jî yê wek wan bin.

Cînavê "hûn, we" vê dawiyê li ber modela hin zimanên ewropî herwiha bi merema ihtiram û qedirgirtinê hingê jî tê bikaranîn ku guhdar an wergirê peyamê tenê kesek be. Ev awayê bikaranînê di kurdî de bi rêjeyî nû ye, van dehsalên dawiyê belav bûye. Hin kes bawer dikin ku ew ji tirkî ye û loma bikaranîna wê di kurdî de rexne dikin. Lê eger kurdî ew vê dawiyê ji tirkî wergirtibe jî, ew

usûleke navneteweyî – xaseten rojavayî – ye û tirkî jî ew ji fransî yan jî ji zimanekî din yê ewropî wergirtiye. Di fransî, almanî û gelek zimanên din de bêihtiramî ye eger mirov ji kesekî ji xwe mezintir yê ne zêde bernas re cînavê "tu, te" bi kar bîne û herdem divê bi cînavê "hûn, we" bî xîtabkirin. Di inglîzî de ev bûye sebebê wê ku cînavê "thou, thee" (tu, te) bi temamî ji rewacê ketiye û bi mebesta "hûn, we" û "tu, te" jî herdem cînavê "you" tê bikaranîn ku bi eslê xwe tenê maneya "hûn, we" dida. Eger bikaranîna "hûn, we" bi mebesta tenê kesekî di kurdî de nû be jî, êdî cihê xwe digire, li gor modeleke pirzimanî û navneteweyî ye û hewldana rêgirtina li ber wê bikaranînê bêkêr e.

### ew / wê, wî, wan

Cînavê "ew" û formên wî yên çemandî "wê, wî, wan" di zimannasiyê de bi navê "cînavê sêyem" tên nasîn. "Ew" cînavê sêyem yê xwerû anku neçemandî ye, formên "wê, wî, wan" jî cînavên sêyem yên çemandî ne.

"Ew" û formên wî yên çemandî hingê tên bikaranîna gava ku behsa keseke/kesekî ku ji bilî peyamber (kesa/ê ku diaxive yan dinivîse) û peyamerwergir (kesa/ê ku axiftinê dibihîze yan peyamê dixwîne) tê kirin. Kesa/ê qiseber anku kesa/ê behsa wê/wî tê kirin dikare bi xwe jî amade û bihîzer (guhdar) be lê ew di axiftinê de ne mixatebê serekî ye anku yekser ji kesekî din re tê axiftin.

Formên çemandî yên cînavê sêyem li gor hejmara rêzimanî û herwiha cinsê rêzimanî tê ferqkirin.

- "wê" cînavê sêyem yê çemandî yê yekhejmar yê mê ye
- "wî" cînavê sêyem yê çemandî yê yekhejmar yê nêr e
- "wan" cînavê sêyem yê çemandî yê pirhejmar e

Anku di halê çemandî de bo jinekê forma "wê", bo mêrekî şiklê "wî" û bo du yan zêdetir kesan jî (mêr bin an jin an jî komeke tevlihev ya jin û mêran) peyva "wan" tê xebitandin:

- wê jinê
- wî mêrî
- wan mirovan

Ev cudahiya cinsî di cînavên "min, te, me, we" de di kurdî de peyda nabe.

Cudahiyêke din jî ya cînavê sêyem ji cînavên yekem û duyem ew e ku cînavê sêyem (anku "ew" û formên wî yên çemandî) ne tenê bi merema mirovan lê herwiha ya heywan û tiştan jî tê emilandin:

- wî berazî, wî xanî
- wê bizinê, wê malê

Cînavê "ew" û formên wî yên çemandî ne tenê cînavên kesî ne lê di heman demê de cînavên nîşander in jî (*li jêrtir binêrin*).

### 4.3. Cînavên kesî di devokên kurmancî de

Mirov dikare desteya neçemandî ya cînavên kesî yên neçemandî di devokên kurmancî de wiha rêz bike:

standard	ez	tu	ew (yekhejmar)	em	hûn	ew (pirhejmar)
<b>bi nivîskî carinan</b>	wez <sup>9</sup>	tû, ti	ew	-	hun, hon, win	-
<b>bakurî<sup>10</sup></b>	ez	tu, ti	ew	em	hûn	ew, wana, ewana <sup>11</sup>
<b>rojhilatî<sup>12</sup></b>	ez	tu, tû	ew	em	hûn, hwîn, hîn, hingo	ew
<b>navendî<sup>13</sup></b>	ez	tu, ti	ew	em	hun, win	ew
<b>rojavayî<sup>14</sup></b>	ez	tu, ti	ew	em	hûn	wana, ewana

<sup>9</sup> Bi taybetî di stranên gelêrî de.

<sup>10</sup> Li vê derê mebest ji "bakurî" yan "kurmanciya bakurî" devokên Serhedê û derdorên wê ne.

<sup>11</sup> Di rastiyê de cînavên "wana, ewana" formên çemandî ne (heta ducarî çemandî jî) lê di van devokan de li cihê forma "ew" ya neçemandî ya kurmanciya giştî tên bikaranîn.

<sup>12</sup> Mebest ji "rojhilatî" yan "kurmanciya rojhilatî" kurmanciya Dihokê, Hekariyan, Urmîyê û derdorên wan e.

<sup>13</sup> Mexsed ji "navendî" yan "kurmanciya navendî" kurmanciya Mêrdînê, Qamişlo, Şingalê û hin deverên hevşinorên wan e.

<sup>14</sup> Li vê derê qest ji "rojavayî" yan "kurmanciya rojavayî" devokên kurmancî yên Rihayê, Siwêregê, Efrînê û deverên wî alî ne. Herwiha kurmanciya Konyayê û ya Xorasanê jî ser bi vê komê ne.

Desteya cînavên çemandî jî dikarin wiha werin bîn rêzkirin:

standard	min	te	wê (mê), wî (nêr)	me	we	wan
<b>bi nivîskî carinan</b>	mi <sup>15</sup>	-	ewê, ewî	-	-	ewan, wana
<b>bakurî</b>	mi, min	te	ew	me	we	wan, wana, ewan, ewana
<b>rojilatî</b>	min, mi	te	ew	me	hewe, we, hingo	wan, ewan, wa
<b>navendî</b>	min, mi	te	wê, wêya, wêna, wî, wîya, wîna <sup>16</sup>	me	we	wan, wana, ewan, wa
<b>rojawayî</b>	mi, min	te	wê, wî	me	we	wana, ewana

#### 4.4. Cînavên kesî di zarên kurdî de

Di zaravayên kurdî de du pergal û sîstemên cuda yên cînavan hene. Kurmancî û zazakî du desteyên cînavên serbixwe bi kar tînin ku yek jê xwerû yan neçemandî ye û li cihê navdêrên neçemandî digire û desteya din jî çemandî anku tewandî ye û li şûna navdêrên çemandî tê xebitandin. Di soranî, başûrî û hewramî de jî du desteyên cînavan hene: yek serbixwe tê bikaranîn. Desteya bi pey hin birrên din yên peyvan (navdêr, daçek, rengdêr) ve tên girêdan.

<sup>15</sup> Bi taybetî di stranan de yan jî di neqilkirina axiftinê de.

<sup>16</sup> "Wêya, wêna" û "wîna, wîya" di rastiyê de kurtkirinên "wê ya han" û "wî yê han" in lê di kurmançiya navendî de gelek caran hingê jî tên bikaranîn ku devokên din qîma xwe bi "wê, wî" tenê jî tînin. Bo nimûne: "wîna ji mi ra bîne" ("wî ji min re bîne" yan "wî yê han ji min re bîne").

Mirov dikare cînavên zaravayên kurdî wiha rêz bike (tenê formên serdest ji her zaravayî hatine bijartin). Di nimûneyan de formên neçemandî yên kurmancî û zazakî û herwiha formên serbixwe yên soranî, başûrî hewramî berî nîşana | hatine nivîsîn û formên çemandî yên kurmancî û zazakî û formên pêvekirî (girêdayî, zeliqandî) yên soranî, başûrî û hewramî li pey | hatine danîn:

kurmancî	zazakî <sup>17</sup>	soranî	başûrî <sup>18</sup>	hewramî
ez   mi(n)	ez   mi(n)	min   -(i)m	mi(n)   -(i)m	min   -(i)m
tu   te	ti   to	to   -(i)t	tu   -(i)d	to   -(i)t
ew   wê / wî	a / o   aye / ey <sup>19</sup>	ew(e)   -î / -y <sup>20</sup>	ew(e)   -î / -ê <sup>21</sup>	êd / êde <sup>22</sup>   -(i)ş
em   me	ma   ma	ême   -man	îme   -(i)man	ême   -mã <sup>23</sup>
hûn   we	şima   şima	êwe   -tan	îwe   -(i)dan	şima   -tã
ew   wan	ê   înan	ewan   -yan	ewane   -(i)yan	êdê   -şã

Wek ku tê dîtîn, piraniya cînavan di lehceyên me de dişibin hev lê herwiha cudahî jî di navbera wan de hene. Me li jor diyar kir ku di kurmancî û zazakî de herdu desteyên cînavan ji peyvên din cuda tên nivîsîn lê di lehceyên din de desteyek serbixwe û desteya din jî bi birrên din yên peyvan ve tê nivîsîn. Ew girîngtirîn cudahiya cînavan di navbera zaravayên kurdî de ye. Lê çendîn cudahiyên din jî yên girîng hene ku em ê li vê derê rêz bikin:

- 1) Ji aliyê bikaranîne ve cînavên xwerû / neçemandî yên kurmancî û zazakî hevwateriyên cînavên serbixwe yên lehceyên din in lê ji aliyê etîmolojî ve gelek ji cînavên serbixwe yên soranî, başûrî û hewramî hevrehên (lê ne hevwateriyên) cînavên çemandî yên kurmancî û zazakî ne. Bo nimûne: cînavên kurmancî yên çemandî "min, me, we, (e)wan" bi zelalî hevrehên cînavên

<sup>17</sup> Bo cînavên zazakî, binêrin bo nimûne: Roşan Lezgîn *Gramera Kirdkî (Zazakî)* rûpel 68 – 73. Kitêb bi kurmancî ye.

<sup>18</sup> Mebest ji "başûrî" yan "kurdiya başûrî" li vê derê lehceyên feylî, kelhurî, kirmaşanî û deverên nêzîkî wan in ku dikevin navbera deverên soranîxiv û lekîaxiv. Bo cînavan di lehceyên başûrî de, binêrin bo nimûne: Ismail Fattah: *Les dialectes kurdes méridionaux* (Devokên kurdiya başûrî) rûpel 275 – 294. Pirtûk bi zimanê fransî ye.

<sup>19</sup> "a, aye" formên mê ne, "o, ey" nêr in.

<sup>20</sup> "-y" li pey vokalan, wek din "î".

<sup>21</sup> Li gor devokan dikare "-ê" yan jî "-î" be.

<sup>22</sup> "êd" nêr e, "êde" mê ye. Formên wan yên çemandî "êdî" (nêr) û "êde" (mê) ne.

<sup>23</sup> "-ã" anku A-ya bêvilî / pozî (nasal) ku dişibe A+N, bidin ber soranî "-man, -tan, -yan".



serbixwe yên soranî "min, ême, êwe, ewan" in. Ev cînavên soranî di bikaranînê de destebirayên cînavên kurmancî yên xwerû "ez, em, hûn, ew (pirhejmar)" in lê bi şikil û rehên xwe zêdetir nêzîkî "min, me, we, wan" yên hevwateryên "-m, -man, -tan, -yan" yên soranî ne. Lê cînavên kurmancî yên xwerû "tu, ew (yekhejmar)" hem hevreh û hem jî hevwateryên "to, ew" yên soranî ne.

- 2) Ji aliyê diyar(ne)kirina cînavên rîzimanî ve jî cînavên lehceyên kurdî ji hev cuda ne. Di soranî û başûrî de cînavên rîzimanî peyda nabe loma cînavên wan jî bêcîns in. Kurmancî tenê di doxê / halê çemandî de cînavên rîzimanî diyar dike loma cînavê sêyem yê yekhejmar formeke mê ("wê") û formeke nêr ("wî") hene. Lê cînavên din (ez/min, tu/te, em/me, hûn/we, ew/wan) hemû bêcîns in. Di zazakî de cîns hem di doxê xwerû û hem jî di yê çemandî de diyar dibe loma cînavê sêyem yê yekhejmar hem di rewşa xwerû de û hem jî di halê çemandî de xwedî formên cuda yên mê û nêr e. Wek din, di zazakî de jî cînav bêcîns yan ducîns in.<sup>24</sup> Hewramî jî di meseleya cînavan de wek zazakî ye.
- 3) Cînavê "ez" tenê di kurmancî û zazakî de hatiye parastin. Ew herwiha ji farisî jî wînda bûye lê di gelek zimanên îranî yên kevn û navîn de diyar e û hevrehên wî di piraniya zimanên hindûewropî de peyda dibin (li jêrtir binêrin).
- 4) Cînavê "hûn" yê kurmancî û "şîma" yê zazakî û hewramî – tevî dûrketina zêde ya ji hev, dîsa jî bi eslê xwe hevreh in. Herdu jî ji îraniya kevn "yûşma-" ne.<sup>25</sup> Di hewramî, zazakî, farisî û çend ziman û zarên din yên îranî de beşa dawiyê "şma-" hatiye parastin lê kurmancî Ş avêtiye, Y ya destpêkê kiriye H û M bi N veguhastiye.

#### 4.5. Hevrehên cînavên kesî yên kurdî di zimanên hindûewropî de

Cînavên kurdî – wek cînavên piraniya zimanan – beşek ji peyvên herî kevn ên zimanî ne. Loma hevrehên wan ne tenê di lehceyên kurdî de, lê di zimanên din yên îranî, hindo-îranî û heta hemû malbata zimanî ya hindûewropî de peyda dibin.

<sup>24</sup> Roşan Lezgîn di berhema xwe ya behskirî de idia dike ku "ez" di zazakî de herdem mê ye lê bi dîtina min wî ev mesele şaş fehm kiriye ji ber ku paşgira kesî ya lêkeran ya li gel kesê yekem yê yekhejmar (ez = ez) û kesa sêyem ya yekhejmar ya mê (a = ew mê) di zazakî de eynî ye. Lê cînav bi xwe ne nêr an mê ye, tenê paşgira wî ya lêkerî wek ya mê "-a" ye. Tarîxiyên "-an" bû lê paşî N bi A ve heliyaye.

<sup>25</sup> Bidin ber avestayî "yûşmat" û çend formên din: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

Li vê derê em ê hewl bidin diyar bikin ka hevrehên cînavên kurdî di hin zimanên din yê ji aliyê malbatî ve nêzîk (zimanên din yê îranî) û yê dûrtir jî (bo nimûne zimanên romî, germenî û slavî) de çawa peyda dibin. Cînavên ku em bidin, ji aliyê dîrokî ve li gel peyva kurdî ji eynî rehê makezimanê

www.arxiv.org

proto-hindûewropî peyda bûne. Lê divê em diyar bikin ku sîstema bikaranîna cînavan di her zimanî de ne mîna hev e û loma ew ne herdem bi temamî hevwaterên hev in.<sup>26</sup>

Di rêzkirina xwe de em ê ji zimanên ji hêla malbatî ve nêzîktir dest pê bikin û ber bi zimanên dûrtir ve biçin. malik dê vala bin. Ew tê wê maneyê ku hevrehê cînavê kurmançî di wî zimanî de peyda nabe. Ew nayê wê wateyê ku cînavêkî din di wî zimanî de bi maneya cînavê kurmançî peyda nabe lê tenê tê wê wateyê ku ew cînav û yê kurmançî tarîxiyên ne ji eynî rehî peyda bûne. Di nav zimanên kevn de, sebebê valahiya malikê herwiha dikare ew be ku ev cînav di nav nivîsên mayî de peyda nebe û em ji ber hindê nizanin ka hevrehê cînavê kurmançî di wî zimanî de hebû û – eger hebûbe – çi bû.

Ji lehceyên kurdî em ê di tabloyên li jêr de tenê kurmançî bidin ji ber ku me li jortir cînav di lehceyên kurdî de pêşkêş kirine. Ji ber ku "ew" yê yekhejmar û pirhejmar di kurmançî de eynî û ji eynî rehî ne, em ê wî tenê carekê pêşkêş bikin.

kurmançî	ez <sup>27</sup>	min	tu, te <sup>28</sup>	ew, wê, wî, wan	em, we	hûn, we
farisî	-	men	tû	û	ma	şoma
tacikî <sup>29</sup>	-	men	tû	û	mo	şûmo
pehlewî <sup>30</sup>	en, ez	men	to	oy	emah	eşmah
hexamenişi <sup>31</sup>	edem	men-	tuvem	hewv-	emaxem	
avestayî <sup>32</sup>	ezim	men-	tûm		ehme-	yûşma-

<sup>26</sup> Bo nimûne, di kurmançî de di dema niha de em dibêjin "ez dikim" û di dema borî ya sade de "min kir" anku cînav ne eynî ye tevî ku biker (kesa/ê ku tiştêkî dike yan kiriye) heman kes e. Bo nimûne, di inglîzî de di van gotinan de herdu çaran jî cînavê "I" tê bikaranîn: "I do" (ez dikim) û "I did" (min) kir. Tarîxiyên "I" (bixwînin: "ay") hevrehê "ez" ya kurdî ye anku ji eynî rehî peyda bûye. Lê ji aliyê watenasî ve carinan ew hevwateriya "min" ya kurdî ye.

<sup>27</sup> Bo gelek hevrehan binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/%C3%A9%C7%B5h%E2%82%82>

<sup>28</sup> Bo hin hevrehan binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/tûh2>

<sup>29</sup> Bo nimûne: [http://polymath.org/tajik\\_pronouns.php](http://polymath.org/tajik_pronouns.php)

<sup>30</sup> Bo nimûne: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

<sup>31</sup> Cînavên hexamenişi anku farisiya kevn dikarin li vê derê bîn dîtin:

<http://www.utexas.edu/cola/centers/lrc/eieol/aveol-8-X.html>

<sup>32</sup> Binêrin bo nimûne: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

<b>sanskritî</b> <sup>33</sup>	ehem	me, mem	tvem		esman	yûyam, yûşman
<b>ermenî</b>	es		du		menk	-
<b>yûnanî</b>	êgo	mê, êmê	sû		êmêis	-
<b>latînî</b>	ego	me	tû		-	vos
<b>rûsî</b>	ya <sup>34</sup>	mnê, mênya	ti		mi	vi
<b>inglîziya kevn</b>	ic [îk]	me	þu [thu]		-	ēow, īow
<b>inglîziya nû</b>	I [ay]	me, mine, my	thou, thy, the, thine <sup>35</sup>	-	-	you
<b>almanî</b>	ich [îh]	mein, mich, mir	du, dich, dir	-	-	euch
<b>fransî</b>	je	me, mon, moi	tu, te, ton	-	-	vous
<b>spanî</b>	yo	me, mí	tú	-	-	vosotros

Wek ku tê dîtin, hevrehên hemû cînavên kesî yê kurmancî di hin yan hemû zimanên hindûewropî de peyda dibin. Herî zêde hevrehên cînavên "min" û "tu/te" berbelav û berçav in. Di rewşa hin cînavên din de, hevreh wisa bi şiklê xwe ji hev dûr ketine ku êdî tenê bi vekolînên dûr û dirêj yê dengnasî û berhevdana zimanên niha û yê kevn mirov dikare bigihe wê qenaetê ku ev cînav bi rastî carekê ji eynî rehî peyda bûne. Bo nimûne, rewşa cînavên kurmancî "hûn, we" û hevwater û hevrehên wê ya farisî "şoma" wisa ye.

<sup>33</sup> [https://en.wikipedia.org/wiki/Sanskrit\\_pronouns\\_and\\_determiners](https://en.wikipedia.org/wiki/Sanskrit_pronouns_and_determiners)

<sup>34</sup> Bi bulgarî "az".

<sup>35</sup> Êdî kevn bûye û li cihê wê jî "you" (hûn) tê bikaranîn.

Sebebê hebûna hevrehên cînavên kurdî di piraniya zimanên din jî yê hindûewropî de ew e ku cînav komek ji komên herî kevnar yê peyvên her zimanî ne. Cînav di her zimanî de peyvên bingehîn in, pir tên bikaranîn û zû-zû ji bîr nabin û bi bi hêsanî bi peyvên biyanî nayên veguhastin.<sup>36</sup>

#### 4.6. Hevrehî li gel cînavên zimanên ne-hindûewropî?

Hin cînavên kurdî ne tenê dişibin zimanên xizm û lêzim, wek farisî lê heta şiklê wan wek hin cînavên erebî, azerî û tirkî jî dixuye tevî ku li gor zimannasiya dîrokî, ev ziman ne xizm û lêzim in, ne ji eynî binemala zimanan peyda bûne.

Wek nimûne, mirov dikare cînavê kurdî "min" (bi farisî "men") bide ku pir dişibe "men" (ez) ya azerî û hevrehê wî ya tirkî "ben" (dîsa bi maneya "ez").

Ne tenê "min" lê herwiha "ew" (bi zazakî "o", farisî "û") jî dîsa dişibe hevwatera xwe "o" ya tirkî û azerî. Ew herwiha heta piçekê dişibe hevrehê xwe ya erebî "huwe" jî.

Cînavê "te" yê kurmancî jî dişibe dawiya cînavê "ente" yê erebî ku maneya "tu, te" dide.

Gelo mesele çî ye? Kurdî ev cînav ji van zimanan wergirtine yan wan ew ji kurdî yan jî ji zimanekî din yê îranî yan hindûewropî birine?

Wek ku me li jortir diyar kiriye, hevrehên cînavên kurdî di piraniya zimanên din yê hindûewropî de jî hene. Anku cînavên kurdî ne ji zimanên cîran hatine wergirtin. Me herwiha diyar kir ku cînav adeten ji zimanên din nayên deynkirin jî.

Anku gelo azerî, erebî yan tirkî ev cînav ji zimanê me wergirtine?

Na, bersiva vê jî neyînî ye. Anku wan zimanan jî ev cînav ji zimanên din nebirene lê peyvên wan yê xwemalî ne. Hevrehên wan di zimanên lêzimî wan de jî peyda dibin. Li gor baweriya serdest ya zimannasî, hebûna hin wekhevîyên wiha tenê tesadîfî ye ji ber ku hemû ziman tenê hejmareke bisinor ya dangan bi kar tînin û loma hem mimkin e û hem jî zerûrî ye ku carinan hin peyvên wan yê hevwaterê jî bi şiklê xwe dişibin hev tevî ku mirov dikare bi esehî isbat bike ku wan herdu zimanan ew peyv ji hev wernegirtine.

<sup>36</sup> Lê kêman tenê veguhastin. Bo nimûne, cînavê "her" ji zimanên îranî ketiye tirkî û hin zimanên din yê altayî.



## 5. BIKARANÎNA DESTHEYÊN CUDA YÊN CÎNAVÊN KESÎ

### 5.1. Bikaranîna destên çemandî û neçemandî

Li jortir me diyar kiriye ku di kurmançî de du destheyên cînavan hene: çemandî anku tewandî û neçemandî yanî netewandî. Gelo bikaranîna van herdu desteyan çawa ye? Kengî yê çemandî û kengî jî yê neçemandî tên bikaranîn?

Bersiva hêsan wiha ye: cînavên neçemandî li cihê navdêrên neçemandî û cînavên çemandî jî li şûna navdêrên çemandî tên emilandin.<sup>37</sup>

Mirov dikare bergeha bikaranîna wan wiha diyar bike:

**Bikaranîna cînavên xwerû anku neçemandî (ez, tu, ew, em, hûn):**

- Di demên bîn, niha û borî de bikerên (kirde, fail, subjekt) lêkerên negerguhêz (intransîtîv) in anku lêkerên ku nikarin ti berkarên (bireserên, mef'ûl, objekt) yekser wergirin. Bo nimûne: *ez ê biçim, ez diçim, ez çûm. Tu dê bikevî, tu dikevî, tu ketî. Ew ê bîn/werin, ew tîn, ew hatin.*
- Di demên bîn û niha de (lê ne di demên borî de) bikerên lêkerên gerguhêz (transîtîv) in anku lêkerên ku dikarin yek an çend berkarên yekser wergirin. Bo nimûne: *em ê sêvan bixin, em sêvan dixwin (lê me sêv xwarin – ne "\*em sêvan xwarin").*
- Di demên borî de (lê ne di demên bîn an niha de) wek berkara yekser: *Hevalan ew dît (lê heval wê/wî dibînin yan heval dê wê/wî bibînin – ne "\*heval ew dibînin" yan "\*heval dê ew bibînin").*

**Bikaranîna cînavên çemandî anku tewandî (min, te, wê/wî/wan, me, we):**

- Herdem wek berkarên neyekser li gel daçekan yan jî heta bê daçek jî: *ji min, li te, bi wê re, li gel wan, bo me, wek we, ji ber wî, [keçikê av da] me<sup>38</sup>...*
- Di demên bîn û niha de wek yekser. Bo nimûne: *wê dibînim, min dibin, wan neêşînin, dê we bixapînin...*

<sup>37</sup> Em ê paşî diyar bikin ku herdem ne illeh wisa ye lê wek qeydeke giştî, ev gotin rast e.

<sup>38</sup> Di nimûneya "[keçikê av da] me" de cînav çemandî ye tevî ku daçek tê de nîne. Ew dikare were daçekkirin, bo nimûne bi awayê "keçikê av bi me da" yan "keçikê av ji me re da".

- Di demên borî de wek bikerên lêkerên gerguhêz. Bo nimûne: *me sêv xwarin, wan kar nekir, te çi dît?*

## 5.2. Wekhevî û cudahiyên bikaranîna desteyên cînav û navdêran

Desteyên çemandî û neçemandî yên cînavên kurmançî jî bi awayekî giştî wek herdu desteyên çemandî û neçemandî yên navdêrên kurmançî ne. Lê hin cudahiyên wan jî ji hev hene ku em ê li jêr rêz bikin.

Di halê xwerû de ji navdêrên kurmançî diyar nabe ka ew yekhejmar an pirhejmar in yan jî ka mê yan jî nêr in. Bo nimûne, peyva "heval" dikare maneya 1) hevalekî tenê bide, 2) çend hevalan bide, 3) hevaleke keç/jin bide yan jî 4) hevalekî kur/mêr bide:

- Heval çû.
- Heval çûn.
- Heval Fatma.
- Heval Hesên.

Diyarbûna hejmar û cinsê peyva "heval" ji beşên din yên tekstê diyar dibe: çû / çûn, Fatma / Hesên.

Di doxê çemandî yan ravekirî de cins û hejmara rêzimanî (yekhejmar yan pirhejmar) berçav dibe:

- Hevalê got / Hevalî got.
- Hevalan got.
- Hevala Fatma.
- Hevalê Hesên.

Kurdî<sup>39</sup> cinsê rêzimanî tenê di yekhejmariyê de diyar dike. Di rewşa pirhejmar de, cinsê nêr û mê nayê ferqkirin:

- Hevalan got. (Hevalên ku got, dikarin mê bin, nêr bin yan jî hinek ji wan mê û hinek jî jin bin).

<sup>39</sup> Ne tenê di kurmançî de lê herwiha di lehceyên din jî yên kurdî de – eger cinsê rêzimanî qet hebe – cins tenê di rewşa yekhejmariyê de tê ferqkirin. Di pirhejmariyê de cudahî di navbera nêr û mêyan de di kurdî de nayê kirin. Lê di hin zimanên din de (bo nimûne almanî, fransî, spanî, peştûyî) de cudakirin di herdu hejmarên rêzimanî de (mê, nêr) peyda dibe.

Cînavên "ew" yê kurmancî jî wek navdêrên kurmancî dixebite. Cins û hejmara wî ya rêzimanî di halê xwerû de ne diyar e. Wek peyva "heval", cînavê "ew" jî dikare 1) yek be, 2) çend kes bin, 3) jin be yan 4) mêr be:

- Ew çû.
- Ew çûn.
- Ew Fatma.
- Ew Hesên.

Di halê çemandî de sê şiklên wî hene: 1) yekhejmar û mê, 2) yekhejmar û nêr, 3) pirhejmar (nêr yan mê yan herdu jî):

- wê got. (yekhejmar mê)
- wî got. (yekhejmar nêr)
- wan got. (pirhejmar – nêr an mê yan jî herdu di nav hev de)

Cînavên "ez, tu, em, hûn" jî wek navdêran di halê neçemandî de mê yan nêr ji hev cuda nakin. Loma çawa ku peyva "heval" dikare bi mebesta jinekê yan mêrekî were bikaranîn, wisa peyvên "ez, tu, em, hûn" jî dikarin bi mebesta herdu cinsan werin emilandin. Bo nimûne:

- Ez Ehmed im. Ez Fatma me.
- Tu Ehmed î. Tu Fatma yî.
- Em kurr in. Em keç in.
- Hûn kurr in. Hûn keç in.

Lê bi alîkariya raveka mê yan nêr mirov dikare hemû cînavan jî li gor cinsê mexsedkirî diyar bike:

- ez a reben (ez = mê)
- ez ê reben (ez = nêr)

Berevajî navdêran – ku di halê çemandî yê yekhejmar de cinsê rêzimanî diyar dikin – cînavên "min, te, me, we" anku halê halê çemandî yê cînavên "ez, tu, em, hûn" jî cinsê rêzimanî diyar nake:

- min got. (kesa gotî diyar dikare jin an jî mêr be. Bidin ber "Ehmedî got. Fatmayê got.)
- te got.
- me got.
- we got.

Di meseleya hejmara rêzimanî (yekhejmar, pirhejmar) de cînavên "ez, tu, em, hûn" ne wek navdêrên kurmancî ne. Wek ku li jor hat gotin, navdêr di halê xwerû de yekhejmar û pirhejmariyê ji hev ferq nakin. Lê cînav wisa dikin. Pirhejmara cînavê "ez" cînavê "em" e. Pirhejmariya cînavê "tu" jî cînavê "hûn" e. Di vê meseleyê de ew hem ji navdêran û hem jî ji cînavê "ew" cuda ne. Bo nimûne:

Yekhejmar	Pirhejmar
Heval çû.	Heval çûn.
Ew çû.	Ew çûn.
Ez çûm.	Em çûn.
Tu çûyî.	Hûn çûn.

Wek ku tê dîtin, di neqilbûna ji yekhejmariyê ber bi pirhejmariyê ve de peyvên "heval, ew" wek xwe dimînin lê cînavê "ez" dibe "em" û cînavê "tu" jî dibe "hûn".

Di hin devokên kurmancî de navdêrên nêr di rewşa çemandî de bi forma xwe ya yekhejmar û diyar nayên çemandin:

- Osman got. (li cihê "Osmanî got" yan "Osmên got" ya hin devokên din yên kurmancî)
- li welat. (li şûna "li welatî" yan "li welêt")

Lê dîsa di van devokan de jî cînav di vî halî de jî diçeme:

- Osman got → Wî got. (ne "\*ew got")
- li welat → li wî. (ne "\*li ew")

Herwiha di kurmancî de gelek navdêrên mê jî yên vokal bi xwe li dawiyê heyî, êdî nayên çemandin:

- li Zaxo, li Qamişlo (li cihê "li Zaxo-yê, li Qamişlo-yê" – bidin ber "li Diyarbekir-ê, li Dihok-ê")
- li Almanyaya, li Fransa (li şûna "li Almanyaya-yê / Fransa-yê" – bidin ber "li Kurdistan-ê, li Îran-ê")
- li ser rê (li cihê "li ser rê-yê" – bidin ber "li ser av-ê")

Lê di vî halî de jî, eger cînavê "ew" cihê van peyvan, divê dîsa jî "ew" biçeme anku forma "wê" were bikaranîn:

- li wê (li Zaxo/Qamişlo/Almanya)
- li ser wê (li ser avê)

## 6. CÎNAVÊN KESÎ YÊN PÊVEKIRÎ

### 6.1. Cînavên pêvekirî

Mebest ji cînavên pêvekirî (yan girêdayî) ew cînav in yan pirtikên cînavan in ku bi birrên din yê peyvan ve tên girêdan û cihê cînavên xweser û xwerû digirin. Lê mebest li vê derê ne paşpirtikên kesî yê lêkeran in, wek bo nimûne di kurdî de "dik-im" ku "-im" diyar dike ku kesê dike "ez" im.

Cînavên pêvekirî bi taybetî li gel navdêran li kar in. Bo nimûne, di van herdu zimanan mirov dikare xwedîtiyê bi cînavên pêvekirî diyar bike. Beşa qelewkirî ya van peyvên nimûne maneya "-a te" (kitaba **te**) dide:

- erebî: kitab**ek**
- tirkî: kitab**ın**

Heman awayê cînavên pêvekirî yê cînavên din jî di van zimanan de hene. Bo nimûne, bi tirkî:

- kitab**ım** (kitêba **min**)
- (onun) kitab**ı** (kitêba **wê/wî**)
- kitab**ımız** (kitêba **me**)
- kitab**ınız** (kitêba **we**)
- (onların) kitab**ı** (kitêba **wan**)

Berevajî van zimanan, di kurmançî de bi zerûrî cînav xweser û ji peyva serekî cuda tên nivîsîn. Di zazakî de jî rewş wek kurmançî ye. Bi heman awayî di inglîzî de jî cînavên pêvekirî nînin.

Lê di rastiyê de cînavên pêvekirî ne tenê xusûsiyeteke tirkî û erebî ye. Di zimanên îranî de jî bikaranîna wan berbelav e. Bo nimûne, bi farisî

- kitab**em** (kitêba **min**)
- kitab**et** (kitêba **te**)
- kitab**ış** (kitêba **wê/wî**)
- kitab**iman** (kitêba **me**)
- kitab**itan** (kitêba **we**)
- kitab**ışan** (kitêba **wan**)

Bi heman awayî, mirov dikare nimûneyan ji hin zimanên din jî yên îranî bide.<sup>40</sup>

Kurdî bi xwe jî ne bi temamî ji van cînavên pêvekirî bêpar e. Di kurdiya navendî (soranî) û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de ev cînav bi berfirehî tên bikaranîn. Bo nimûne, bi soranî:

- ser**im** (serê min)
- ser**it** (serê te)
- ser**î** (serê wê/wî)
- ser**man** (serên man)
- ser**tan** (serên we)
- ser**yan** (serên wan)

Heman nimûne bi kurdiya başûrî jî:

- ser**im** (serê min)
- ser**id**<sup>41</sup> (serê te)
- ser**î** (serê wê/wî<sup>42</sup>)
- ser**man** (serên man)
- ser**dan**<sup>43</sup> (serên we)
- ser**yan** (serên wan)

Sîstema cînavan di kurmancî û zazakî de ji vê pergale cuda ye. Di kurmancî û zazakî de du desteyên cînavên kesî yên serbixwe hene ku yek jê “xwerû” yan neçemandî (netewandî) ye û yek jî “oblîk” anku çemandî (tewandî) ye (*li jor binêrin*).

Di soranî, kurdiya başûrî, farisî û zimanên din jî yên îranî de cînavên serbixwe hene. Lê di van ziman û zaravayan de ne du lê yek desteyê cînavên xweser li kar e. Ew beramberî cînavên xwerû / neçemandî yên kurmancî û zazakî ne.

Cînavên serbixwe di soranî û farisî de:

<sup>40</sup> Bo cînavên pêvekirî di zimanên îranî yên rojavayî de, binêrin bo nimûne: Agnes Korn *Western Iranian Pronominal Clitics*: [https://www.academia.edu/849659/Western\\_Iranian\\_Pronominal\\_Clitics](https://www.academia.edu/849659/Western_Iranian_Pronominal_Clitics)

<sup>41</sup> Di çend devokên kurdiya başûrî de jî li cihê “-id” forma “-it” (serit) heye.

<sup>42</sup> Di soranî de cînavên rêzimanî peyda nabe loma “serê wê” û “serê wî” herdu jî “serî” ne.

<sup>43</sup> Di hin devokan de wek soranî “-tan” e: “sertan”.

Cînavên serbixwe di farisî û soranî de		
cînav	soranî	farisî
1. yekhejmar	min	men
2. yekhejmar	to	tû
3. yekhejmar	ew	û
1. pirhejmar	ême	ma
2. pirhejmar	êwe	şoma
3. pirhejmar	ewan	anan, anha, îşan

Li cihê cînavên çemandî yên kurmançî û zazakî, di ziman û zaravayên din yên îranî de cînavên pêvekirî li kar in.

Bo nimûne, bikaranîn cînavên neçemandî yên kurmançî li gel cînavên serbixwe di soranî de:

kurmançî	soranî
ez kurd im	min kurd im
tu nivîskar î	to nûser î(t)
ew kar dike	ew kar deka
em hatin	ême hatîn
hûn nebûn	êwe nebûn
ew çi dikin?	ewan çi deken?

Lê gava ku di kurmançî de cînavên çemandî tên bikaranîn, di soranî de li cihê wan cînavên pêvekirî tên xebitandin:

kurmançî	soranî
min got	wut-im
destê te	dest-it



babê wê/wî	bawk-î
dayika me	dayik-man
mala we	mal-tan, mal-eke-tan
çavên wan	çaw-yan

Di soranî de, cînavên pêvekirî ne herdem li dawiya peyvê ne lê gelek dikevin berî rehê lêkerê lê piştî pêşpirtikên din:

kurmancî	soranî
<b>te</b> dibînim	de- <b>t</b> -bînim
<b>min</b> bibîne	<b>bim</b> bîne
<b>wê/wî</b> bide	bi- <b>y</b> -de / b- <b>î</b> -de
<b>me</b> bibin	bi- <b>man</b> -ben
<b>we</b> dibim	de- <b>tan</b> -bem
<b>wan</b> nekujin	ne- <b>yan</b> -kujin

Ji aliyê rêzimanê ve, hebûna cînavên pêvekirî di soranî de û peydanebûna wan di kurmancî de belkî mezintirîn û diwartirîn cudahiya navbera van herdu lehceyên serekî yên kurdî ye ku têgihîştina ji hev zehmet dike.

Lê gelo bi rastî cînavên pêvekirî di kurmancî de peyda nabin?

## 6.2. Cînavên pêvekirî di kurmancî de

Ji lêkolînên D. N. MacKenzie ve<sup>44</sup> di nav zimannasên biyanî de tê dubarekirin<sup>45</sup> ku di kurmancî de cînavên pêvekirî peyda nabin. Heman idia heta vê dawiyê jî serdest e. Bo nimûne, Korn idiaya

<sup>44</sup> D.N. MacKenzie 1961a *Kurdish Dialect Studies I*. London: Oxford University Press.

<sup>45</sup> Bo nimûne: Michiel Leezenberg *Gorani Influence on Central Kurdish*: [home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf](http://home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf)

Windfuhr dubare dike û dibêje “di nav zimanên îranî yên rojavayî de, ti ji cînavên wisa [yên pêvekirî] di sengiserî, zazakî û kurdiya bakurî (=kurmancî) de peyda nabin.”<sup>46</sup>

Rast e ku bergeha cînavên pêvekirî di kurmancî û zazakî de ne wek farisî yan soranî berfireh e. Bo nimûne, di kurmancî yan zazakî de ti cînavên pêvekirî li cihê “-it” ya soranî yan “-et” ya farisî ya bi maneya “te” ya kurmancî peyda nabin. Herwiha li cihê “-man” (me) ya farisî û soranî di kurmancî yan zazakî de ti cînavên pêvekirî nînin. Wek ku li jor hatiye diyarkirin, kurmancî û zazakî li şûna cînavên pêvekirî yên farisî yan soranî, cînavên serbixwe yên çemandî bi kar tînin.

Lê dîsa jî kurmancî ne bi temamî ji cînavên pêvekirî bêpar e.

Rast e ku di kurmancî de ti formên pêvekirî ji cînavê duyem yê yekhejmar (tu, te) yan pirhejmar (hûn, we) re nînin. Herdem ev cînav bi zerûrî serbixwe li kar in.

Herwiha di kurmancî de ti cînavên pêvekirî bo cînavê yekem yê pirhejmar (em, me) jî peyda nabin. Ew jî bi zerûrî bi rêya cînavên serbixwe tînin ifadekirin.

Lê cînavê sêyem yê yekhejmar (ew, wê/wî) û pirhejmar jî (ew, wan) di kurmancî de, ji bilî du desteyên serbixwe (çemandî û neçemandî) herwiha bi formên xwe yên pêvekirî jî li kar in. Ev cînavên pêvekirî dikarin li gel daçekan, lêkeran û navdêran bînin bikaranîn:

### 6.3. Cînav bi daçekan ve

- **jê** (ji wê/wî/wan)
  - jê ve (ji wê/wî/wan)
  - jê re (ji wê/wî/wan re)
  - jê de (ji wê/wî/wan de)
- **lê** (li wê/wî/wan)
- **pê** (bi wê/wî/wan)
  - pê re (bi wê/wî/wan re)
  - pê ve (ji wê/wî/wan ve)
  - pê de (bi wê/wî/wan de)

<sup>46</sup> “Among the WIr. languages, no such clitics are found in Sangesari, Zazaki, and Northern Kurdish (WINDFUHR 1975: 462). Agnes Korn *Western Iranian Pronominal Clitics*: [https://www.academia.edu/849659/Western\\_Iranian\\_Pronominal\\_Clitics](https://www.academia.edu/849659/Western_Iranian_Pronominal_Clitics)

- **tê** (di wê/wî/wan)
  - o tê de (di wê/wî/wan de)
  - o tê re (di wê/wî/wan re)
  - o tê ve (di wê/wî/wan ve)

Wek ku tê dîtîn, cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) dikare bi daçekan ve girêdayî be. Lê cînavên yekem û duyem (yekhejmar yan pirhejmar) di kurmancî de nikarin bi daçekan ve bête girêdan. Anku cînavên pêvekirî di kurmancî de hene lê bo nimûne ji soranî yan farisî bisinortir in.

Bide ber soranî:

- pêm (bi min)
- pêt (bi te)
- pêy (bi wê/wî)
- pêman (bi me)
- pêtan (bi we)
- pêyan (bi wan)

Herwiha cînavê pêvekirî di kurmancî de tenê dikare bi van çar daçekên bingehîn yê li jor rêzkerî ve bê girêdan, ew nikare daçekên din yê kurdî bigire. Bo nimûne, ew nikare daçeka “bo, ji bo” ya kurmancî bigire. Lê di soranî de dikare wê jî bigire:

- bom (bo min), bot (bo te), boy<sup>47</sup> (bo wê/wî), boman (bo me), botan (bo we), boyan (bo wan)

#### 6.4. Cînav bi lêkeran ve

Di kurmancî de herwiha mimkin e ku cînav bi lêkerê ve bê girêdan. Dîsa tenê cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) dikare were girêdan:

- hatê (hat wê/wî/wan)
- çûmê (çûm wê/wî/wan)

Wek ku tê dîtîn, girêdana cînavê sêyem jî tenê bi lêkerên wisa ve mimkin e ku liv û hereketa ber bi cihekî yan tiştêkî ve diyar dikin.

<sup>47</sup> Di kurmancî de jî forma “boy, boyî, ji boy(î)” di hin devokan de heye lê ew tenê varyanteke hevwatera ya “bo” ye, cînav bi wê ve nehatiye girêdan. Lê “boy” ya soranî ji “bo-y” pêk tê ku maneya “bo wî/wê” dide.

## 6.5. Cînav bi navdêran ve

Di kurmancî de girêdana cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) herwiha bi komeke navdêrên bisinor ve jî mimkin e:

- kevir bi serî ket (bi serê wê/wî/wan)
- derbe li piştê da (li piştta wê/wî/wan)
- ji zikî ve nexweş e (ji zikê xwe ve)

Paşpirtika "î" ya dawiya peyva "serî" yan "ê" ya dawiya peyva "piştê" ne tenê ji ber çemandina ji encama daçekan (bi/li) ne. Di rewşên wiha de "î" dikeve gel peyva "ser" û "zik" di wan devokan de jî ku adeten navdêrên nêr bi paşpirtika "î" naçemînin. Anku "î" û "ê" li vê derê ne (bi tenê) paşpirtikên çemandinê ne lê ew (di heman demê de) cînavên pêvekirî ne (jî) û maneya "wê/wî/wan" didin.

Li gel daçekan û lêkeran, me dît ku "-ê" wek cînavê pêvekirî cihê "wê, wî, wan" digire. Ew hem bêcins e (hem li cihê "wî" jî û "wê" jî li kar e) û hem jî bêhejmar e (dikare bi bi maneya "wê/wî" yên hejmar yan jî bi wateya "wan" yê pirhejmar be).

Lê em li gel navdêran dibînin ku carinan cînav bi awayê "î" ye ("saet li destî") û carinan jî wek "ê" ye ("ristika zêrî li gerdenê"). Gelo di nimûne yekem de "î" maneya "wî" û di ya duyem de jî "ê" wateya "wê" dide?

Nexêr, cînavê pêvekirî dîsa jî bêcins e: "saeta li destî" dikare li destê "wê" jî be ank xwediya saetê jin be. Herwiha "ristika li gerdenê" wek prensîp dikare li gerdena "wî" be. Herwiha dîsa jî cînavê pêvekirî bêhejmar e jî: "li destî" dikare maneya "li destên wan" jî bide, "li gerdenê" dişê bi wateya "li gerdenên wan" jî be.

Anku cudahiya cînavî ne li gor cînavî bi xwe (wê, wî, wan) e lê li gor cinsê peyvê ye: "li destî" ji ber ku "dest" nêr e (ne ji ber ku qest jê illeh destê mêrekî ye) û "li gerdenê" ji ber ku "gerden" peyveke mê ye (ne ji ber ku illeh gerdena jinekê ye).

Me li destpêka vê beşê got ku girêdana cînavê sêyem tenê bi komeke bisinor ya navdêran re mimkin e. Gava ku em dibêjin "derbe li piştê da", em jê fehm dikin ku illeh behsa "piştta wê/wî/wan" tê kirin. Lê gava ku em dibêjin "derbe li kitêbê da", em vê illehiyê di peyva "kitêbê" de nabînin. Belkî wî kesî

derbe li "kitêba te, kitêba min, kitêba xwe, kitêba we"yan jî kitêbeke bêxwedî yan xwedînediyar jî dabe.

Sebebê vê cudahiyê ew e ku "pişt, ser, zik, gerden" hin ji peyvên wisan in ku di zimannasiyê de jê re tê gotin **neguhêzbarî** yan **xwedîtiya neguhêzbar** (bi inglîzî *inalienability* yan *alienable possession*<sup>48</sup>). Navdêrên neguhêzbar navên wan tiştan in ku mirov nikare ji kesekî neqlî kesekî din bike. Bo nimûne, endamên leşê mirovan peyvên wisan in. Mirov nikare "ser, pişt, zik, sîng"ê xwe bide kesekî din anku ji wan re raguhêze yan neqil bike. Lê mirov dikare "kitêb, sêv, cil"ên xwe bide kesekî din anku wan ji kesekî din re raguhêze loma peyvên wiha guhêzbar in, berevajî "ser, pişt, zik, sîng" ku neguhêzbar in.

Xwedîtiya tiştên guhêzbar ne zerûrî ye: mimkin e ku kesekî kitêb yan sêv tine bin. Lê ne mimkin e yan jî dijwar e ku kesekî ser, zik, pişt, dest... tine bin.

Di rêzimana gelek zimanan de peyvên wiha xwedî hin taybetmendiyan in ku li gel navdêrên din nînin. Di rêzimana kurmancî de cudahî ew e ku cînavê sêyem yê pêvekirî ji navdêrên neguhêzbar diyar dibe lê ji navdêrên guhêzbar xuya nabe.

Di rêzimana kurdiya navendî (sorani) û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî xwe bi awayekî diyar dike. Gava ku mirov behsa tiştêkî xwedîdar ya guhêzbar dike, di van herdu lehceyan de paşpirtika diyarker (li cihê "the" ya inglîzî yan "el" ya erebî) tê bikaranîn, bi forma xwe ya yekhejmar di sorani de "-eke-", di kurdiya başûrî de bi pirani "-ege-", carinan "-eke-":

sorani	başûrî	kurmancî
kitêb-eke-m	kitaw-ege-m	kitêba min
kitêb-eke-t	kitaw-ege-d	kitêba te
kitêb-eke-y	kitaw-ege-y	kitêba wê/wî
kitêb-eke-man	kitaw-ege-man	kitêba me
kitêb-eke-tan	kitaw-ege-dan	kitêba we
kitêb-eke-yan	kitaw-ege-yan	kitêba wan

Lê gava ku navdêr neguhêzbar be, bo nimûne endamekî leşî be, hingê "-eke-/ege-" nayê bikaranîn:

<sup>48</sup> Binêrin: [https://en.wikipedia.org/wiki/Inalienable\\_possession](https://en.wikipedia.org/wiki/Inalienable_possession)

soranî	başûrî	kurmancî
ser-im	ser-im	serê min
sik-it	zig-id	zikê te
pişt-î	pişt-î	pišta wê/wî
des(t)-man	des-man	destê(n) me
bawk-tan	bawg-dan	bavê/babê we <sup>49</sup>
dayk-yan	dalêg-yan	dayika wan

## 6.6. Cînavê yekem yê pêvekirî

Ji bilî cînavê sêyem, herwiha cînavê yekem yê yekhejmar jî mimkin e ku bi navdêran ve were girêdan:

- cana-m (cana min)
- dilê-m (dilê min)

Ev girêdan tenê bi navdêran ve sinorkirî ye, berevajî cînavê sêyem, ew li gel birrên din yên peyvan (daçekan yan lêkeran) nayê girêdan. Herwiha tenê cînavê yekem yê yekhejmar (min) dikare were pêvekirin, ne cînavê yekem yê pirhejmar (me). Berevajî vê, cînavê sêyem hem yekhejmar (wê, wî) û hem jî pirhejmar (wan) dikare bê girêdan.

Herwiha girêdana cînavê yekem di kurmancî de tenê devkî yan helbestkî ye. Di zimanê nivîskî de ew hema-hema nayê bikaranîn û li cihê wî cînavê serbixwe "min" serdest e. Berevajî wî, girêdana cînavê sêyem hem devkî û hem jî xaseten nivîskî ye.

Ji aliyê tarîxî ve, tê texmînkirin ku cînavên pêvekirî kevn in û cînavên serbixwe yên çemandî dikare nûyîtiyeke (înovasyon, *innovation*) kurmancî û zazakî be.<sup>50</sup> Lê di meseleya cînavê yekem yê yekhejmar yê pêvekirî de, ihtimalen berevaniya vê rast e: cînavê pêvekî (-m) di kurmancî de tenê kurtkirina "min" e. Ihtimalen lê ne bi eshî ew ji tesîra tirkî yan jî soranî be lê dikare nûyîtiyeke xwemalî jî be.

<sup>49</sup> Çunkî bi zerûrî her kesî babek/bavek heye yan hebûye.

<sup>50</sup> Bo nimûne: Michiel Leezenberg *Gorani Influence on Central Kurdish*: [home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf](http://home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf)

## 7. CÎNAVÊ LÊVEGER "XWE"

### 7.1. Xwe: varyant û hevrehên wî

Mebest ji cînavê lêveger anku refleksiîv (*reflexive pronoun*) ew cînav e ku diyar dike ku biker (fail, *subject*) û berkar (mef'ûl, *object*) eynî kes in:

- ez xwe dişom.
- Wî xwe kuşt.

Di kurmanciya nivîskî de ev cînav "xwe" ye. Di devokên kurmancî de ew dikare bi van forman peyda bibe (di malikên aliyê rastê de deverên bikaranîna wan (bi awayekî giştî, dikarin li hin deverên din jî wisa bin yan li wan deveran jî li hin deran bi awayekî din jî be):

Awayê gotinê	deverên bikaranîne
<b>xwe</b>	navendî, bakur-rojhilatî
<b>xo</b>	rojhilatî
<b>xu, xwi</b>	rojawayî
<b>xwa, xa</b>	bakur-rojawayî
<b>xe</b>	zimanê zarokan an zarokane

Di kurmancî de ev cînav bêcîns, bêhejmar û bêtewang e anku di her hal, hejmar û cînsî de eynî ye:

- Wî xwe şûşt / Wê xwe şûşt (nêr û mê)
- Ew xwe di awêneyê re dibîne / Ew xwe di awêneyê re dibînin. (yekhejmar û pirhejmar)
- Ew bi xwe / Wî bi xwe (neçemandî û çemandî)

Di lehceyên din jî yên kurdî de hevreh û hevwateryên vî cînavî wiha ne:

- soranî: xo
- kurdiya başûrî: xue, xüe
- zazakî: xo, xwu



- hewramî: wê<sup>51</sup>

Cînavê “xwe” jî pir kevnar e û hevrehên wî ne tenê di hemû lehceyên kurdî de, lê herwiha di zimanên din yê îranî de û herwiha di gelek zimanên din jî yê hindûewropî de peyda dibin. Li vê derê em ê tenê hin nimûneyan pêşkêş bikin.<sup>52</sup>

kurdî	xwe, xo, xu...
pehlewî	xwed
farisî	xod
avestayî	xweðete-
sanskritî	svedha, sve-
rûsî	svoy
latînî	suus, suesco, se
fransî	soi, son, se, sa
swêdî, danmarkî	sig, sin
almanî	sich, sein

Maneya piraniya van peyvan jî “xwe” ye lê ya hinan jî “ya/yê wê/wî” ye, bo nimûne “son” ya fransî yan “sin” ya swêdî.

## 7.2. Bergehên bikaranîna cînavê “xwe”

Di kurdî de “xwe” ne tenê hingê tê bikaranîn ku biker û berkar eynî bin. Mirov dikare sê bikaranînên cuda yê cînavê “xwe” di kurmanciya giştî de bibîne:

- Gava ku biker û berkar eynî bin:
  - o “Wî xwe kuşt” (Kujer û kuştî eynî kes e).
 Bidin ber:
  - o “Wî ew kuşt” (kujer û kuştî du kesên ji hev cuda ne).

<sup>51</sup> Bo ketina X ji berî W di komdengên XW de, bidin ber kurmancî “xweş, xwarin, xwandin”, zazakî “weş, werdene, wendene”.

<sup>52</sup> Bo lîsteyeke dirêjtir, binêrin bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/sw%C3%A9>

- Gava ku tişteke yê bikerê/î be:
  - o “Nanê xwe xwar” (xwediyê nanî û bixwerê nanî eynî kes in).  
Bidin ber
  - o “Nanê wî xwar” (xwediyê nanî û bixwerê nanî du kesên ji hev cuda ne).
- Bi mebesta xurtkirina bikerê:
  - o “Ew bi xwe hat.” (Ew hat, ne ti kesekî din, ne nûnerekî wî)

Ji bilî van, di hin devokên kurmançî de (xaseten di kurmançiya rojavayî de) bikaranîneke din jî ya cînavê xwe heye. Ew li wî cihê jî tê xebitandin ku kurmançiya giştî adeten cînavê “wî” yan “wê” diemilîne:

- “Navê xwe Hesên e.” (Standard: Navê wî Hesên e.)
- “Navê birayê xwe Hesên e.” (Standard: Navê birayê wê Hesên e.)

### 7.3. Cudahiyên bikaranîna cînavê lêveger di zarên kurdî de

Di hemû lehceyên kurdî de cînavê lêveger (bi kurmançiya standard “xwe”) bêcîns, bêhejmar û bêtewang e. Di kurmançî û zazakî de ew xwerû tê bikaranîn lê di soranî, başûrî û hewramî de ew hewceyî cînavê pêvekirî ye. Kerem bikin em li çend nimûneyên soranî binêrin:

- xo-m (ez xwe; min xwe):
  - o xom deşom (ez xwe dişom), xom şûşt (min xwe şûşt)
- xo-t (tu xwe; te xwe)
  - o xot deşoy (tu xwe dişoyî), xot şûşt (te xwe şûşt)
- xo-y (ew xwe; wê xwe)
  - o xoy deşo (ew xwe dişo), xoy şûşt (wê/wî xwe şûşt)
- xo-man (em xwe; me xwe)
  - o xoman deşoyn (em xwe dişon), xoman şûşt (me xwe şûşt)
- xo-tan (hûn xwe; we xwe)
  - o xotan deşon (hûn xwe dişon), xotan şûşt (we xwe şûşt)
- xoyan (ew xwe; wan xwe)
  - o xoyan deşon (ew xwe dişon), xoyan şûşt (wan xwe şûşt)

## 8. CÎNAVÊN BERAMBERIYÊ

Di zimannasiyê de mebest ji cînavên ji cînavên beramberiyê (*reciprocal pronoun*) ew cînav in ku diyar dikin ku du kes yan du kom hem biker in û hem jî berkar in. Yek tiştêkî li yê din dike û yê din jî heman tiştî li wî dike. Bo nimûne:

- Hesên û Ehmed hev dinasin.

Eslê mebesta vê hevokê wiha ye:

- Hesên Ehmedî dinase û Ehmed jî Hesênî dinase.

Lê bo kurtkirinê û rêgirtina li ber dubarekirina peyvan, bi alîkariya cînavê “hev” hevok hatiye kurtkirin û wek “Hesên û Ehmed hev dinasin” hatiye dariştin.

Di kurmancî de du desteyên cînavên beramberiyê peyda dibin ku ji her yekê jî çend varyant hene. Devokên navendî, bakurî û rojavayî peyva “hev” wek bingeh digirin û yek ji van awayan bi kar tînin:

- **hev**, hevdu<sup>53</sup>, hevûdu, hevûdin, hevdir

Ev peyv hevrehê peyvên “hem, heman, hemî, hemû” ye û eslê peyvê maneya “eynî” dide. Anku du kes eynî tiştî li hev dikin loma ew beramberî ye û ji vî cînavî re “cînavê beramberiyê” tê gotin.<sup>54</sup>

Cînavê “hev” û varyantên wî yê li jor rêzkirî di kurmanciya nivîskî de jî berbelav û serdest in. Lê ne kurmanciya rojhilatî û ne jî zarên din yê kurdî wê yan hevrehên wê wek cînavê beramberiyê naxebitînin.

Di devokên kurmanciya rojhilatî<sup>55</sup> de li cihê cînavê “hev”, peyva **êkûdu** wek cînavê beramberiyê tê bikaranîn. Ew dikare herwiha bi şiklê “êkdu, êkdî, yekûdu, yekdu, yêkûdu, yêkdu, êkûdû” û hwd. jî peyda bibe:

- Hesên û Ehmed êkûdu nas dikin.

Peyva “êkûdu” ji herdu hejmarên “yek” (bi kurmanciya rojhilatî “êk”) û “du” peyda bûye. Anku kesek tiştêkî li kesekî dike û kesa/ê duyem jî eynî tiştî li kesa/ê yekem dike.

<sup>53</sup> Carinan bi şiklê “hevdu” jî tê nivîsîn.

<sup>54</sup> Bo zêdetir li ser etîmolojiya vê peyvê, binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/hev>

<sup>55</sup> Mebest ji “kurmanciya rojhilatî” devokên kurmancî yê Behdînan, Hekariyan, Êrmîyê û wan derdorên in.

Hin caran “êkûdu” tê kurtkirin û tenê “êk” yan “yek” dimîne:

- Ehmed û Hesên êk nas dikin.

Bikaranîna “êkûdu” wek cînavê beramberiyê dikare ji kurmancîaxivên deverên din re xerîb û ecêb be lê di rastiye de qalibekî bi heman awayî di lehceyên din jî yên kurdî de li kar e.<sup>56</sup>

Di zazakî de cînavê beramberiyê *yewbîn* e ku ji peyvên “yew” (yek) û “bîn” (din / dî, ya/yê/yên din/dî) pêk hatiye. Di zazakiya bakurî (dêrsimî) de ew bi şiklê “zûvîni” ye, ji peyvên “zû/jû” (yek) ya zazakiya bakurî û “bîn” ku li nava peyvê bûye “vîn” (bidin ber hin devokên kurmancî: xirabî → xiravî, kebab → kivav).

Di soranî de cînavê beramberiyê li gor devokan dikare *yekdî* yan *yektir* be ku ew jî ji peyvên “yek” û “dî / tir” (din / dî, ya/yê/yên din/dî) pêk hatiye. *Yektir* yan *yektirî*, *yektirekî* di devokên kurdiya başûrî de jî li kar in.

---

<sup>56</sup> Qalibekî nêzikî wan cînavê beramberiyê yê tirkî jî pêk tîne: “birbirini, birbirine, birbirinin...” ku ji peyva “bir” (yek) ya dubarekirî pêk tê.

## 9. CÎNAVÊN NÎŞANDER

### 9.1. Cînavên “ev” û “ew”

Mebest ji **cînavên nîşander** yan *cînavên nîşandanê* (demonstrative pronouns) ew cînav in ku pê tişt yan kes tên nîşandan û îşaretkirin. Di kurmancî de cînavên nîşa\_nder yê n serekî **ev** û **ew** û formên wan yê n çemandî ne. “Ev” bo nîşandana tiştên nêzîkî qisekerî û “ew” jî bo tiştên ji qisekerî dûrtir tê bikaranîn.

“Ev” û “ew” bi formên xwe yê n çemandî wiha ne:

cînavên nîşander	xwerû	çemandî mê	çemandî nêr	çemandî pirhejmar
<b>nêzîk</b>	ev	vê	vî	van
<b>dûr</b>	ew	wê	wî	wan

Li gor devokan, çendîn formên cuda ji her cînavêkî nîşander yê çemandî peyda dibe:

standard, serdest	formên din
<b>vê</b>	evê, vêya, evêya, viya, vîna
<b>vî</b>	evî, viya, eviya, vîna
<b>van</b>	evan, vana, va, evana, evanan
<b>wê</b>	ewê, wêya, wêna, wiya
<b>wî</b>	ewî, wiya, wîna, ewîya
<b>wan</b>	wa, ewan, wana, ewana, ewanan

Formên serdest ji “ev” yan “ew” + paşgirên çemandinê “-ê” (mê), “-î” (nêr) û “-an” (pirhejmar) peyda bûne lê paşî “e” ji destpêka wan ketiye:

- ev + ê → evê → vê
- ev + î → evî → vî
- ev + an → evan → van
- ew + ê → ewê → wê

- ew + î → ewî → wî
- ew + an → ewan → wan

Formên “va, wa” yên pirhejmar bi ketina N ji dawiya wan peyda bûye – tam wek ku N ji dawiya navdêrên çemandî yên pirhejmar jî di zimanê devkî de dikeve:

- du hevalan → du hevala

Formên “evanan, ewanan” pirhejmariyên ducarî yan dubarekirî ne: ev-an-an, ew-an-an. Şiklên “ewana, evana” û “vana, wana” formên wan yên kurtkirî ne.

Formên “vêna, wêna, vêya, wiya...” kurtkirina “vê ya han, wê ya han, vî yê han, wî yê han” û hwd. peyda bûne. Bo “han”ê li jêrtir binêrin.

Li jor behsa peydabûn û etîmolojiya “ew” li gel cînavên din yên kesî hatiye kirin. Cînavê “ev” di zar û zimanên lêzim de wiha ye:

kurmancî	ev
soranî	em
farisî	im <sup>57</sup> , în
hexamenişî	ime-

Pêşgira kurmancî “î-” wek di peyvên “îro, îsal, îşev” de jî ji eynî rehî ye. Herwiha cînavên nîşandanê yên nêzîk yên zazakî “na” (mê), “no” (nêr) û “nê” (pirhejmar) dikarin ji eynî rehî bin û tarîxiyên bi şiklê “în-a, îno, îne” bûbin lê paşî “î-” ji destpêka wan ketibe. Bi alternatîvî, ew dikarin hevrehên “han” ya kurmancî bin (li jêrtir binêrin).

## 9.2. Cînavê nîşander “han”

Cînavê din jî yên nîşander di kurmancî de heye. Di zimanê nivîskî de ew bi piranî bi şiklê “han” tê dîtîn lê çend varyantên wî yên din jî peyda dibin:

<sup>57</sup> Bo nimûne di peyva “imrûz” (îro, evro) de.

- hanê, ha, he, henê

Berevajî cînavên “ev, ew”, ev cînav nakeve berî lê pey navdêran. Navdêr bi alîkariya ravekê yan îzafeyê bi “han”ê ve tên girêdan:

- kitêba **han**, xaniyê **han**, malên **han**

Ravek li gor cinsê navdêrê ye:

- kitêba han (ji ber ku “kitêb” mê ye)
- xaniyê han (çunkî “xanî” nêr e)
- malên han (ji ber ku “mal” li vê derê pirhejmar e)

Tarîxiyên cînavê “han” di wateya cînavê “ev” bû û maneya “ew” wek cînavê nîşander dide. Hevrehê cînavê “han” di farisî de “an” e û niha jî maneya “ew” dide. Heman cînav di zazakî de niha bi awayên “na” (mê), “no” (nêr) û “nê” (pirhejmar) jî dikarin ji eynî rehî bin. Formên zazakî belkî tarîxiyên “an-a, an-o, an-ê” yan jî “în-a, îno, îne” bûbûn lê paşî “a-” yan “î-” ji destpêka wan ketibe. Di zazakî de ew ne maneya “ew” lê wateya “ev” ya kurmancî didin. Bi alternatîvî ew dikarin hevrehên “ev” ya kurmancî bin (li jortir binêrin).

Lê niha cînavê “han” û varyantên wê yê cuda-cuda bi merema îşaretkirin û destnîşankirinê tên bikaranîn lê – berevajî “ev” û “ew” – “han” nêzîkahî û dûrahiyê ji hev diyar nake. Di rastiyê de ew gelek caran hevdem li gel “ev” yan “ew” tê xebitandin:

- ev kitêba han
- ew kitêba han

Cînavê “han” bi xwe neçembar e anku naçeme. Xwerû, mê, nêr, yekhejmar, pirhejmar – hemû bi eynî şiklî ne (şikil tenê li gor devokan yan tercîhên kesî diguhere: han, hanê, ha, he, henê). Loma tevî guherîna cînavên “ev” û “ew” jî, “han” bi wan re her wek xwe dimîne:

- ev kitêba han, vê kitêba han, vî xaniyê han, van kitêbên han
- ew mala han, wê mala han, wî birayê han, wan malên han

Cînavê “han” dikare bi navbeynkariya ravekê yekser li gel cînavên “ev” û “ew” re jî were bikaranîn bêyî ku ti navdêr di navbera wan de cih bigirin:

- ev a han, ev ê han, ev ên han
- ew a han, ew ê han, ew ên han



Formên “va, wa” yên yekhejmar yên hin devokan di rastiye kurtkirinên “ev a han” û “ew a han” in.

### 9.3. Cînavên nîşander û paşgira –e / -a

Di kurmancî de cînavê “ew” dikare bikeve berî navdêran bêyî ku ti ji herduyan ti zêdehiyekê lê bibe.

Bo nimûne:

- ew kitêb, ew dest, ew herdu mal

Di halê çemandî de hem cînav û hem jî navdêr çemandî ne:

- wê kitêbê, wî destî, wan herdu malan

Cînavê “ev” jî di zimanê nivîskî û di hin devokan de bêyî ti zêdehiyê li gel navdêran tê bikaranîn:

- ev kitêb, ev dest, ev herdu mal

Di hale çemandî de herdu jî diçemin:

Lê di kurmanciya rojhilatî de û di hin devokên din jî yên kurmancî de, bikaranîna cînavê “ev” di hale xwerû de berî navdêrekî, bi zerûrî paşgira “-e” li dawiya wî navdêrî zêde dike:

- ev kitêbe, ev deste, ev herdu male:
  - o Ev kitêbe xweş e, ev deste nazik e, ev herdu male mêvanperwer in.

Di hin devokan de – bi taybetî li hin deverên kurmanciya navendî – li şûna “-e”, paşgira “-a” tê xebitandin:

- ev kitêba, ev desta, ev herdu mala

Di halê çemandî de ev “-e” li navdêran zêde nabe anku di kurmanciya rojhilatî de jî mirov wiha dibêje:

- vê kitêbê, vî destî, van herdu malan

Eger cînavê “ev” bê navdêr were bikaranîna, hingê di kurmanciya rojhilatî de “-e” cînavî bi xwe digire:

- eve:
  - o Eve xweş e.

Bikaranîna vê paşgira “-e” di soranî de ne tenê li gel cînavê “ev” (bi soranî bi forma “em”) lê herwiha li gel cînavê “ew” jî zerûrî ye:

- kitêb → em kitêbe, dest → em deste, mall → em herdû malle:
  - o Em kitêbe xoş e, em deste nask e, em herdû malle mîwanperwer in.
- ew kitêbe, ew deste, ew herdû malle

Eger navdêr li pey cînavî nebin, di soranî de herdu “em, ew” paşgira “-e” werdigirin:

- eme, ewe:
  - o Em xoş e, ewe xoş e.

Hin devokên kurmançî jî yê cîranî soranî (bo nimûne Êrmiyê, Hekariyan, Barzan), paşgira “-e” li gel cînavê “ew” jî bi kar tînin:

- ew kitêbe, ew male, ew deste

Ev paşgira “-e” û varyanta wê ya “-a” bi eslê xwe kurtkirina formên “-a han, -ê han, -ên han” in:

- ev kitêba han → ev kitêbe/kitêba
- ev destê han → ev deste/desta
- ev malên han → ev male/mala

Berevajî “-a han, -ê han, -ên han” – ku cins û hejmarên rêzimanî diyar dikin – paşgira “-e” (yan “-a” ya hin devokan) neutral e û bêcins û bêhejmar e.

Di kurmançî de hem “-a han, -ê han, -ên han” maye û hem jî “-e, -a” di gelek devokan de peyda bûne. Di soranî de “-a han, -ê han, -ên han” winda bûne (yan jî ti caran peyda jî nebûne) lê “-e” ji kurmançî berbelavtir e û di hemû devokên soranî de û di soraniya standard de ne tenê mimkin e lê zerûrî ye.

#### 9.4. Tesîra tirkî: cînav neçemandî û navdêr çemandî

Di kurmançî eger navdêr çemandî be, cînavê diyarker yê pê ve jî çemandî ye:

- ev kitêb → vê kitêbê
- ew dest → wî destî
- ev ser → van seran

Berevajî kurmandî, di tirkî de cînavê pêşdiyarker neçemandî dimîne tevî ku navdêrê pey wî biçeme jî:

- bu kitap (ev kitêb) → bu kitabı (ne “\*bunu kitabı”)
- şu el (ew dest) → şu eli (ne “\*şunu eli”)
- bu başlar (ev dest – pirhejmar) → bu başları (ne “bunu/bunları başları”)

Carinan mirov ji tesîra vî qalibê tirkî, di nivîs û axiftinên kurmandî de jî awayên wiha dibîne ku tê de cînav neçemandî û navdêr çemandî ne:

- li ev malê
- bi ew kesî re
- ji ev deran

Lê formên wan yên rast yên kurdî wiha ne:


- li vê malê
- bi wî kesî re
- ji van deran

***Ev vekolîna li ser cînavan dê di hejmara 7 de bidome.***

**Dilawer Zeraq û Mem Wenda**

## FERHENGA TERMÊN MATEMATÎKÊ

Van salên dawiyê çendîn ferhengên warên cuda-cuda yên zanistî bi kurmancî hatine weşandin.<sup>58</sup> Ev ji van wan jî *Ferhenga Termên Matematîkê* ya bi daneriya du nivîskarên bi bernavên Dilawer Zeraq û Mem Wenda ne ku sala 2015 hatiye çapkirin.



Ev ferheng 2-beşî ye. Di beşa yekem de peyv û gotinên matematîkê bi kurdî hatine rêzkirin û wergerên wan yên fransî, inglîzî, almanî û tirkî hatine pêşkêşkirin. Di beşa duyem de peyv û gotinên matematîkê bi tirkî hatine rêzkirin û wateyên wan yên kurdî hatine dan.

Herdu danerên ferhengê di çend hevpeyvînên xwe yên bi medyayê re de diyar kiriye ku armanca ferhengê ew e ku zimanê kurdî di warê matematîkê de çalak bibe û pêş bikeve. Di pêşgotin û hevpeyvînan de hatiye dubarekirin ku ferheng berhema xebateke çar salan e.

Tevî ku armanca ferhengê ne hînkirina matematîkê lê berhevkerin û afirandina peyv û gotinên warê matematîkê di zimanê kurdî de ye û mirov dikare bibêje ku ew bi armanca hînkirin û danhînkirina kurdî di nav şarezayên matematîkê de ye, daner bi awayekî dîr û dirêj û sloganî pesnê matematîkê didin ("matematîk jiyan e û jiyan matematîk e"). Lê ew zêde ti tiştî derbarê proseya amadekirina ferhengê bi xwe nakin. Bi çend gotinên giştî yên nezela yên wek "carinan em li gor mentiqê kurdî

<sup>58</sup> Binêrin Kovara *Kanîzar* hejmar 5: <https://zimannas.wordpress.com/2016/04/01/ferhenga-zanisten-civaki-ya-abdullah-kiran/>

çûn, carinan jî me mentîqa matematîkê da pêş” – heçku lihevnekirinek di navbera ”mentîqa kurdî” û ”mentîqa matematîkê” de hebe.

Ferheng pirzimanî ye lê ev pirzimanîtiya wê du pirsên giring li ba bikarîner û xwandevanên wê peyda dike:

- 1) Gelo çima ferheng bi hind/ewqas zimanan (kurdî, fransî, inglîzî, almanî, tirkî)? Mirov fehm dike ku ferheng kurdî-tirkî û tirkî-kurdî ye ji ber ku ew li Tirkîyê hatiye weşandin û piraniya bikarînerên wê tirkî dizanin û – Xwedê bike – mijûlî wergerandina yekser yan neyekser ya berhemên matematîkê yên tirkî ne. Mirov herwiha fehm dike ku di ferhengê de inglîzî jî heye ji ber ku ew zimanê serekî yê navneteweyî ye û bi rêya cihdana ji inglîzî re, kurdên ne-bakurî yên tirkînezan jî dikarin ji ferhengê mifa wergirin.

Lê gelo faydeya fransî yan almaniya wê dê ji çend kesan re hebe? Bi taybetî jî mirov ji rêzkirina zimanan diheyire: fransî berî inglîzî, almanî û tirkî hatiye. Anku piştî peyva kurdî, wergera wê ya fransî, paşî wergera inglîzî, dû re wergera almanî û li dawiyê jî wergera tirkî hatiye danîn. Lê madem ku piraniya bikarînerên wê dê tirkîzan bin (fransînezan, almanînezan û heta bi piranî inglîzînezan jî), çima barê bikarîneran hatiye girankirin û tirkîya wan li dawiya hemû zimanên din tê. Rêzkirina maqûl û beraqil dê wiha bûya: tirkî, inglîzî, almanî, fransî (ji ber ku hejmara kurdên li Almanyayê anku almanîzan ji ya kurdên Fransayê anku fransîzan pir mezintir e).

- 2) Li ti dera ferhengê nayê gotin ka gelo danerên vê ferhengê bi rastî van hemû zimanan dizanin an jî peyvên almanî, fransî û inglîzî tenê kopîkirina ji hin ferhengên tirkî û van zimanan in. Gumaneke pir xurt heye ku daner van hemû zimanan nizanin. Ji çavkaniyên wan jî diyar nabe ku wan berhemên ne-kurdî û ne-tirkî bi kar anîbin. Ji rastnivîsîna peyvên almanî aşkere ye ku ew di rastiyê de vî zimanî nizanin ji ber ku di almanî de li destpêka hemû navdêran (ism, noun) herfa gir heye lê danerên vê ferhengê ew bi herfên hûr nivîsîne (ji bilî hin navên kesan). Di gelek cihan de jî peyvên almanî û/yan fransî nehatine dan. Mimkin e ku di zimanekî de ti peyv bo tiştekî yan diyardeyekê tine bin lê eger mirov wan zimanan bizane, mirov wê peyvê bi wî zimanî bi awayekî şirove dike. Danerên ferhengê wisa jî nekiriye.

Wisa beşa kurdî bi çendîn zimanan hatiye girankirin û wergerên peyvên kurdî jî hemû ji ber sebebekî nediyar di nav kevanan de hatine danîn ku tenê berhemê qurs û sext dikin.

Beşa tirkî (ku daner ji ba xwe ve jê re dibêjin "rêzîna tirkî") ji beşa kurdî bi gelek awayan çêtir e. Tenê werger bi kurdî hatine dan û bi zimanên din nehatine girankirin.

Li cihê fransî û almanî – ku ji piraniya bikarînerên vê ferhengê re ti feydeyê wan dê tine be – eger beşa li gor peyvên inglîzî jî hebûya, dê gelek bikêrtir bûya ji ber xwandevanên tirkînezan jî dê bikarîna li peyvên bi kurdî dixwazin bigerin.

Belkî kêmasiya herî mezin a ferhengê ew e ku ew tenê peyv û gotinan li zimanên din werdigerîne. Ew bi ti awayî şirove nake ka mebest ji wan têrman çî ye. Di vî warî de, wê dabûya ser şopa *Ferhenga Erdnigariyê* ya Abdurrahman Önen yan jî *Ferhenga Zanistên Civakî* ya Abdullah Kiran û têrmên xwe rave bikirana jî, dê gelek bisûdtir bûya.

## FERHENGNASÎYE Û FERHENGNASÎYA M. MALMÎSANIJÎ

**Ehmed Kirkan**

Ferheng, qalî vatene û qisey kerdene îfade keno.<sup>59</sup> Ferheng eslê xo de pehlevkî yo û yeno manaya kultur, luxat, perwerde, îlim, aqil ûsn.<sup>60</sup> Xusûsen na çekuye ziwane arîyan de (Fariskî, Kurdî) kitabo ke çekuye tede kom benî îfade kena.<sup>61</sup> Ferhengî heme çekuyanê ziwane yan zî heme çekuyê ke dewrêkê ziwane de ameyê şuxulnayene gêne xo mî- yan. Ferheng goreyê rêza alfabeyi çekuyan rêzkeno û manayê çekuyan, yan ziwane ferhengî de (ziwano ke ferheng hadre bîyo) yan zî ziwane xo xerîb de, dano. Ferheng, xezîneya çekuyan goreyê cîya-cîya fikran tesnîf keno û eseran vejeno meydan.<sup>62</sup> Na çekuye cîya-cîya ziwanan de cîyacîya manayan û çekuyana îfade bena. Ferhengnasîye zî îlmê ferhengî îfade kena yan zî merdimo ke îlmê ferhengî goreyê qaydeyanê îlmîyan keno, îfade kena. Ferheng û ferhengnasîye heme ziwananê dinyayî de cayêno muhîm gêne.

Însanan çî wext dest bi qalîkerdene kerdo û çî wext dest bi banderbîyayîşê ziwane xo xerîbî kerdo bellî nîyo. Goreyê zanayîşê ma ferheng tewr verên hetê Sumerîyan ra amade bîyo. No ferheng seba bazirganîya ke mabênê Sumerîyan û Akadîyan de bîya nûsîyayo. Yanî no ferheng Sumerkî-Akadmî yo.<sup>63</sup> Goreyê çimeyanê nuşteki bi terzê modernîya ferheng tewr verêno ke hadre bîyo, hete îdarekerdoxê muzeya Îskenderî- yeyî, Arîstophanesî Î.V.seserra II. de ziwane Yunankî de amade kerdo. Edebîyatê rojelatî de ferheng tewr veren ê Cewherî (m. 1010) yo. Fî- ruzabadî û Mutercîm Asim Efendî zî ferhengnasane muhîman ra yê.<sup>64</sup>

Ereban mîyan de xebata ferhengî demê cenabê pêxamberî ra dest pêkerdo. No dem de embazanê pêxamberî manaya çekuya ke Quran de nêzanayê pêxamberî ra pers kerde. Ney ra dima zaf ferhengî hadre bîyê. Bin o tewir musulmanan mîyan de de ferhengê Quranî hadre bîyê. Seserra 17. ra tepîya ferhengê di ziwane ke sey suryankî-erebkî, erebkî-tirkî, erebkî-fariskî ûsn zêdeyayê. Xusûsen na

<sup>59</sup> İsmail Durmuş, Sözlük, Diyanet İslam Ansiklopedisi, İstanbul 2009, c. 37, r. 398.

<sup>60</sup> Mehmet Kanar, Farsça Dilbilgisi, Say Yayınları, İstanbul 2011, r. 674

<sup>61</sup> Ferit Devellioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat, Doğu Matbaası, Ankara 1970, r. 310

<sup>62</sup> Zekeriyâ Bingöl, Sözlük Ve Sözlükçülük Üzerine Bir Araştırma, Akademik Bakış Dergisi, h.9, 2006, r. 198-199

<sup>63</sup> Durmuş, çc, r.398

<sup>64</sup> Bingöl, çc, r. 201



seserri ra tepîya oryantalîstan bi xo ferhengê di ziwani (yew ziwano rojelatî û o bîn zî ziwaneko rojawanî) amade kerde.<sup>65</sup>

Îran de xebata ferhengî seserra 9. dest pêkena. Ziwane îrankî de ferhengo tewr gird û bihecm, ferhengê Esedê Tûsî yo. Ferhengê erebkî- fariskî yo tewr veren ferhengê Edîb Kurdî Nîşaburî yo.<sup>66</sup>

Tirkan mîyan de zî ferhengnuştene û bi ferhengîya meşxul bîyayene zaf cayêno muhîm tepêşeno. Kaşgarli Mehmûdî bi nameye “Dîwanê Luxatî’t-Turk” ferhengêk nuşt. Nuşttox nê kitabê xo seba ke ereban banderê tirkî bikero nuşt. Nuşttox ney bi xo îfade keno. Badê nê ferhengî tirkan mîyan de zaf ferhengî ameyê nuştene. Zemaxşerî, Ebû Heyyan, Îbnî Muhenna, Alî Şîr Newaî, Exterî, Wankûlû, Wehbî ûsn zaf merdiman ferhengî nuştê. Tena nê ferhengî nê, seserra 19. û 20. ra tepîya reyna ziwane Tirkî de zaf merdiman -sey Muallîm Nacî, Ahmet Wefîk Paşa, Şemseddîn Samî- ferhengî nuştê. Sazbîyayîşê Komara Tirkîya ra tepîya serra 1928 de înkîlabê alfaba virazîya. Bi înkîlabê alfaba dewleta Tirkîya de herfê erebkî caverdeyayî û herfê latînkî ameyê şuxulnayene. Sazgehê Ziwane Tirkî (TDK) awan û na sasgeh standatî- zasyonê çekuyan û viraştîşê çekuyanê neweyan girewt xo ser û nika zî hîna nê karî keno.<sup>67</sup>

Ziwane Kurdî de ferhengo tewr verên Ehmedê Xanî nuşt. <sup>68</sup> No ferheng, Nûbehara Biçûkan, Ehmedê Xanî serra 1683 de bi zarê kurmancîya û bi terzê menzûmî ya nuşt. <sup>69</sup> Bade nê ferhengî seserra 17. de wendekar û hemwelatîyê Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî bi nameyê “Gulzar” ferhengêno erebkî- fariskî-kurdî hadre kerdo. <sup>70</sup> No ferheng bi hîrê ziwana ameyo nuştene. “Luxetnameyê Ehmedî” serra 1790 de hete Şêx Marûfê Nodeyî ra ameyo nuştene. <sup>71</sup> Serra 1912 de Şêx Muhemed Kerbelayî bi nameyê “Ferhenga Kerbelayî Mîrsadu’l-Etfal/Şahrahê Kûdekan” ferhengêno fariskî-kurdî nuşt. <sup>72</sup> Hetê Garzonî, Jaba, Edmonds, McCarus, Blau, <sup>73</sup> Prevodchîk, Khachatryan, Farîzov, Bakaev <sup>74</sup> ûsn oryantalîstan zî ferhengê kurdî amade kerdê. Bê nînan demê Usmanîyan de serra 1894 de ferhengêko bi nameye “el-Hedîyyetu’l-Hemîdîyye fî’l-Luxetî’l-Kurdîyye” hete Yusuf Zîyaeddîn Paşayî

<sup>65</sup> Durmuş, çc, r. 400-401

<sup>66</sup> Tahsin Yazıcı, Sözlük, Diyanet İslam Ansiklopedisi, İstanbul 2009, c. 37, r. 401-402

<sup>67</sup> Bingöl, çc, r. 198

<sup>68</sup> Kadri Yıldırım, Nûbehara Biçûkan, Avesta, İstanbul 2008, r. 59

<sup>69</sup> Şêx Muhemed Kerbelayî, Amd. Ramazan Pertev, Ferhenga Kerbelayî Mîrsadu’lEtfal/Şahrahê Kûdekan, Nûbihar, İstanbul 2012, r.10-12

<sup>70</sup> Yıldırım, çc, r.59

<sup>71</sup> Pertev, çc, r. 10-12

<sup>72</sup> Pertev, çc, r. 10-12

<sup>73</sup> Kemal Burkay, “Pêşgotin” mîyan de Ferhenga Îzolî, Weşanên Deng, Amed 2011, r. 5

<sup>74</sup> Yıldırım, çc, r.78-79

ra ameyo nuştene. No ferheng nêzdîyê 5000 çekuyan ra muteşekîl o. No ferheng pê di ziwani, erebkî-kurdî ameyo hadre kerdene.<sup>75</sup>

Ferhengê ziwani kurdî tena bi alfabeye erebkî yan latînkî ya nê, sewbîna alfabeyana zî amade bîyê. Xusûsen kurdan ê Armenîstanî bi alfabeya krîfî ya ferhengê kurdî hadre kerdê. Panc parçeyê Kurdîstanî de bi desana kesan ferhengî hadre kerdî. Nînan ra taye ci: E. Evdal, Qanatê Kurdo, Cegerxwîn, Mûsa Anter, M. Emîn Bozarslan, Maxîmê Xemo, Alî Seydo, Cemîlê Seyda, Fetûlah Kakîoglu, Îzolî, Baran Rizgar, Salah Saadallah, Zana Farqînî, Kameran Botî, Torî, Umîd Demîrxan ûsn desana merdiman tena bi zarê kurmancî de ferhengî nuştî.<sup>76</sup> Hete bîn ra zarê soranî zî zaf ferhengî ameyê nuştene. Heta kes eşkeno vajo ke soranî de derheqê her îlmî de ferhengî amade bîyê. Çunke kurdan mîyan de tena soranî ziwani resmî yê yew dewletî ya. O semed ra zarê soranî de zaf ferhengî hadre bîyê.<sup>77</sup>

Zarê kirmanckî/zazakî de ferhengo tewr veren serra 1987 de hetê M.Malmîsanijî ra amade bîyo. No ferheng, ferhengo musteqîl ê kirmanckî yo tewr veren o. Ewtîya de kes eşkeno vajo ke hadrekerdişê heme ferhanganê dinyayî de amaco sereke ziwani xo sewbîna miletan rê dayene qebûlkerdene û sewbîna miletan rê ziwani xo musnayene yo. Labelê seba kirmanckî û ferhanganê kirmankî ma ney nêeşkenê vajê. Çunke ferhengê kirmanckî vere verkan seba kirmancan ameyê hadre kerdene.<sup>78</sup> Çunke ziwani kurdî û zarê kirmanckî welatê xo de qedexe bî. O semed ra ziwanzan û nuştoxanê kirmanckî verê heme çî seba pawitene kirmanckî lebatîyayê. M. Malmîsanij destpêkê ferhengî de bin sernameyê “Vatîşê Vernî” de ewnayîn vano:

*“Dimilkî<sup>79</sup>, Kurdîstanê Rojetalê vakurî di hîrês wîlayetan mîyan di tay qeza, qesaba û dewan di qîsey beno. Heyanî ewro yew ferhengê zarava Dimilkî çino. Ê ke bi na zarava qîsey kenê, xo ra vanê Kird yan zî Kirmanc. Kurmancî (Kirdasî), yînî ra û zarava yînî ra vanê Dimilî. Tira Zaza, zarava yînî ra Zazakî zî vajiyêno.”<sup>80</sup>*

<sup>75</sup> Yıldırım, çc, r.75-76

<sup>76</sup> Yıldırım, çc, r. 78-94

<sup>77</sup> Seba melumatî b. Yıldırım, çc, r. 94-05

<sup>78</sup> Murat Varol, Zazaca Sözlükçülük Tarihi, Sorunları ve Çözüm Yolları, I. Uuslaraarası Zaza Dili Sempozyumu, Bingöl üniversitesi Yayınları, Bingöl 2011, r.354-355

<sup>79</sup> Alfabeya nuşttoxî ma bedilnê.

<sup>80</sup> Malmîsanij, Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Weşanên Deng, İstanbul 1992, r. 1.

Bade nê ferhengî zarê Kirmanckî de desana ferhengî ameyê nuştene. Nê ferhengan ra taye ci zazakî-tirkî taye ci tirkî-zazakî taye ci zazakî-kurmancî û taye ci zî zazakî-zazakî amade bîyê. Nê ferhengan ra yew sey ferhengê îdyoman û yew zî ferhengê vateyê verênan hadre bîyo. Ma nika taye babetan ê ferhengan ser o vinderênê û dima zî ferhengê ke zarê kirmanckî de hadre bîyê înan ser o vinderênê:

- a. **Ferhengê Etîmolojî:** Nê ferhengê kokê çekuyan ser o vinderênê. Mîsal ferhengê; *Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî, M.Malmîsanij î.*
- b. **Ferhengê Arêkerdişî** (derleme): Nê ferhengan de goreyê fekan û mintiqayan çekuyî kom benê, goreyê qaydeyanê îlîyan newe ra rêz benê. Mîsal; *Ferhengê Tirkî-Kirmanckî, Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Kirmanckî-Tirkî, Grûba Xebate ya Vateyî.*
- c. **Ferhengê Cigêriyayî** (tarama): Nê ferhengan de cîya-cîya çimeyan ra çekuyê cigêriyênê. Nê çekuyê ke ferhengnasî vistê xo dest sey ferhengî ya rêz benê.
- d. **Ferhengê Xeletat:** Nê ferhengan de çekuyê ke sewbîna ziwanan ra xusûsen zî erebkî û fariskî ra gêriyayê û manayê xo vindî kerdo înan ser o vinderîyêno. Ferhengnas nê çekuyan û manayan ê neweyan ferheng de mojneno. e.
- e. **Ferhengê Argoyî:** Nê ferhengan de çekuyê ke ziwana de zaf nêşuxulîyênê û goreyê cematî çekuyê ke eybê goreyê qaydeyanê ferhengî ya kom benê. Raste-rast no mijarî ser o tu xebatêk çin a.
- f. **Ferhengê Terman:** Nê ferhengan de cîya-cîya mijaran ê taybetan (muzîk, spor, tib, perwerde ûsn) ser o çekuyî kom benê û ey ferhengî ya nusênê. Mîsal; *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî, Ehmedê Dirihî.*
- g. **Ferhengê Îdyoman:** Îdyomî seba her ziwani cayêko muhîm de yê. Heta yew ziwana de çiqas îdyomî zaf ê, o ziwana hende dewlemend o. No babet ferhengan de tena îdyomî nusênê. Mîsal; *Ferhengê Îdyomanê Kurdkî (Kirmanckî-Zazakî), Roşan Lezgîn*
- h. **Ferhengê Vateyê Verênan:** Vateyê verênî îdyoman ra cîya y. Îdyomî hal û rewşêk rê îşaret kenê labelê vateyê verênan ders danê û îbretêk nîşan danê. Reyna kes eşkeno vajo ke yew ziwana de vateyê verênan çiqas zêde yê, o ziwana hende dewlemend o. No mijarî ser o kirmanckî de xebatêka akademîk çin a. Mîsal; *Vatenên Verênanê Ma, Zulfukar Ayyildiz î.*
- i. **Ferhengê Quranî:** Nê ferhengî goreyê sewbîna ferhengan cîya yê. Quran de çekuyê ke fam nêbenê no tewir ferhengan de îzah benê.<sup>81</sup>

<sup>81</sup> Ahmet Topaloglu, Sözlük, Diyanet İslam Ansiklopedisi, İstanbul 2009, c. 37, r. 411- 414

Ma nika ferhengê ke zarê kirmanckî de amade bîyê, derheqê înan de melumat bidê:

1. **Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Malmîsanij** (1987): Ferhengo tewr verên o. Çapa yewine weşanxaneyê “Jîna Nû” û çapa dîyine zî “Weşanên Deng” ra serra 1992 de vejîyayo. No ferheng 431 rîpel o.<sup>82</sup>
2. **Ferhengê Kurdî-Tirkî, Munzur Çem** (1994): No ferheng 589 rîpelî yo û seba zarê kirmanckî ferhengo diyîn o. No ferheng Stockholm de çap bîyo. Vernîya nê ferhengî de Munzur Çemî ser mijarê grameri de zî tay çiyî nuştî.<sup>83</sup>
3. **Ferhengekê Kirdkî- Pehlevkî- Kurmanckî, M. Malmîsanij** (1997): No ferheng “Weşanxaneyê Apec”î ra vejîyayo. Heta nika çapo diyîn zî nêvirazîyayo. No ferheng de Malmîsanijî muqayeseyê Fariskîya mîyanên (Pehlevkî) û Kurdî (Kirmanckî û Kurmanckî) keno. No semed ra ferhengêko balkêş o.<sup>84</sup>
4. **Ferhengê Zazakî-Tirkî, Mesûd Özcan** (1997): No ferheng serra 1997 de “Weşanxaneyê Kaynak” ra vejîyayo. No ferheng 240 rîpel o vernîya ferhengî de gramer zî esto.<sup>85</sup>
5. **Zazakî-Tirkî, Tirkî-Zazakî Ferheng, Turan Erdem, Orhan Erdem** (1997): No ferheng serra 1997 de “Weşanên Doz” ra vejîyayo û 222 rîpel o. Dima no ferheng ameyo hîrakerdene û “Weşanên Arya” ra vejîyayo û 440 rîpel o. No ferheng hem Zazakî-Tirkî û hem zî Tirkî-Zazakî yo.<sup>86</sup>
6. **Ferhengê Zazakî-Tirkî, Harun Turgut** (2001): No ferheng serra 2001 de “Weşanên Tîj” ra vejîyayo. Çapo yewin 336 û çapo diyîn 403 rîpel o.<sup>87</sup>
7. **Ferhengê Tirkî-Kirmanckî, Grûba Xebate ya Vateyî** (2001): No ferheng goreyê grûbêk virazîyayo yanî xebatêka şexsî nîya. Grûba Xebate ya Vateyî kombîyayîşanê xo de standartîzasyona çekuyan ser o xebitêna û dima nê çekuyan sey ferhengî ya çap kena. No ferheng heta nika çar rey çapbîyo. Çapo yewin “Avesta” serra 2001 de û çapo diyîn 2004 “Weşanxaneyê Vateyî” ra û çapo hîrêyin serra 2009 de çapa çarin zî serra 2011 de reyna eynî weşanxaneyî ra çap bîyo.<sup>88</sup>

<sup>82</sup> M. Malmîsanij, Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Weşanên Deng, İstanbul 1992

<sup>83</sup> Munzur Çem, Ferheng Kurdi-Tirki, Stockholm, 1994

<sup>84</sup> M. Malmîsanij, Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî, Stockholm 1997

<sup>85</sup> Mesut Özcan, Zazaca-Türkçe Sözlük, Kaynak Yayınları, İstanbul 1997

<sup>86</sup> Turan Erdem, Orhan Erdem, Zazakî-Tirkî/Tirkî-Zazakî Ferheng, Weşanên Arya, İstanbul 2006

<sup>87</sup> Harun Turgut, Zazaca-Türkçe Sözlük, Weşanên Tîj, İstanbul 2001

<sup>88</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Tirkî-Kirmanckî İstanbul 2011

8. **Ferhengê Kirmanckî-Tirkî**, Grûba Xebate ya Vateyî (2001): No ferheng zî goreyê Grûba Xebate ya Vateyî virazîyayo û reya veren serra 2001 de vejîyayo û heta nika bi hîrakerdişa çap bîyo.<sup>89</sup>
9. **Ferheng-Vajname**, S.Veroj-Abdurrahman Uçaman (2002): No ferheng mîyan de ferhenganê kirmanckî de cayêko taybet gêno çunke no ferheng de manayê yew çekuye çar zarê kurdî de -kurmancî, hewramî, kirmanckî û senendejî- deyêno. No kitab serra 2002 de “Weşanxaneyê War” ra vejîyayo.<sup>90</sup>
10. **Ferhengê Kurmancî-Dimilî**, Seîd Veroj (2003): No ferheng serra 2003 de “Weşanxaneyê War” ra vejîyayo.<sup>91</sup>
11. **Ferhengê Zazakî-Tirkî**, Mehmet Aydar (2003): No ferheng serra 2003 de “Weşanxaneyê Doruk” vejîyayo. No ferheng 440 rîpel o.<sup>92</sup>
12. Ferhengê Tirkî-Dêrsîmkî (Kirmanckî/Dimilkî/Sobê), Huseyîn Çakmak (2004): No ferheng serra 2004 de “Weşanxaneyê Kalan” ra vejîyayo.<sup>93</sup>
13. **Ferhengê Îdyomanê Kurdkî** (Kirmanckî-Zazakî), Roşan Lezgîn (2005): No ferheng kirmanckî de mijarê îdyoman de ferhengo verên o. No ferheng serra 2005 de “Weşanxaneyê Vateyî” ra çap bîyo û heta nika reyna çap nêbîyo. Roşan Lezgîn vernîya ferhengî de metod û rêbazanê xo nişan dano. No ferheng 210 rîpel o.<sup>94</sup>
14. **Ferhengê Zazakî-Tirkî**, Musa Canpolat (2006): No ferheng 922 rîpel o û serra 2006 de çap bîyo. Hete hûmarê çekuyan ra ferhengêko zaf dewlemend o.<sup>95</sup>
15. **Ferhengê Tirkî-Zazakî**, Harun Turgut (2008): No ferheng serra 2008 e “Weşanxaneyê Do” ra vejîyayo. No ferheng 410 rîpel o.<sup>96</sup>
16. **Ferhengê Kirmanckî-Kurmanckî**; Kurmancî-Kirmanckî, Çeko Kocadağ (2010): No ferheng serra 2010 de “Weşanxaneyê Komkar” ra vejîyayo. No ferheng 1075 rîpel o û beyntarê ferhengê kirmanckî yê çapbîyayan de ferhengo tewr dewlemend o. Xusûsiyetê nê ferhengî kurmancî-kirmanckî amade bîyo.<sup>97</sup>

<sup>89</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Kirmanckî -Tirkî, İstanbul 2009

<sup>90</sup> Abdurrahman Uçaman, Seid Veroj, Ferheng-Vajname: Kurmancî-Hewramanî-Dimilî- Senendajî, War Yayınları, İstanbul 2002

<sup>91</sup> Seid Veroj, Ferheng: Kurmancî-Dimilî-Tirkî/Tirkî-Kurmancî-Dimilî, War Yayınları, İstanbul 2003

<sup>92</sup> Mehmet Aydar, Zazaca-Türkçe Sözlük, Doruk Yayıncılık, İstanbul 2003

<sup>93</sup> Hüseyin Çakmak, Türkçe-Dersimce (Kirmanckî/Dimilkî/Sobê) Sözlük, Kalan Yayınları, Ankara 2004

<sup>94</sup> Roşan Lezgîn, Ferhengê Îdyomanê Kurdkî (Kirmanckî/Zazakî), Vate Yayınevi, İstanbul 2005

<sup>95</sup> Musa Canpolat, Zazaca-Türkçe Sözlük, Can Matbaacılık, İstanbul 2006

<sup>96</sup> Harun Turgut, Türkçe-Zazaca Sözlük, Do Yayınları, İstanbul 2008

<sup>97</sup> Çeko Kocadağ, Kirmanckî (Zazakî)-Kurmancî, Kurmancî-Kirmanckî (Zazakî) Ferheng, Komkar Yayınevi, Berlin 2010

17. **Ferhengê Tirkî-Zazakî**, Alî Ekîcî (2010): No ferheng serra 2010 de “Weşanên Kardelen” ra vejîyayo û 233 rîpel o.<sup>98</sup>
18. **Ferhenga Pirzimanî**, Komîsyon (2011): No ferheng hete komîsyonêk ra amade bîyo. No komîsyon de Osman Aslanoglu, Hayrullah Acar, Zekî Gurur, Bedirhan Îslamoglu û Evren Aslanoglu estê. Nê komîsyonî manaya her çekuye fariskî, kurmancî, soranî û kirmanckî daya. No ferhengêko zafziwanî yo.<sup>99</sup>
19. **Ferheng/Sözlük Türkçe-Kirmanca/Kirmanckî-Tirkî**, Grûba Xebate ya Vateyî (2013): No ferheng zî goreyê standatî- zasyona Grûba Xebate ya Vateyî virazîyayo. No ferheng 518 rîpel o, “Weşanxaneyê Vateyî” ra vejîyayo. No ferheng sey ferhengê cêbî amade bîyo. Goreyê ferhenganê binan ê Grûbe Xebate ya Vateyî no ferheng hîna rehat o. Çünke vera di ferhengan yew ferheng kes wegêno û hem zî wegirewtena ci asan o.<sup>100</sup>
20. **Lîsteya Çekuyanê Tirkî-Zazakî û Zazakî-Tirkî**, Roşan Hayig- Brigitte Werner (2012): No ferheng serra 2012 de “Weşanxaneyê Tij” ra vejîyayo. Nê ferhengî de nêzdîyê 16000 çekuyî estê û no ferheng 448 rîpel o.<sup>101</sup>
21. **Türkçe-Kürtçe (Zazaca) Sözlük**, Ferheng Kurdî (Zazakî)-Tirkî, Roşan Lezgîn (2013): No ferheng serra 2013 de “Weşanxaneyê Roşna” ra vejîyayo. No ferheng de 9021 heb madeyê kirdkî-tirkî û 7632 heb madeyê tirkî-kirdkî estê û no ferheng 358 rîpel o.<sup>102</sup>
22. **Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî**, Ehmedê Dirihî (2013): No ferheng nameye nebatan ser o ferhengêko ansîklopedîk o. Serra 2013 de çapxaneyê “Weşanên Yaşayan Diller Enstiusu” ra vejîyayo. Ferheng 1168 rîpel o.<sup>103</sup>
23. **Fariskî-Zazakî-Kurmancî Gramero Muqayeseyin û Ferhengo Bingeyîn**, Serkan Oğur (2014): No ferheng serra 2014 de “Weşanxaneyê Yazilama” ra vejîyayo. Raste-rast kes nêşkeno nê kitabî sey ferhengî ya namekero labelê tede ferhengêko qijek esto û nuştox hîna zêde ser grameri xebityayo. No kitab 349 rîpel o.<sup>104</sup>
24. **Vatenên Verênandê Ma**, Zulfukar Ayyildiz (2013): No ferheng sey “Ferhengê Vateyê Verênan” amade bîyo û serra 2013 Riha de çapbîyo.<sup>105</sup>

<sup>98</sup> Ali Ekici, Türkçe-Zazaca Sözlük, Kardelen Yayıncılık, İstanbul 2010

<sup>99</sup> Komîsyon, Ferhenga Pirzimanî, Nûbihar, İstanbul 2011

<sup>100</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, Ferheng/Sözlük Türkçe-Kirmanca/Kirmanckî-Tirkî, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2013

<sup>101</sup> Roşan Hayig, Brigitte Werner, Zazaca-Türkçe/Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi, Tij Yayınevi, İstanbul 2012.

<sup>102</sup> Roşan Lezgîn, Türkçe-Kürtçe (Zazaca) Sözlük, Ferheng Kurdî (Zazakî)-Tirkî, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2013

<sup>103</sup> Ahmet Kasimoglu/Ehmedê Dirihî, Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü- Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013

<sup>104</sup> Serkan Oğur, Farsça-Zazaca-Kurmanca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük, Yazılama Yayınları, İstanbul 2014

<sup>105</sup> Zulfukar Ayyıldız, Vatenên Verênandê Ma-Zazaca Atasözleri ve Deyimler, Elif Matbaası, Şanlıurfa 2013

25. **Vajekano Dimilî**, Şaban Şenates: No ferheng hîna çap nêbîyo labelê goreyê melumato ke ma nuştoxî ra peyda kerd na serre mîyan de o yo çap bibo. No ferheng goreyê mintiqaya Sêwregi ameyê nuştene. Ferheng de 56000 çekuyî estê.

Ziwanê ma de ferhengnasîye vera *leksîlojî yan leksîgrafi* yena şuxulnayene. Tayê ziwanzanî, ferhengnasîye sey zanistîye qebûl kene labelê goreyê taye ziwanzanan ferhengnasîye sey zanistî nê ganî ke sey hunerî qebûl bibo. Goreyê na gruba diyîn ferhengnasîye tena çekuyan pê hete ardene îfade nêkena. Ferhengnasîye çekuyan pê-peya rêzkerdene ra zêde; ferheng amade kerdene, destûranê nuştene saz kerdene, qaydeyanê ziwani tesbît kerdene, nê qaydeyan aver berdene û nê qaydeyan ziwani nuşteki ser o tetbîq kerdene îfade keno.

Nuştox, şaîr, gramerzan ûsn çiqas merdime ke bi ziwani ya eleqedar bene hewceyo ke bi ferhengnasîye ya meşxul bibê û nê îlmî zaf baş bizanê. Çunke no îlim tena ferhengnasî eleqedar nêkeno û ferhengnas çaxo ke ferhengêk awan keno tena seba şexsê xo nêusenno. Tayê amacê ferhengnasîye estê ke kes eşkeno nînan bi no şekla bihumarno:

- ♣ Tesbîtkerdişê çekuyanê ziwani (yan ê demêk yan pêroyî)
- ♣ Çekuyanê ziwani rê wayîr vejîyayîş, dewlemendîya ziwani pawitiş
- ♣ Dewlemendîya ke eslê ziwani de esta aye rê wayîr vejîyayîş
- ♣ Dewlemendîya ziwani azê ayendeyan rê neqil kerdiş
- ♣ Ziwani tesîrê ziwanan ê xerîban ra muhafeze kerdiş
- ♣ Ziwani rast û bitesîr şuxulnayîşî rê ardim kerdiş
- ♣ Şuxulnayîşê ziwani de xetayê ke vatene ra çime gênê vernîya ci girewtiş
- ♣ Sewbîna ziwanan banderbîyayîşî de merdimî rê ardim kerdiş
- ♣ Tekîlîya ke mabênê ziwanan de esta orte vetiş
- ♣ Çekuyê ke cîya-cîya mintiqayan de estê orte vetiş



♣ Pirsgireyê ke perwerdeyê zîwanê maykî de estê çareser kerdiş<sup>106</sup>

Ferhengnas wexto ke qayîl bo ser ferhengî bixebityo ganî verê heme çî amacê xo dîyar bikero. Çünke cîya-cîya babetê ferhengan estê û ferhengnas, ferhengêko senîn awan bikero ganî verî ney tesbît bikero. Badê ney ganî ke ferhengnas sînoranê malzemeyê zîwanî xêz bikero û nînan ser o bixebityo. Çünke malzemeyê zîwanî zaf hîra yo. Ferhengnas kamcî malzemeyan kar bîyaro nînan tesbît keno û tena nînan ser o xebitêno. Gama ke ferhengnasî malzemeyê xo tesbît kerd ney ra dima çimeyanê malzemeyê tesbît keno û nê çimeyanê xo rêz keno.<sup>107</sup> Her çiqas seba zîwanê ma û xusûsen zî seba zarê ma kirmanckî çin bo zî ferhengnasîye kare komêk/grubêk o. Yanî komêna ke ferhengnasîyan ra amade bîya seba ferhengî yenî pêser kom benê û ferhengî ser o xebitênê. Labelê no zîwanê kurdî de ca nêameyo.

M.Malmîsanij lînguîstîk (zimanzanî) û metodê filolojî zaf baş zano o semed ra -ferheng hadre kerdo û ferheng hadrekerdişî rê beşdar bîyoziwanê kurdî de û xusûsen zarê kirmanckî de cayêko zaf muhîm gêno. Malmîsanijî heta nika hîrê heb ferhengî bi xo hadre kerdo û di heb ferhengan de zî ardimkarîye (rolêno zaf gird û muhîm) kerdo. Nê ferhengê ke M.Malmîsanijî hadre kerde; Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Ferhengê Kirdkî-Pelevkî-Kurmanckî, Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî yê. Labelê bê nê hîrê ferhengan Malmîsanijî Grûba Xebata ya Vateyî de amadebîyayîşê ferhengan de zî cayêno muhîm girewto.

Her çiqas ferheng de damxaya yew merdimi yan ê komîsyonekî bibo zî seba ke ferheng îlmî bo û dinyayê îlmî de ca bigîro ganî ke taye xusûsîyetan û peymeyê îlmîyan xo de nişan bido. Nê peymeyî:

- ♣ Rastîye: Çekuyê ke ferheng de nusîyayê ganî ke heyato rastîye de ewêze ci bibo. Yanî ferhengnas çekuyê ke heyatê cematkî de çin ê gereke nêgîro ferhengê xo.
- ♣ Cagirewtene: Çekuya ke ferheng de ca girewta ganî manaya xoya eslî ya ferheng de ca bigîro. Yanî manayê talî û mecazî ferheng de sey manaya eslî ca nêgîro.

<sup>106</sup> Halit Dursunoğlu, Cumhuriyet Döneminde Yapılan Sözlük Çalışmaları ve Türkçe Sözlükler Üzerine Bir Kaynakça Denemesi, Dumlupınar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Aralık 2011, h. 31, r. 255-271

<sup>107</sup> Halil İbrahim Usta, Türkçe Sözlük Hazırlamada Yöntem Sorunları, Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Dergisi 46, 1 (2006) 223-242



- ♣ Munasîbîye: Ferhengnas ganî goreyê amacê xo amacê ferhengî çekuye munasîbî weçîno û ferheng de nînan rê ca bido.
- ♣ Qaydeperestî: Ferhengnas ganî çekuyan rê qaydeyan tesbît bikero û goreyê nê qaydeyan çekuyan rêz kero. Labelê her ferhengnas goreyê xo nêşkeno qaydeyî tesbît bikero. O semed ra ganî ferhengnas dinyayê îlmî ra xeberdar bo û qaydeyanê ferhengnasî zaf baş bizano.
- ♣ Mahîyetê Şuxulnayîşî: Ferheng de çekuyî goreyê argoyî, fekan û mintiqayan ûsn mahîyetan pê ra abiryê.
- ♣ Çekuyê Newe û Kanî: Ferhengnas ferhengê xo de tena çekuyanê kanan rê nê ganî çekuyanê neweyan rê zî ca bido. Labelê hewceyo ke ferhengnas, heta ke îhtîyaç çin bo, çekuye nêvirazo. ♣ Çekuyê Mehelî: Ferheng de çekuyê meheli ganî cayêko qijek abiryo û nê çekuyê meheli cayênê qijek tepêşê.
- ♣ Tede-yî: Goreyê amancî heme çekuyê ke zivan de estê ganî ferheng de ca bigîrê.
- ♣ Çekuyê Umumî û Teknîkî: Çekuyê umumî û teknîkî ke kewtê zivanê umumî mîyan ganî ferhengî de ca bigîrê.
- ♣ Ziwano feki û nuşteki: Zafane ferhengnasî çimeyanê nuş- tekîyan ra sûd gênê û nê çekuyan ferhenga de ca danê, labelê çimeyanê fekiyan ra çeku girewtene û nê çekuyan de bedilîyayîşî nişan dayene zaf zehmet o.<sup>108</sup>

Nê peyme ke seba ferhengnasî tesbît bîyê seba her ferhengî hewce yê û her ferhengnas ganî nê peyman ferhengê xo de tetbîq bikero. M. Malmîsanij nê peyman ra xeberdar o û nê peyman heme ferhanganê xo de şuxulneno. Kes eşkeno vajo ke Malmîsanij hem ferhengê ke tena bi xo hadre kerdê û hem zî ferhengê ke hadre bîyayene de ardimkarîye kerdê înan de damxaya ci esta.

Ma nika taye xusûsiyetanê ferhanganê Malmîsanijî û prensîbê ferhengnasîye ey ser o vinderîyê:

<sup>108</sup> Ahmet Kahraman, Dilbilim, Sözlük ve Sözlükçülük, Kebikeç Dergisi, h.6, r. 111-113

♣ Malmîsanij eslê çekuyan edebîyatê kan mîyan de û şarî mîyan de gêreno. O qayîl nîyo ke çekuyanê viraştayan dekeroyê ferhengî mîyan û nê çekuyan şarî mîyan de vilakero. Destpêke ferhenganê xo de nê prensîbî îfade keno û ney ra qet şaş nêbeno.

♣ Mabênê sînoranê kirmancan de heme fekan ra xeberdar o û seba ferhengan tena fekê xo nêparêznenoyê. No prensîp seba kirmancî zaf muhîm o. Çünke eke yew fek biparêzîyo û sewbîna fekan ser o zaf nêvinderîyo raste-rast dewlemendîya kirmancî vindî bena. Labelê Malmîsanij ney sey prensîp qebûl keno û heme ferhangan de şuxulneno.

♣ Seba standart û îsleh bîyayene zarê kirmancî, bê kurdî, sewbîna ziwanan ra çekuye girewtene rê razî nîyo. Çünke eke ma sey sewbîna ziwanan, biasanîya çekuyan ê xerîban dekerê ziwane xo dima ma nînan nêşkenê ziwani ra çekerê. Labelê çekuyê ke mîyan de şarî de vilabîyê, goreyê ey, êdî bîyê malê şarî kes nînan eşkeno bigîro ferheng.

♣ Seba termanê gramerî û mijaranê xusûsîyan de çekuyê ke ziwananê ewropayijan ra ameyê girewtene, goreyê Malmîsanijî heta bi konsensusa çekuye nêvirazîyo, ganî ferheng ca nêgêro. Çünke eke ma no şekil hereket nêkerê her kes goreyê xo çekuye virazo, dima ma nêşkenê nê çekuyan ê viraştayan ziwani ra pak kerê. Seba kirmancî kes birehatîye eşkeno vajo ke hema-hema her xebatkar xo hete ra çekuye virazeno. Ge-ge di xebatkarî eynî çî rê sewbîna nameyî dano. Eke mabênê nînan de peymanêk çinbo her kes çekuya xo rast qebûl keno. Labelê heta ke konsensus virazîyo, çekuyê ke ziwananê ewropayijan ra ameyê girewtene kes eşkeno bişuxulno û badê konsensusî merdim biasanîya eşkeno zivan û ferhengan ra nê çekuyan vejo. No tewirê Malmîsanijî hasasîyetê ey mojneno. Sewbîna merdimî xo hete ra zaf çekuye virazenê labelê o no war de zaf hasas o.

♣ Goreyê Malmîsanijî zarê kirmancî ziwane kurdî ra şaxên a. Malmîsanijî ziwane fariskî û erebkî wendo. Reyna Malmîsanij soranî, kirmancî û hewramî (goreyê lehçeyanê bînan kêmi bo zî) zano. Fariskî ya kan, mîyanên û newe ra xeberdar o. Malbata ziwane Hîndewropayî ra xeberdar o. Qandê cû kirmancî xoser ziwane nê, sey zarêka kurdî qebûl keno. No qebûlê ey tena fikrî ra hêz gêno. Kes eşkeno vajo ke Malmîsanij na mesela de sîyasî zî nêfikirêno. Peym û qistasê ey tena îlim o. Malmîsanij delîlanê lehçe bîyayîşê kirmancî ano. Mîsal; ê ke zarê kirmancî sey ziwani ya qebûl

kenê herfa “ğ” ser o zaf vinderênên û vanê ke na herfe kirmanckî de esta. Malmîsanij tena herfa “ğ” nêşuxulnayîşî ser o zaf vinderdo û goreyê hesabê Malmîsanijî na herfe nuşteyê kirmanckî û kurdî qasê % 0,8 ca gêna. Malmîsanij heme karanê xo de nê hesasîyetî nîşan dano.

♣ Malmîsanij qayîlo ke zarê kirmanckî tesîrê sewbîna ziwanan û zaranê kurdî ra bivejîyo. Malmîsanij qayîlo ke zarê kirmanckî goreyê realîteyê xo û goreyê qaydeyanê gramerê xo awan bibo û bi no şekla cuya co dewam bikero. Çunke eke no şekla nêbo, tesîrê sewbîna ziwanan û zaran de biman kirmanckî do vindî bibo. Rast o ke zivan bi xo gandar o. No gandarbiyayîş yeno no mana ke, hem sewbîna ziwanan rê tesîr keno û hem zî tesîrê sewbîna ziwanan de maneno, xo timûtim bedilneno. Labelê no gandarbiyayîş ziwani tesîranasîmîlasyonî rê akerde nêkeno. O semed ra gereke ferhengnas nê krîterî bizano, qaydeyanê ziwane xo bizano û goreyê ney hereket bikero. Malmîsanij tam zî no şekla hereket keno. Qaydeyanê ziwane xo zano û gandarbiyayîşê ziwani ra hayîdar o.

♣ Çekuyê ke sewbîna ziwanan ra kewtê zarê ma û şar pêro manayê ci zano hewce yo ke ferheng de bimanê. Çunke êdî nê çekuyî biyê malê şarî û şar nê çekuyan şuxulneno. Heta şar nê çekuyan goreyê gramerê kirmanckî anceno û nînan sey kirmanckî qebûl keno. Ferhengnasîye ra amac ziwaneko saf kurdî vetene nîyo. Çekuyê ke mîyan de şarî de kar yenê êdî sey kurdî ya qebûl benê.

♣ Ferhengnasîya M. Malmîsanijî tena xebatêka ferdî û şexsî nîya. Malmîsanij eynî wext de sey Grûba Xebate ya Vateyî xebatêka kolektîf mîyan de zî ca girewto. Na grûbe heta nika 27 kombîyayîşî kerdê û 10 000 ra zêde çekuyî standart kerdê û di heb ferhengî vetê. Kes eş- keno vajo ke mîyanê ferhenganê kirmanckî de ferhengê tewr birû- met û qîymetî nê her di ferhengê grûbe yê. Çunke nê ferhengî tena goreyê yew merdim yan goreyê yew mintiqa nîyê. Heme mintiqayanê kirmanckî nêzdîyê 25 heb merdimî nê ferhengî rê kede daya û danê. Malmîsanij zî na grûbe mîyan de yo heta ronayoxanê grûbe ra yew o.

♣ M. Malmîsanijî ferhengê xo yê bi nameyê “Ferhengê Dimilkî- Tirkî” de vera herfa “î” herfa “i” û vera “i” zî herfa “ı” şuxulnaya. Heta no ferheng de seba herfa “eyn” a erebkî îşareta “ ’ ” şuxulyaya.

- ♣ M. Malmîsanijî ferhengê xo yê bi nameyê “Ferhengê Dimilkî- Tirkî” de tena çekuyî nê, îdyomî û çekuye diletî zî girewtê. Mîsal: “Umîdê xo birnayiş<sup>109</sup>, wayir vécayeni<sup>110</sup>, nayşta dayşta<sup>111</sup> rut û repal<sup>112</sup> ûsn.”
- ♣ M. Malmîsanijî ferhengê xo yê bi nameyê “Ferhengê Dimilkî- Tirkî” de seba çekuyê ke zaf manayê ci estê bi hûmarana manayê ci rêz kerdê labelê manayê çekuye ra ê ke nêzdîyê yewbînanê tena bi vîrgula abiryayê. Mîsal: “hurrîyet: 1) hürriyet, özgürlük 2) Türkiye’de Cumhuriyet Dönemi<sup>113</sup> ûsn.”
- ♣ Ferhengê M.Malmîsanijî her çiqas sey ferhengêko lokal û mehelfî biaso zî tena mintiqaya Malmîsanijî bingeh nêgêno. Çekuyê ke mintiqaya Pîran, Sêwregi, Çewlîg -û beno ke- Aldûş (ke Malmîsanijî Kolik de di serrî wezîfe kerdo o semed ra) de şuxulênê ferheng de ca gêne. No xusûsiyet seba yew ferhengî zaf muhîm o. Çünke nuştoxê bînî tena mintiqaya xo bingeh gêne û ferhenaganê xo bi no şekla awan kenê. No zî seba ferhengan kêmanîyêk peyda keno. Malmî- sanij ney rê dîqet keno. Çünke kirmanckî tena yew mintiqaya sînor kerdê nîya. Ferhengnas zî xo nêşkeno tena yew mintiqaya sînor bikero.
- ♣ M. Malmîsanijî ferhengê xo yê bi nameyê “Ferhengê Dimilkî- Tirkî” de nêrîyîye û makîyîye sîfet û nameyan de nîşan dayo.
- ♣ Malmîsanij ferhenganê xo de çekuyan goreyê amacê ferhengî weçînenno û mijarî têmîyan nêkeno. Îzahatanê xo dergûdila nê bi kilmîye vano. No xusûsiyet mojnenno ke Malmîsanij tena kirmanckî de nê tirkî de zî xeylêk serkewte yo. Mîsal: “Heqo: Tanırım! (dilek ve dua için)”<sup>114</sup> zaf izahato derg çin o labelê kes fam keno ke ney ra çîçî qesd bîyo.
- ♣ Ferhengê Malmîsanijî de çekuyî goreyê qaydeyêk rêz bîyê û no qayde de têmîyanîyêk çin a.

<sup>109</sup> M. Malmîsanijî, Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Weşanên Deng, İstanbul 1992, r.364

<sup>110</sup> Malmîsanij, çc, r. 381

<sup>111</sup> Malmîsanij, çc, r. 230

<sup>112</sup> Malmîsanij, çc, r. 304

<sup>113</sup> Malmîsanij, çc, r. 160

<sup>114</sup> Malmîsanij, çc, r. 145

- ♣ Ferhengê Malmîsanijî de çekuyê newe û kanî pîya ca gêne. Malmîsanij tena çekuyanê kanan nê, neweyan rê zî ca dano. Mîsal çekuya ke sey “kopez” zî girewto ferhengê xo.<sup>115</sup>
- ♣ Malmîsanijî ferhengê xo de çekuyanê meheliyan rê zî ca dayo. Ge-ge qertafê vernî û peynî yê kirmanckî goreyê mintiqayan bedilênê. Ge-ge zî taye çekuyî tena mintiqayêk de şuxulêna. Malmî- sanijî çekuyanê meheliyan rê ferheng de ca dayo. Mîsal: “kormît<sup>116</sup>, docik<sup>117</sup>, cisan<sup>118</sup>, perrayiş xwi ser<sup>119</sup> ûsn.”
- ♣ Ferhengê Malmîsanijî de taye çekuyê teknîkî ke kewtê ziwane şarî û şar nê çekuyan heyatê xo de şuxulneno estê. Mîsal “mat kerdiş<sup>120</sup>, bekçî<sup>121</sup>, beledîya<sup>122</sup>, xirami<sup>123</sup> ûsn”
- ♣ Ferhengnas raste-rast ganî çimeyanê fekî ra zêde çimeyanê nuştekiyan ra sûd bigîro. Labelê bêşûdîya Malmîsanijî na ya ke demê ey de çimeyê nuştekiyan tu çinbîyê yan zî çimeyê nuştekiyan ey bixo bîyê. Seba ferhengê xo hem ferhengnas hem zî malzeme/ çimeyê ferhengî bîyo.
- ♣ Ferhengê Malmîsanijî de çekuyê ke nusîyayê heyatê cematî de şuxulênê. Tay ferhengnasî çekuyanê abstraktan/absurtan ser o zaf kede danê û nê çekuyan ferheng de nusenê. Malmîsanij no şekil hereket nêkeno. Çekuyê ke cuya şarî de ca nêgênê ferhengê ey de zî ca nêgênê. No seba samîmîyet û rastîya ferhengî zaf muhîm o.
- ♣ Malmîsanij tena seba zarê kirmanckî nê, zarê kurmanckî de zî eserî dano. Heta ferhengê ey ke bi nameyê “ Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmanckî)-Tirkî” seba standartîzasyona nuştêna kurmanckî kitabêko bingeyîn o. Seba nê ferhengî zî metodê xoyê ferhengnasî şuxulnayo. Çaxo ke çekuyêk seba nê ferhengî weçînaya: Şeklo hîna vila/hera tercîh kerdo, şeklo ke deforme nêbîyo tercîh kerdo, şeklo ke hîna nêzdîyê lehçeyanê bînan tercîh kerdo, şeklo ke nêzdîyê ziwanan ê îranîyan tercîh kerdo û qaydeyê kurmanckî rê hîna munasîbê ci tercîh kerdo.”<sup>66</sup> Yanî Malmîsanij kurdî heme

---

<sup>115</sup> Malmîsanij, çc, r. 190

<sup>116</sup> Malmîsanij, çc, r. 190

<sup>117</sup> Malmîsanij, çc, r. 95

<sup>118</sup> Malmîsanij, çc, r. 59

<sup>119</sup> Malmîsanij, çc, r. 252

<sup>120</sup> Malmîsanij, çc, r. 209

<sup>121</sup> Malmîsanij, çc, r. 33

<sup>122</sup> Malmîsanij, çc, r. 33

<sup>123</sup> Malmîsanij, çc, r. 400

yew ehemîyet de vînenê û goreyê nê rastîye hereket keno. Tena ser kirmanckî cehd nêkeno. Goreyê ma prensîbo tewr muhîm ê Malmîsanijî heme xebatanê xo de eynî cîdîyet û samîmîyeta şuxulêno.

♣ Ferhengê Malmîsanijî bi nameyê “Ferhengekê Kirdkî-Pehlevî- Kurmanckî” ma rê fersendê muqayese kerdişê dana. Seke Malmîsanijî zî destpêkê ferhengî de îfade kerdo, merdim ancax bi muqayesekerdişê ziwanan û lehçeyana qîymetê ziwane xo zano û ziwane xo hîna baş û rind fam keno. No ferheng de eşkera vejîyêno meydan ke kirmanckî lehçeyêka kurdî ya. O semed ra no ferheng zî –goreyê ma- xebatêka erjîyayê ya.

Encam Derheqê ferhengî de “Efradini camî, exyarini manî” vajîyêno ke no îbare bi wateyê “çîyo ke hewce yo kom keno/gêno xo mîyan û çîyo ke hewce nîyo manî beno/nêgîno xo mîyan” yeno. Ferhengnas çaxo ke ferhengê xo amade keno nê îbareyî ra hereket keno. Çunke eke nê prensîpî kar nîyaro ferheng, ferhengîye ra vejîyêno. Ferhengnas çekuyan ferheng de goreyê manayî rêz keno û manayî çekuye ra azade nêvînenê. Kirmanckî de taye ferhengî estê ke mana û çekuye tam pê nêgênê. Qandê cû ferhengan de ganî ke cumleyan ra nimûneyî bideyê. Ferhengnas konteksê çekuyan nîşan bido.

Ferhengan de zafane etîmolojîyê çekuyan ser o melumatêk çin o. No war de zaf kêmanîyêk esta. Na kêmanîye rew-rew orte ra nêwerzena labelê ferhengnasî gerek ney ser o xebat bikerê. Çunke zafê çekuyanê ma rê ziwanzanê sewbîna ziwanan wayîr vejîyênê.

Ziwanî û çekuyê ke ziwanan de yenê şuxulnayene seba şarî sey çîyê- ko pîrozî ya qebûl benê. O semed ra merdimê ke ferheng ra û ferhengnasîye ra xebardar nîyê ganî ziwani rê û ferhengî rê mudaxele nêkerê. Çunke no mudaxele ziwane nuşteki û feki de tîmîyanîyêk virazeno. Merdimê ke tu ziwani ya yan ferhengî ya eleqeyê xo çin o, ziwani rê mudaxele kenê. Heta taye nuşttoxê kirmanckî xo sey qehremanê ziwani vînenê û heqê çekuye viraştene xo de vînenê. No halêno xelet o.

Kirmanckî de newe-newe kitabê zêdeyêno. Labelê kes bixemgînî- ya vînenê ke xebata ferhengî kirmanckî de zaf pey de menda. No hal waranê bînan –şîre, roman, hîkaye, xebata akademîk ûsn- de zî tênganîyêk peyda keno û vernîya standartîzasyonî û

edebîyatê nuşteki de manîyêk teşkîl keno. Rewşa yew ziwani rewşa ferhenganê ê ziwani ya girêdayeya. Eke merdim qayîlbo rewşa ziwaniêk vejo meydan tena ferhenganê ziwani ser o xebatêk bikero bes o. Rewşa kirmanckî baş nîya û heta ke xebatê îlmî û kolektîfî nêvirazîyê zî nê pirsgireyî çareser nebenê. Seba ney ganî ke enstîtuyî roneyê, xebata akademîk –tez, doktora ûsnvirazîyêno.

Ma na xebata xo de tena M. Malmîsanijî û ferhengnasîya ey ser o vinderdî. Ma tesbît kerd ke Malmîsanij seba ferhengnasîya kirmanckî rayîrêka baş û îlmî akerda. Prensîp û qaydeyê ke Malmîsanijî ronayê çimeyanê îlmîyan ra gêrîyayê, tetbîqkerdoxê û miqatkerdoxê nê qaydeyan o bi xo yo.

**Samuel A. Rhea**

## Kurterêziman û ferhengoka kurdî

Nivîsara Samuel A. Rhea *Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District* (Kurterêziman û ferhengoka zimanê kurdî yê devera Hekarî) yek ji berhemên pêşîn in ku li ser zimanê kurdî bi zimanekî ewropî, vê carê inglîzî, hatine nivîsîn. Nivîsar û ferhengok sala 1869 di *Journal of the American Oriental Society* (Kovara Civata Rojhilatî ya Amerîkayê) de hatiye weşandin.

Berhem ji 35 rûpelan pêk tê ku 17 jê li ser rêzimanê ne û 18 jê ji ferhengokê pêk tên.

Rhea ne zimannas lê qeşe bû. Armanca wî vekolîna kurdî bi mebesta wergerandina Pîroznameyê (Incîl û Tewratê) li zimanê kurdî bû. Nivîsar piştî mirina Rhea hatiye "sererastkirin" û weşandin.

Rhea hewl daye behsa rêzimana kurdî li gor birrên peyvên bike. Ew ji "rastnivîsînê" (ortography) dest pê dike lê di rastiyê de mebesta wî dengnasî ye, ne rastnivîsîn e. Paşî ew behsa pirtikan (articles), navdêran (nouns), cînavan (pronouns), hejmarnav (numerals), lêkeran (verbs), pêşdaçekan (prepositions) û girêdekan (conjunctions) dike. Beşa berfirehtirîn li ser sinifandin, çemandin û demandina (diyarkirina li gor deman) ya lêkeran e.

Li gor şertên dema xwe, Rhea çend agahiyên balkêş pêşkêş kirine. Lê nivîser ne şarezayekî zimannasiyê û bi taybetî jî ne pisporekî zimanê kurdî bûye. Ew hin şaşiyên herî bingeîn jî dike.

Bo nimûne, idia dike ku di kurdî de (mebesta wî kurmanciya Hekariyan e ya mijara vekolîna wî ye) cinsê rêzimanî peyda nabe. Ew herwiha di beşê cînavan de dibêje ku tenê cînavên yekem û duyem formên çemandî hene lê di rastiyê de hemû cînavên kesî yên kurmancî xwedî formên cuda yên çemandî û neçemandî ne.<sup>124</sup>

Ev berhem ji aliyê Rojan Hazim ve bi navê *Devokê Hekarîya* li kurdî jî hatiye wergerandin.<sup>125</sup> Çapa orijînal ya bi inglîzî dikare li vê derê were xwandin:

<https://archive.org/details/jstor-592123>

<sup>124</sup> Binêrin: Husein Muhammed *Cînav di kurdî de* di vê hejmarê de.

<sup>125</sup> <http://www.xweza.com/xani-bateyi.html>



## ZIMAN Û GRÛPÎ ÊTNÎKÎ

**Nûsînî: Profêsor Peter Trudgill**

*Wergêran le inglîsiyewe: Hesên Qazî*

Le Dewlete Yegirtûwekanî Emrîka taqî kirdineweyek kira ke têyda jimareyek xeîk ke wek dawer dewryan degêra dawayan lêkira giwê le dengî dû girûpî ciyawaz bigrin ke Leser kasête aste kirabû. Zor le dawerekan bişyaryan da ew axêweraney ke le Leser kasêti yekem dengyan aste kirawe Emrîkayî Efrîqayîn, u ewaney Leser kasêti dûwem dengyan aste kirawe sipî pêstin. Ew dawerane be tewawî hefe bûn.

Ewe kasêti yekem bû ke dengî axêweranî sipî bû, u ewî dûwemyan î reşan bû. Be tam dawerekan be şêweyekî zor çawrakêş hefe bûn. Ew axêweraney dawa le dawerekan kirabû gwê le dengyan bigrin xeîkî taybetî bûn: axêwere sipiyekan ew core kesane bûn ke hemû jiyani xoyan de nêw Emrîkayîye Efrîqayîyekananda jiyabûn, yan lew nawçane gewre bibûn ke nirxe kultûriyekanî reşpêstan zaî u bandeste; axêwere reşekan ew core kesane bûn ke le tafî gewre bûnî xoyanda pêwendiyekî zor kemyan le geî reşpêstekanî dî hebibû u zurbey jiyanyan lew core nawçane jiya bûn ke sipiyekan têyanda bandest bûn. Rastiyeke ewe bû ke axêwere sipiyekan dengyan wekû reşan debîsitra, u axêwere reşekan wekû sipiyekan – u ew daweraney gwêyan le kasêtekan girt bew şêweye bişyaryan da.

Ew taqîkirdineweye dû xafî ta radeyek girîng deselmênê. Yekem, ciyawazî heye le nêwan ew Inglîsiyey le layen zorêk le sipiyekan u zorêk le reşekan le dewlete Yegirtûwekanî Emrîka qisey pêdekirê bew şêweyey ke Emrîkayîyekan detuwanin le ser binemay şêwey qise kirdin be hêndêk diñiyayîyewe sebarete be em yan ew girûpî êtinîkî bişyar biden – bo nimûne ewe dekrê be pêyi axawtinêkî têlêfonî bê - ke deyslmênê 'axawtinî reşane' yan ' axawtinî sipiyane' ye u eme bo zor le Emrîkayîyan coreyek rastî komefayeti ye. Ew ezimûngeriye be rêgey taqîkirdineweyekî dîke ke le Detroit kirawe le dûy dirawe, u nîşanî dawe ke Detroitiyekanî ser be hemû temenan u hemû çîne komefayetiye (be paşxanî asayî lew taqîkirdineweyeda) teqrîben rêjeyekî heşta le sedî

serkewtînyan heye le nasînewey dengî axêweranî reşpêst le î sipîpêst tenê be çend deqîqeyek gwê girtin le kasêtekan.

Xaîf dûwem eweye, ke ew taqîkirdineweye ta radeyekî şiyawî selmandin nîşan deda, egerçî qalibî axawtinî reş yan sipî ke bîsteran karî le ser deken biwarî eweyan bo derexsênê zor car be dirustî dengekan binasnewe, beîam lêk kirdinewey ciyawazî be tewawî akamî akarî fêrbûne. Xelîk le ber ewey reş yan sipî em core yan corêkî dî qise naken .Ewey rûdeda eweye ke axêweran xesîete zimannasaneyekanî ew kesane werdegirn ke le pêwendiyekî nîzîk da le gefîyan dejîn. Endamanî dû girûpî êtinîkî Emrîkayî ke ême basyan Leser dekeyn ew şewezare zimaniye fêr debin ke be î wan denasrê her be tewawî be heman rêgey da ke diyalêktekanî çînî komefayetî fêr debin u le nimûne na asiyekekanda ke Emrîkayî sipî de nêw Emrîkayîye Efrîqayîyekanda dejîn, yan be pêçewane, ew ulgûyey miro werî degrê î ew girûpeye ke le nawçekeda bandeste.

Ke wabû, aşkraye ke ciyawaziy zimanî ew core hîç core binemayekî regezî yan derûnnasaney niye. Legeî eweşda ême amaje beme dekeyn, çunkû le rabirdû da be berbiîawî bawerêkî ewto hebû ke debê u lewaneye pêwendiyekî zatî hebê le nêwan ziman u ' regez' da. Bo nimûne, le mawey Sedey Nozdehemda zarawey be esîf zimannasaney Hîndu - Uŕûpayîş be manayekî serdagîrawî regezî daŕêjra. Zarawey Hîndu - Uŕûpayî bo ewe daŕêjra ew zimananey Uŕûpa, Rojeîatî Nêweŕast u Hîndûstan weber bigrê ke zimannasan dozîbûyannewe, ew core zimananey ke le barî mêjûyîyewe xizmayetîyan legeî yektrîda hebû. Le akamda, efsaneyek lemeŕ regezî xeyalî Hîndûŕûpayî yan Aryayî saz bû ke nek her be zimane daykûbabe Hîndûŕûpayîyekan qiseyan kirdûwe beîkû ejdadî regezî aîmanîyekan, Romanekan, Siîavekan, Yonaniyekan, Farsekan u ewanîtir bûn ke êsta be zimane Hîndu- Uŕûpayîyekan qise deken. Pêwîstî be bîr kirdineweyekî zor niye ke ew boçûne be aşkrayî be hefe dabindirê. Hemû însanêk detuwanê hemû zimanêkî însanî fêr bê, u ême be nimûney zor bebaşî be beîgewe selmêndiraw dezanîn ke gişt girûpe ênîkiyekan be dem têpeŕînî zemanewe zimanyan degoŕîn - miro tenê dekrê, bo nimûne bîr le jimareyekî gewre le xelîk be reçetek Efrîqayî bikatewe ke êsta bew zimanane qise deken ke reçetekyan Uŕûpayî ye. Boye, dekrê, be hîç cor desteberiyek nebê - de rastîda, u be asayî hîç wê naçê - ke girûpî xelîk le ber ewey be zimanî xizim qise deken le barî " regezîşewe xizim bin". ême natuwanîn biîeyn ke Aîmanîyekan u Bêngaliyekan le barî bedenî, regeziyewe xizimî yekin her le ber ewey ke ewan be zimananî xizimî Hîndûŕûpayî qise deken.

Legeî eweşda, bîr u boçûn sebareî be zimanan u regez be zehmet le nêw deçin. Bo nimûne, zimanî Aîmanî beşêkî girîng bû le têoriyekanî Naziyekan sebareî be ' regezî berz' y Jêrmenî; u fikrî hefe u

saxte sebarete be deretan u wîstî parastinî ' pakiyetî ziman ' (wate bergirî kirdin le zimanêk le beranber ' jarawî bûnî' be wuşey xuwarzawe le zimanekanî dîkewe) dekrê dest le destî fikirî pakiyetî regez da bişwa ke her ewende saxte u hefe ye. Renge kemtir sedeme lêder, befam zor şêlgîltir u pêdagirtir nimûney dananî ' Romaniyekan ' be xefkêkî ' Latînî' bê her le ber ewey ke ewan be zimanêkî Romî qise deken. Heftbet, ewe raste ke le ruwangey zimannasane, zimanî Romanî pêşweçûnî mêjûyî Latîn denwênê ( be têkefawiyekî berçaw legef zimananî Siławî u zimanekanî dîke), befam herwa be sanayî ewey be dû da naye ke Romaniyekan sed le sed le barî jênêtîkiyewe tormey Romanekanin. Herçonêk bê, zor ziyatir lewaneye ke le barî jênêtîkiyewe xizmayetî nizîkyan hebê legef dirawsêye Okraynî, Siřbî, Bułgarî u Mecaristanîyekan, ke be sedan legef ewan têkefawiyen hebûwe, her wek legef êspanyayîyekan u Purtugaliyekan.

Legef eweşda, ewe raste, ke le zor nimûnanda ziman dekrê ber'odeyiyekî girîng u tenanet serekî bê bo endametî le girûpêkî êtnîkî da. Ewe rastiyekef komefayetî u kultûrî ye, bawekû eweş, girîng e miro belayewe aşkra u rûn bê ke basî çî pêvajoyek le goře daye. Le hêndêk nimûnanda, bo wêne, u betaybetî eger bas le ser zimanan u nek şêwezarekanî zimanêk bê, xesfetekani zimannasane lewane ye pêwerî her girîngî diyarîker bin bo endametî le girûpî êtnîkî da. Bo nimûne, kemtir be cê u raste bigutrê ke Yonaniyekan be Yonanî qise deken ta ewey bibêjrê ke ew xefkey axêwerî bûmî zimanî Yonanîn ( wate zimanî Yonanî zimanî daykiyane) begîştî be Yonanî dadendirên (be lanî kemewe le layen Yonaniyekanî dîkewe) ca netewayetî rasteqîne u resmî ewan herçiyekî debê bişa bibê. Le nimûney dîke da, le piratîk da katêk bas leser şêwezare corbecorekanî 'eynî ziman dekrê, pêwendî nêwan ziman u girûpî êtnîkî lewaneye girêdirawiyekî 'adetî sade bê, ke be perjîne komefayetiyekef nêwan girûpekan hêzî weber nirabê, ke têyanda ziman xesfetekî girîngî xo nasînewe ye. Gişt Emrîkayîye Reşpêstekan be hêçcor be şêwe zimanî Inglîsiy Emrîkayî Efrîqayî qise naken ( bo rûnkirdinewey ziyatir sebarete bem zaraweye bişwane xuwarewe), befam zorbey here zorî ew kesaney qisey pêdeken Reşpêstin, u dekrê awa be nêw bikrên tenê beşgey şêwey axawtîyanewe. Ke wabê, ciyawazî girûpî êtnîkî le komefgeyekî têkefaw da şêweyekî taybetî ye le ciyawazî komefayetî u wek eme, zor car ciyawazî zimanî lêdekewêtewe ke be wiyewe girêdirawe.

Nimûnekanî corî yekem, ke têyanda ziman xesfetekî diyarîkere bo endametî le girûpî êtnîkî da, le astî cîhanî da zor bawin. bo nimûne, barudoxî ew core le Efrîqay fire zimanda zor asayîn. Tenê le komefgeyekî derewey Akra le Gana axêweranî bûmî ziyatir le heşta zimanî ciyawaz hen, lewane zimane serekiyekanî wekû Twi, Hausa, Ewe u Kru. Le zor nimûnanda, takuterayan xowyan ser be

girûpêkî taybetî êtnîkî yan 'eşîretêkewe denasênin ke Leser binemay ewan ew hemû zimanane zimanî daykiyane (gerçî zorbey danîştuwan dûzimane yan sê zimanen). Boye girûpe êtnîkiye ciyawazekan be rêgey zimanewe u nek şitêkî dî cwê bûnî xoyan u nasêney xoyan deparêzin. Heşbet ewe tenê diyardeyekî Efrîqayî niye. Dû girûpî êtnîkî serekî be reçeçek Uşûpayî le Kanada, bo nimûne, be şewey serekî tenê be rêgey zimanewe le yektrî dekrênewe. Ewe raste, ke le zor rûwewe, ewan ciyawazî dînî, mêjûy ciyawaz, kultûrî ciyawaz u dab u şwênî ciyawazîşyan heye, befam xesletî here girîngî diyarîkeryan ewe ye gelo ewan axêwerî bûmî Inglîsî yan Feřanseynî.

Le nimûney corî dûyemda -u emane le zor rûwewe çawrakêşin - nasêney cwêy girûpe êtnîkiyekan, nek be rêgey zimanî ciyawazewe, belkû be rêgey şewezarî ciyawazî 'eynî zimanewe, xoy derdexa. Ew core ciyawaziyane dekrê rîşeyan le heman core mîkanîzimane da bê yan belanî kemewe be zîndûyî rabigîrên ke bo hêştinewe u parastinî diyalêkte komelayetî - çîneyetiyekan le goşê dan: ême detuwanîn way dabinêyn ke ciyawazî girûpî êtnîkî wekû berhetstêk decûlêtewe le ser rêy pêwendî nîşanekanî zimanî her be heman şewey berhetstekanî dîkey komelayetî. Leweş ziyatir, le nimûney girûpe êtnîkiyekan, hokare ruwanîniyekan wêdeçê girîngiyekî berçawyan hebê. Takuterayan zor ziyatir wêdeçê wuşyariyan sebarew rastiyê hebê ke ewan ' Cûleke' n yan xoyan be ' reş' dabinên ta ewey ke pê lewe binên ke ewan ba bişeyin ser be " çînî xuwarewey mamnêwincî ' n. Ewe manay waye ke endametî girûpî êtnîkî yan nasêne dekrê rastiyekî girîngî komelayetî bê bo ewan. Leweş ziyatir, dekrê ciyawazî zimanî çî wuşyarane yan nawuşyarane ferqî pêbikrê, wekû xesletêkî ew core girûpane, ew core ciyawaziyane dekrê dirêjxayen u berdewam bin.

Debê amaje beweş bikrê her wek zimanan sazdirawî komelayetîn (bişwane bendî 1 u 7 y em kitêbe), girûpe êtnîkiyekanîş be rêje pêk hatey legořanhatûn u sinûrekanyan dekrê bigořdirên u le rewî mêjû da dekrê hebin u/yan bizir bibn. Nimûneyekî çawrakêş u le hemankatda tafî eme Yugosalavia ye. Le nêwan safanî 1918 u 1990 kanda Yugoslavia dewlet – neteweyekî fire êtnîkî, fire zimanî bû. Egerçî le Bakûrî Rojeletî ewê axêweranî zorî Mearstanî u le Başûrî Rojawa axêweranî Albanî, her weha zor girûpî kemayetî zimanî dîke hebûn, zorbey wişateke be zincîreyekî (bişwane bendî 1) lehceyî cugrafiyayî diyalêktekanî Slaviy Başûrî dapoşrabû ( ke lehcekanî Bulgarî Bulgaristan u nawçe dirawsêyekanî weber degirê). Hemû layek le ser ewe rêk bûn ke lehcekanî Slovenia le beşî Bakûrî Rojaway ew zincîreye da dekewtine jêr çetirî zimanî standardî Sloveniayî u le safî 1945 bemlayewe, heşwêstî resmî ewe bû ke lehcekanî Meqdûniyeyî Yugoslavia, le Başûr, lehcegelî standardî Meqdûniyeyî bûn. Legeş eweşda, le nêwendî wişatekeda - Kroatia, Motenegro, Bosnia- Hersegovina

u Srbiaa - barudoxeke ta radeyek zor aloz u pêçepêçtir bû. Hehwêstî resmî ewe bû ke zimanî ew herêmane Srbo-Kroatî ye.

Ba wekû emeşe, her wek nêweke defê, sirbo-Kroat dû şêwey ta radeyek ciyawazî hebû: Srbi, ke zorbe be elfubêtkey Sîrîlî denûsrê (ke her weha bo nûsînî Bulgari, meqdûniyeyî, Okraynî u Rûsîş dekar dekirdirê), u ta radeyek le ser binemay lehcekanî beşî Rojeletî Nêweřastî Yugoslavia heñirawe ( lêre da emin hêndêk qiseke sade dekemewe)‘ u Kroati, ke be elfubêtkey Latîn denûsrê, u ziyatir le ser binemay lehce Rojawayîyekan dandirawe. Le serubendî cor be cor le mêjû da, u le layen xelkî ciyawazewe be şêwey cor be cor, Srbi u Kroati be pêy îdeolojî baw u barudoxî siyasî be zimanêkî taqane be dû normî ciyawazewe, yan be dû zimanî ciyawaz dandirawin (egerçî her dük la betewawî dûlayene le yekitrî têdegen). Zimanî Kroati debestirawe be girûpî êtinîkî Kroat, ke le herêmekanî Rojawa bandest bûn u ler rûy dîniyewe le konewe Mesîhî Roman Katolîk bûn, u zimanî Srbi debestirayewe be girûpî êtinîkî Srb, ke le herêmekanî Rojelet bandest bûn u le rûy dîniyewe le konewe Mesîhî Ortodoks bûn. Boye ew kroataney ke xelkî bûmî Kroatia bûn pişkêkyan hebû: ewan deyantuwanî biñen ewan axêwerî bûmî sirbo-kroatî yan Kroati n. Le layekî dîkewe, ew Srbiyaney le Kroatia gewre bibûn u be tewawî wekû kroatekan qiseyan dekird layan pesendtir bû biñen be zimanî Sirb-kroatî qise deken. Heman şit be pêçewane bo ew Srb u Kroatane bû ke le Srbia dejyan.

Le Bosnia, beşî nêwendî Yugoslavia, hefkewteke tenanet zor aloz u pêçepêçtir bû. Ew lehcaney lew beşey nêwendî zincîrey lehceyî qiseyan pêdekrê aqeyekî pêwendîn le nêwan lehcekanî Kroatia u Srbia da ca boye çî hoyekî taybetî nebû bigutrê ke ew lehcaney lehcey Kroati yan lehcey Srbi n. Ba bo wêne biñen, danîştûwanî Saracevo, pêtextî Bosnia, renga lewane bû biñen ewan be Kroati qise deken eger Kroat bayen u eger nasêneyekî êtinîkî Kroat bo ewan girîng bûbaye‘ her awaş, hêndêk Srbi xelkî Saracevo lewane bû biñen ewan be Srbi qise deken. Bawekû emeş, le rastîda, ew lehcaney ewan qiseyan pêdekird be tewawî wekû yek wabûn, ca boye bo ewan nêwî têkhefkêşrawî Srbo – Kroat le rastîda manay zortir bû. Be kar hênanî zarawey Srbo-Kroat wêdeçû bo girûpêkî serekî dîkey êtinîkî le Bosnia – musulmanekan – zor nasiktir bê, ke le ber ewey ne Srb bûn u ne Kroat hiç hoyekyan nebû ke nêwlênanêkî zimaniyan le yekî dîke beñawe pesindtir bê. Zarawey Srbo-Kroat belay jimareyekî zor le betaybetî Yugoslawi şarnîşînîş ke le barî êtinîkî daykûbabiyewe têkeñaw bûn hestyan bewe dekird ke nasêney neteweyî ewan wek Yugoslawan debê be hênd bigirê ta ewey ke xoyan be nasêneyekî taybetî êtinîkiyewe girê biden.

Le berayîyekanî 1990 kanewe, be le ber yek helweşanî Yugoslawia, ew barudoxe, wek hemû layek baş lêy agadarin, goşawe. Hukûmet le Zagreb netewey serbexoy Kroatia be zimane neteweyekey defê Kroati, u be tundî layengirî bekarhênanî elfubêtkey Latîne. Le layekî dîkewe, hukûmetî Srbia le Belgrade, be zimane neteweyekey defê Srbi, u be tundî layengirî le bekarhênanî elfubêtkey Sîrîlî deka. Lemeş ziyatir, le her dûk nimûnanda, hukûmetekan hewîyan dawê hengawî ewto helhênewe ke hêndêk le berhelstkaranyan ta radeyek beheq nêwyan nawe ' paktawî wuşeyî' – hawterîbî nimûney dihtawînî paktawî êtnîkî (kuştin yan be tobzî derpeşandin u ragwêstinî girûpêkî êtnîkî be destî girûpêkî dî) ke le şwênî cor be corî Yugoslaviay pêşû da qewmawin. Bo ewey pêdagirî bikrê le ser serbexoyî (bişwane bendî 1) zimanî Kroati le beranber zimanî Srbi da, u yan be pêçewane, ew wuşaney ke wa dadendirê ziyatir taybetîtir bin be şêwezarekey dîke fit dekrên u le rojname, kitêbî medresan u cêyî dîke pak dekrênewe u bizir debin. Her dûk hukûmetekan her weha hewî deden bo welananî ew wuşaney ke reçetekî Tirkiyan heye le zimanekanyanda, le katêkda hukûmetî Bosnia layengirî lew core wuşane deka u deyanparêzê.

Ca eger îdî, çi zimanêk be nêwî Srbo-Kroat le ara da nemawe, ey bihêy musulmanekanî Bosnia ew zimaney pêy dedwên u pêy denûsn be çi dabinên? aşkira ye ke ewan nayanewê le nêwan şeqfî ' Srbi' u ' Kroati' yekyan helbijêrin. Ca boye be hîç cor nabê be seyr dabindirê ke balwêzî Bosnia le Dewlete Yekgirtûwekanî Emrîka êsta daway kirdûwe ke debê wekû Bosnî amaje be zimanî hukûmetekey bikrê. Her wek ême le bendî 1 da bînîman, u dîsan le bendî 7-î em kitêbe da deybînîn, ewey ke daxuda şêwezarekî zimanî zimanêke yan na be hîç cor be tewawî meseleyekî zimannasane niye. Katêk babetî lew core pêwendî be babetî êtnîsîti peyda dekenewe le rastîda ewan detuwanin zor ahoz u pêçepêçyan lê bê: zimanêk bewe kotayî dê ke bibê be sê ziman.

Ême her êsta cexitman le ser ewe kirdewe ke hukûmetekanî nwê le Yugoslaviay pêşû be anqeste hewî deden pêdabigrin le ser cwêbûnî neteweyetî u êtnîstey xoyan be paşpîştî ciyawaziy wuşey qamûsî. Legeş eweş, le nimûney dîkeda, ciyawazî girûpî êtnîkî lewaneye zor be şêweyekî xoşkîtir pêwendî hebê be ciyawazî dengnasî u rêzimaniyewe. Bo nimûne yekêk lew rastiye çawrakêşaney le lêkofinewey Labov le New York derkewt ewe bû ke ciyawaziyekî kem befam be ruwalet girîng heye le telefoz kirdinî zimanî Inglîsî da le nêwan axêweranî ke paşxanî Cûleke u ewaney paşxanî Italiyayyan heye. Ew ciyawaziyane le rûy hejmariyewen ta ewey ke nîşaney bawerîpêkiraw u tewaw dabişawî ciyawaziyekanî girûpî êtnîkî bin, befam ewan be rûnî le ber ew rastiyan ke girûpe êtnîkiye ciyawazaekan meylyan berew eweye ke le nêw şarekeda komeşgey cwêy xoyan damezrênin. Le



binawanda ew ciyawaziyane wa wêdeçê le ber, befanî kemewe ta radeyek, berdewambûnî kartêkerî ewey bin ke zor car be şêwezarekanî substratum nêw zed dekirên - wate ew zimananey yan şêwezaraney ke le layen ew girûpanewe yan ejdadiyanewe qîseyan pêkirawe ber lewey ke bibin be axêwerî Inglîsî şarî New York – wate Yiddîş u Italiyayî. Têkel bûn u têwehatinî zimanî kon bo nêw zimanî taze (ba bişeyî 'rawêjêkî Yiddîş' bo nêw İnglîsî) [ lem wergêraneda "řawêj" le birî "aççent" dekar kirawe, wergêř ] le wecî yekemda wêdeçê geystibête bekarhênanî nastandardî nîşanekanî zimanêkî bêgane le layen wecî dûyemewe. Bo nimûne, yekêk le xestetekanî Inglîsiy New York, her wek le bendî pêşû da bînîman (lapeřey 38), pêşxistinî deřbirînî wavêlî nêw wuřey beard bûwe le wuřey corî bad u bag da. Wa wêdeçê ew pêşxistine le ber wîstî wecî dûyemî Italiyayeykan xêratir kirabê, renege nawşiyaraneş bo ewey be rawêjêkî Italiyayî be Inglîsî qise neken. Axêweranî bûmî zimanî Italiyayî wavêlêkî corî [a ] zor kirawetir le denge İnglîsiyeke, lew wuře İnglîsiyaneda ke ew dengeyan têdaye, bekar dehênin, u mindalekanyan, bo xo parastin lew telefuz kirdine, lewaneye şêwey here dirêjî ew wavêleyan wergirtibê ke le ber destyan da bûwe. Be diñiyayiyewe êsta Italiyayeykan meylêkî ziyatir nîşan deden bo bekarhênanî wavêlêkî dirêjtir le berawird kirdin leget xeřkî Cûlekey.

New York da, u duwacar ewe detuwanê bigate barudoxêk ke wavêlî dirêj le wuřey wek bad u bag da bibê be nîşaneyekî nasînewey ew New Yorkiyaney ke paşxanî Italiyayiyane heye. Le layekî dîkewe, axêweranî Cûleke le wuřey corî off u lost u dog da wavêlêkî dirêjtir le Italiyayeykan bekar dehênin u ulgûyekî her awa nastandard detuwanê berpîrsî eme bê: zor le axêweranî bûmîy dîş ke zimanî İnglîsî wek zimanêkî bêgane fêrbûn ferq be ciyawazî dengî /o/ le wuřey çoffee u wuřey çup/à/ da naken, lewaneye çoffee çup biken be / kOfi kOp /. Ca lewaneye wecî dûwemî axêweran ciyawaziyekeyan le nêwan dû wavêlekanda gewretir kirdibêtewe, bo ewey cext le ser ew rastiye bikenewe ke ewan ewane lêk dekenewe, u akamî ewe bûwe ke le wuřey wekû çoffee, dog da wavêlekan dirêjin. Ew wavêle dirêjane akamî guşarî ew core nîn, çunkû dirêj derbiřînî wavêl tenê be axêweranî Cûlekewe nawestê, beřkû dekrê le ber kartêkey substratum le layen ew girûpe êtnîkiyewe pêş xira bê.

Heman corî kartêkerî substratum dekrê le İnglîsiy Şçoatlandî da bibîndirê. Zorbey skatekanî êsta lem rojgare da be sadeyî xoyan be ' Şçotlandi' dadenên, beřam le rûy mêjûyiyewe ewan toremey dû girûpî cwêy êtnîkîn. Bo ewey hêndêk şitekan sade bikeynewe, detuwanîn bişeyn skatekanî berzayiyane Highland Şçots, ke babubapîranyan be reçeřek le Irlendewe hatûn, le Gaelekan bûn u be zimanî Sêltîkî Gaelîk qîseyan kirdûwe ( ke êstaş zor lewan qîsey pêdeken le Rojaway Highlands u le

duŕgekanî Hebrides ), le katêkda skatekanî Deştayiyen Lowland wek gelî Inglîsî, be reçetek Jêrmenî u Anglo Saxson bûn. Êsta ke le Şotland teqrîben le layen hemû kesewe be zimanî Inglîsî qise dekirdirê, ew ciyawaziye lew core Inglîsiyey ke miro le beşe ciyawazekanî wulateke da deybîstê mawetewe. Skate Deştayiyekan yan be yekêk le lehce xocêyîekanî Şcotekan qise deken ( bo zanyarî ziyatir le ser eme biŕuwane bendî 7-î em kitêbe), yan be standardî Inglîsiy Skatlendî be rawêjêkî xocêyiyewe (yan şitêk le nêw herdûkiyanda). Le layekî dîkewe, Beriznişînekan Highlandres yan be standardî Inglîsiy Skatlendî qise deken (ke em girûpe be têkiŕa ewe wekû zimanêkî bêgane fêr bûwe) yan be şeweyek ke hênde lewe dûr niye - herçunêk bê, nek hênde dûr lewewe wekû lehcekanî Deştayiyen. Bo nimûne Beriznişînekan be asayî naŕên I dinina ken, wek ewey ke Deştayiyekan lewaneye bîfên, befkû defên I don't know. Legeŕ eweş, zor car ta radeyek kartêkerî sabsiratum le zimanî Gaeylîkewe lew Inglîsiyey ke Berznişînan qisey pêdeken hest pêdekrê u bewe ra miro dezanê xeŕkî Highlands n. Heŕbet, axêweranî bûmî zimanî Gaeylîk le Inglîsî da zorcar rawêjî Gaeylîkî yan heye, beŕam miro detuwanê ciyawaziyekanî wuşeyî u rêzimanîş tenanet le axawtinî ew Berznişînaneşda be dî bika ke le jiyanyanda qetyan be zimanî Gaeylîkî qise nekirdûwe. Nimûnekanî em core ciyawaziyane wek emaney xwarewen:

standardî Inglîsiy Skatlendî

Inglîsî Rojaway Highland

Bring that whisky here.

Take that whisky here.

I can see you!

I'm seeing you!

I don't want that.

It's not that that I'm wanting.

Le dinyay Inglîsiy zimanda be giştî, yekêk le nimûne here çawŕakêşekanî ciyawazî zimanî girûpî êtnîkî - ke têtîda dewrî ferzî coreyek le kartêkerî sabstratum babetêkî qisehelgir u cêyî munaqeşeye - ciyawazî nêwan axawtinî Emrîkayiye Reş u Sipiyekane ke pêştir hêdêkman amaje pêkird. Ew ciyawaziyane be hîç cor le axawtinî hemû Emrîkayiyekanda dernakewin, beŕam ewan ewende biŕaw bûnetewe bo ewey sirincyan bidrêtî u be girîng dabindirên. Zor le mêje ewe selmawe ke ew Emrîkayiyaney be reçetek xeŕkî şêwe Sehray Efrîqan be Inglîsiyekî cwê le Sipiyekan qise deken. Geştwerêkî Brîtanîayî ke le safî 1746 da sebarete be kolonîstekanî (muhacîr nişînekan) Emrîkayî nûsîwe defê: "Şitêk ke ewan zorî heŕe têda deken, sebarete be mindalekanyan.... ewe ye katêk ewan cuwanin lêyan degeŕên le geŕ cuwanî Reş da hestin u danîşin u emeş xemsarane debête hoy ewey xûy wan bigrin u be zimane şeq u şîrekey ewan qise biken." Lêre da, ciyawazî nek her cext kirawetewe befkû berawerdîş kirawe be şeweyek ke lem rojgare da bo ême be tewawî hejênera: ew



Inglîsiyey wa xelkî Reş qiseyan pêkirdûwe, her wek em qisegêranewey serewe derîdexa, be nizam dandirawe.

Em têruwanîne pîse tenanet emroş nakrê be tewawî çawî lê helbibuwêdirê çunkû kartêkerî hebûwe lesar mêjûy lêkofînewe le Inglîsiy Reşî Emrîkayî. Şwên têkirdinî ew têruwanîne regezperistaneyey berayî bem şêweyey xuwarewe her mawetewe: le ber ewey ciyawazî le axawtinî Reşane da be resmî wekû nîşaneyekî nizam bûn dandirawe, de rastîda dijware pêy lêbindirê ke şêwe axawtinî Reşane ciyawaze be bê em têruwanîneş ke wêdeçê regezperestane bê. Bawekû emeş, duwacar ew boçûne wekû kardaneweyekî bûnî ciyawazî girûpî êtnîkî didanî pêda hat, ke diyare eweş her heleye, wate ciyawazî le nêwan lehce komefayetiyeke be ser dagîrawî be watay berzîtir bûnî şêwezarek le şêwezarekî dî bizandirê. Eger Sipiyekan u Reşekan be ciyawaz qise deken, ewe be sadeyî manay eweye ke ewan be şêwezarekî zimanî girûpî êtnîkî ciyawaz qise deken (ke le ruwangey zimannasanewe nirxan yeksane). Boye, lem rojgare da zimannasan le ser ewe rêkin ke le nêwan axawtinî Reş u axawtinî Sipî da ciyawazî heye, u le ber ewey ke le ruwangey zimannasanewe hîç rêgeyek niye ke pêy da şêwezarek le ewîdî be berzîtir dabindirê, îdî ewe regezperestane niye ke awa bigutirê. Êsta be xoşiyewe keşuheway siyasî u komefayetî awaye ke dekrê babetî zimannasane be berbiawî lêy bikoşdirêtewe u qisey lêwe bikrê, egerçî hêştas hêndêk nazimannas hen ke dijî lêkofînewey ciyawaziye zimaniyeke girûpî êtnîkî le komefey Emrîka da.

De rastîda, le mawey çendîn safî rabirdû da ewende enbarî çawrakêşî zanyarî dozrawnetewe ke lêkofînewe le şêwe zimanî Inglîsiy Emrîkayî Efrîqayî (AAVE) êsta yek le biware here serekiyekane u sirincî zor zimannasanî berew lay xoy rakêşawe. Zarawey şêwezimanî Inglîsiy Emrîkayî Efrîqayî AAVE be giştî bo amaje bew Inglîsiye nastandardey ke le layen çînî xuwarewey Emrîkayîye Efrîqayîyeke qisey pê dekirê bekardehêndirê. Zarawey Inglîsiy Reş Black English, ke car car AAVE ş her bew nêwe heldekirê, ew kemayesî u xewşey hebû wek bihêy ke gişt Reşekan her bew şêwezarey Inglîsî qise deken - ke diyare waniye. Le layekî dîkewe bekarhênanî zarawey 'Vernaçular' (şêwe ziman) ew Reşaney ke be standardî Inglîsiy Emrîkayî qise naken u ewaney qisey pêdeken le yekitrî dekatewe.

Legeş eweş, miştumiş û wuşebeyekdadan hêştas her le goşêdaye \_ u ewane miştumişî zor çawrakêşîşin, egerçî be xoşiyewe, zorbey ewe be yekda helşaxane êsta be tewawî miştumişî akadêmî u zanayanen. Yekêk le dimeteqe here çawrakêşekan le ser ew rastiyeke ke le katêkda milî bo radekêşrê ke be girdibî ciyawazî le nêwan AAVE u şêwezarekanî dî da heye, natebayî u rêkineketin lesar rîşey ew ciyawaziyaneye.

Dû boçûnî serekî le ser em babete dekirê bem şêweyey xwarewe binasêndirên. Boçûnî yekem defê ke zorbey nîşanekanî AAVE le ruwangey mêjûyiyewe rîşeyan le lehce înglîsiyekanî duŕgekanî birîtaniyayiyewe Britîş Isles aw dexonewe. AAVE le ber ew cudawaziyaney ke le mawey sêsed safî rabirdû u ewane da qewimawin ciyawazî le geŕ şêwezare sipiyekan peyda kirdûwe. Nîşane ciyawazekanî Duŕge Birîtaniyayekan le lehce Sipiyekan u le lehce reşekanda bizir bûn u parêzrawin, u her weha dahênanî serbexoy ciyawazîş rûyandawe. Pêşweçûnî serbexo le ber radey kemî têkeŕawî u pêwendî komeŕayetî le nêwan Reşan u Sipiyayekan le zorêk le beşekanî Dewŕete yekgirtûwekanî Emrîka hasantir bûwetewe. Wuşyariy lemeŕ ciyawaziyekan her weha le ber ewey ke jimareyekî zor le xeŕkî Reş le Başûrewê berew şarekanî bakûrî Dewŕete Yekgirtûwekanî Emrîka çûn be duway heŕweşanewey sîstêmî koyledarî da, ewendey dîkeş ziyatir bûwe, ca boye ew ciyawaziyane ke le seretawe ciyawazî cugrafiyayî bûn, le Bakûr, bûn be ciyawazî girûpî êtnîkîş.

Boçûnî dûwem bo reçetekî AAVE çaw le Duŕgekanî Birîtaniyayî na beŕkû le Efrîqa xoy deka. Layengiranî ew boçûne defên ewe be zeq u aşkrayî diyare ke aba u ejdadî Emrîkayiyey Efrîqayiyekanî modêrn le Efrîqawe hatûn u her ewendeş aşkraye ke ewan axêwerî (zorbe) bûmî zimanekanî Rojaway Efrîqa bûn. Heŕbet, her boyeşe jimareyekî zor wuşey be reçetek Rojaway Efrîqayî rêgeyan derkirdûwe bo nêw İnglîsiy Emrîkayî Başûrî, u le rastîda le zor nimûnanda bo nêw İnglîsiy cîhanî giştîş. Ew wuşe qamûsiyaney ke le zimane Efrîqayiyekanewe hatûnete nêw İnglîsiy Emrîkayî birîtîn le voodoo, pinto wate ' tabût ' u, , goober be manay 'badamî zewînî'. Wuşey seyr u heta biŕêy berbiŕawî OK îş be lêbiŕawî wuşeyekî Efrîqayî Rojawayî ye, u her weha zor wuşey dîkey ke pêwendî peyda dekenewe be kultûrî Emrîkayî Efrîqayî wekû cazz, cuke, gig u hep ( ewe cêyî sirince le meŕ piley Emrîkayiyey

Efrîqayiyekan le ruwangey mêjûyiyewe ke ew core wuşane zor car le qamûsekanî rîşenasî wuşanda wekû "reçetek nenasraw " aste kirawin.) qisekanî layengiranî boçûnî dûwem lewaneş ziyatirn u defên: her nebê, zor le xesŕetekanî AAVE dekrê şîbikrênewe be wadananî ke yekem Reşe Emrîkayiyekan be coreyek le İnglîsiy Kriyolî (Creole English) qiseyan kirdûwe. Emin lêduwanêkî tewaw heŕdegirm bo bendî 9-î em kitêbe. Eger hasanî bikemewe zaraway kirul (Çreole) bo zimanêkî Pidgin bekardehêndirê ke bûwe be zimanî bûmî komeŕgeyekî axawtin, u her boyeş dîsan perey pêdirawe, u gişt ew erk u xesŕetaney wexo kirdûwe ke zimanêkî tewawî xoŕiskî heyetî. Pîcin zimanêkî kurtkirawe, rêsaboy dandiraw u têkeŕawe, ke le layen ew axêweraney ke zimanî hawbeşyan niye, ba biŕêyn mebestgelî bazrganî, pêşxirawe. Şêwezarekanî İnglîsiy Pîcin êstaş be berbiŕawî le herêmekanî

qerax deryay Efrîqay Rojawa qiseyan pêdekirê. U Çreolekanî Inglîsî ( wate ew Inglîsiye Pîcney ke Kreolî lêndirawin) be berbihawî le layen xetkî Hîndî Rojawa ke reçetekî Efrîqayîyan heye qiseyan pêdekirê. Ew Kreolî ane le şîweî " here pakî" xoyanda destbecê şiyawî lê têgeyştin nîn bo Inglîsî axêweran, egerçî vokabulariyekanyan wek yek wan, u kartêkeriyekî berçawî zimane Efrîqayîyekanyan pêwe diyare.

Ca boye, waydadenên, ke AAVE rastewxo le lehcekanî Inglîsiy Birîtaniyayîyewe nekewtûwetewe, betkû le Inglîsiyekî Kreolî we saz bûwe ke, ba bihêyn zor we ewey Camayîka deçê. Ew boçûne pêy waye ke Reşe Emrîkayîyekanî berayî zimanî bûmiyan zimanêkî Kreolî bûwe, u ew zimane, be mawey safan, le pêvajoy Kreolî welananda (bişuwane bendî 9) zortir u zortir le zimanî Sipiyekan nîzîk kewtûwetewe. Be gutinêkî dî, le katêkda ke êsta be rûnî debê be zimanî reşe Emrîkayîyekan bigutrê Inglîsî, lew xañaney da ke AAVE ciyawazî heye le geş şêwezarekanî dîkey Inglîsîda, ewane akam u derencamî parastinî nîşanekanî Kreolî in. Layengiranî em ruwangeye her weha deñên ke hêndêk weyek çûn le nêwan axawtinî Reşe Emrîkayîyekan u Sipiyekanî Başûrî Emrîka lewaneye le ber kartêkerî ewan le ser axêwere Reşekan bê, nek be pêçewane.

Xaî nêwendî beğhênanewey ew ruwangeye lemeş rîşey ciyawazî lenêwan AAVE u şewekanî dîkey Inglîsî da nîşanekanî rêzimanî ye.

1- Zorêk le axêweranî AAVE le doxî kesî sêyemî tak le zemanî êsta da -s bekar nahênin ca boye şewey wekû he go, it çome, şe like asayî ye. Eme şeweyeke lew zimane Pîcnaneş da her waye ke leser binaxey zimanî Inglîsî heñirawin, her weha le Kreolî kanî Karayîbîş ke le ser binemay zimanî Inglîsî dandirawin her awaye. Layengiranî hefwêstî.

Efrîqayetî deñên ew weyek çûne zor lewe ziyatire ke bikrê be hekwet dabindirê. Le layekî dîkewe dijberanî ew boçûne amaje deken, her wek le bendî 2-î em kitêbeda bînîman. Nebûnî -s le doxî kesî sêyemî tak le zemanî êsta da her weha nîşaneyekî lehcekanî Inglîsiy Birîtaniyayîşe le Angliayay Roje fat u lewane le Norwiç.

2- Yekêkî dîke le xesîete girînge rêzimanîyekanî AAVE nebûnî kirdarî likêner - kirdarî hebûn – e le zemanî êsta da. Em xesîete xaî serekiye lew miştumişey êsta da. Le AAVE da wekû zimanî Rûsî, Mecarstanî, Taylendî u zor zimanî dîke, u lewane, le Kreolî kanîşda ew core ristaney xuwarewe tewaw rêzimananen.

She real nice

They out there

He not American

If you good, you going to heaven

(katêk kirdarî likêner le haletî 'diyar' da bê, wek lem ristane da I know what it is, yan Is şe? hemîşe le zimanî êsta daye ). Başe rîşey ew xeslête le AAVE da le çîdaye? Çreolistekan amaje bewe deken ke Kreolî Ingîlîsiyekanî Karayîb kirdarî likênerî negoŕiyan niye. Wêdeçê qisey ew Çreolistane zor pitew u behêz bê. Çunkû nebûnî kirdarî likêner nîşaneyekî rasteqîney ew Çreole-naeye ke leser zimanî ingîlîsî binyat nirawin u Reşekan le Karayîb qisey pêdeken, u her weha eme xeslêtekîşe ke betewawî le Ingîlîsî Duŕgekanî Birîtaniya (Britîş Isles) da niye.

3- yekêk le xeslête here girîngekanî AAVE hebûnî ' negoŕi be ' ye: wate be kar hênanî formî be wekû kirdar be bê gerdan kirdinî lem nimûnaney xwarewe da,

He usually be around.

Sometime she be fighting.

Sometime when they do it, most of the problems always be wrong.

She be nice and happy.

They sometimes be incomplete.

Le yekem têŕwanînda, ew şêwe bekar hênanî be ye ciyawaz niye lewey ke le hêndêk le lehcekanî Birîtaniya da rûdeda, ke foŕmî I be, he be htd, wek Ingîlîsî standarî he is , I am be kar dehêndirê. Le geŕ eweşda, ciyawaziyekî girîng le nêwan AAVE u gişt şêwezarekanî dîkey Ingîlîsîda heye. Her wek aweŕkarekanî usaŕy u sometimes lew ristaney sereweda nîşandeden, negoŕi be le AAVE da tenê bo ' doxî 'adetî' be kardehêndirê - wate bo hêma kirdin be rûdawêk dekar dekirdirê ke dûpate debêtewe u nek ewey ke berdeyam bê. Ca boye le AAVE da hauguncandinêkî kirdarî heye ke le Ingîlîsiy standard da dest nada.

Şêwezimanî Ingîlîsiy Emirîkayî Efrîqayî (AAVE) Ingîlîsiy Standard

He busy right now.

He's busy right now.

Sometime he be busy.

Sometimes he's busy.

Le Inglîsî standard da formî kirdar le her dûk doxekanda wek yek waye, le katêk da le AAVEda cwên. Le katêkda ristey yekem hêma naka be kirdeweyekî dûpatebûwewey naberdeyam, ewî dûwemiyân deyka. Le AAVE da pêkhatay wekû \*He be busy right now u \*He be my father ristey rêzimanane nîn (ristey dûwemiyân dekrê ew manayêşî têbixuwêndirêtewe ke ' He is only my father from time to time' [wate ew tenê car u bar detuwanê babî min bê ].) Ew core cwêyeyîye le kirdar da be diñiyayiyewe wekû zimane kreolî kan deçê. Le kreolî kanî Karayîb da, haletî kirdar - dabeşbûnî rûdawêk be ser zemanda (ke dekrê dûpate bibêtewe, berdeyam bê, tewaw bikrê u lewane) - girîngiyekî ziyatîrî heye le zeman- wate cêy rasteqîney rûdawêk le zemanda (bişuwane lapeşey 177). Le heman katda, debê bigutirê ke ew core ciyawaziye 'adetî – na 'adetiyanê wenebê bo lehcekanî Dûrgekani Birîtaniyaş (Britîş Isles) nenasiyaw bin, egerçî ewey le wanda rûdeda wenebê be tewawî be heman form bê. Le lehcey konî Dorset da, bo nimûne He beat her be manay 'He beat her on one partiçular oççasion in the past' [ ew carêk le boneyekî taybetî le rabirdû da lewî da ]beranber dananêke legeş He did beat her, be manay ewey ke ew le haletêkî wa dabû ke karêkî ewto bika. Cige lewe le dû layenî dîkeşewe sîstimî nuandinî AAVE le Inglîsiy Standard ciyawaze ( u zor le nizîkewe we hêndêk le zimane Kreolî kan deçê). AAVE u Inglîsiy Standard le formî kirdarî rabirdûy nizîk da hawbeşin: I have talked u le formî kirdarî rabirdûy dûr da: I had talked. Beşam AAVE, cige lemane dû formî dîkeşî heye: I done talked, ke nêwî lênrawe ' layenî tewawkarî ' bo nîşandanî ewey ke kirdeweke tewaw bûwe' u formî I been talked, ' layenî dûr' bo nîşandanî ewey ke rûdaweke le rabirdûyekî dûr da qewmawe. ' layenî tewawkarî' dekrê le hêndêk le lehce Sipiyekanda bibîndirê, beşam 'layenî dûr' wêdeçê şitêkî seyrî AAVE bê (egerçî dibê bigutirê seyrîş niye, çunkû tenanet lewêşda zor bawe).

4- Nîşaneyekî dî çawrakêşî ristesazî AAVE ewey xuwareweye. Le Inglîsiy Standard u şêwezare Sipiyekanî Inglîsiy nastandard da em core ristaney xuwarewe dekirê saz bidrên:

Inglîsî Standard:

We were eating – and drinking too.

Inglîsiy nastandardî Sipî:

We was eatin' – and drinkin' too

Lew şêwezaneda dekrê ke fořmêkî tewawtirîş hebê: "We were eating\_ and we were drinking too", beşam zor asayîtire ke cênawî we u kirdarî yareyderî were/was le ristemaly (çlause) dûwemda labidrên. Le layekî dîkewe le zorêk le Kreolî Inglîsiyekanda, zor asayîtire ke tenê kirdarî yarîdeder

labibrdirê. Wergêrdirawî ew nimûneyey serewe be zimanî Guḫah le ber çaw bigrin, Guḫah, Kreolî kî Inglîsî ye ke le beşêkî terîk kewtûy kenarekanî Başûrî Emrîka qisey pê dekirdirê, Kreolî y Camayîkayî u Sranan, zimanêkî Kreolî y Inglîsiye ke le Surînam qisey pêdekirê:

Gullah: We bin duh nyam – en’ we duh drink, too.

Kreolîy Camayîkayî: We ben a nyam – an’ we a drink, too.

Sranan: We ben de nyang – en’ we de dringie, too.

(lem nimûnane da nyam/nyang - ke be reçetek wuşeyekî Rojaway Efrîqayîye - bişuwane bendî 9) wate = eat [xwardin], bin derxerî zemanî rabirdû yan [kirdarî] yarîdedere - hawterîb bûnî leget I been talked î AAVE le ber çaw bigrin - u duh, a u de nîşaney doxî berdewamîn u hawtay fořmekanî Inglîsî –ing in.)

Be şêweyekî sirincřakêş, egerçîş beřwaletî bê, fořmî AAVE ziyatir wekû Inglîsî Standard u şêwekanî nstandardî Inglîsiy Sipî waye, le rastîda le binawanewe zor ziyatir wek nimûnekanî Kreolî deçê, bew şêweyekî ke be asayî tenê [kirdarî] yarîdeder wela denê:

AAVE: We was eatin’ – an’ we drinkin’, too.

5. Le kotayîda becê ye sê xestetî rêzimananey dîkey AAVE şîbikrênewe: cêgořkêyî nîşaney pirsiyar, It ‘ y bûn ‘ u ‘ herifî îzafey yarîdederî nefî ‘. Rêşakanî nîşaney pirsiyar le pirsiyarî rastewxo le AAVE y da ciyawazin le formî Inglîsiy Standard da u lem core ristaney wekû I asked Mary where did şe go and I want to know did he çome last night da xoyan derdexen .It y bûnayetî le Inglîsiy standard da wek there derdekewê. Le nimûney AAVE da awa: ye:

It’s a boy in my çlass name Coey, It ain’t no heaven for you to go to, Doesn’t nobody know that it’s a God. Em risteyey duwayî herifî îzafey yarîdederî nefîş nîşan deda. Le AAVE da eger risteyek nefiyekî nadiyarî hebû wekû nobody, nothing ew demî yarîderî nefî (doesn’t, can’t ) dekrê bihêndirête seretay riste: Can’t nobody do nothing about it. Wasn’t nothing wrong with that (be lehnî derbiřinekewe).

Duway miştumîř u lêduwanêkî berçaw sebarete be babetî rîşe u serçawey AAVE ta safanî 1980 kan wêdeçû ewaney deŷên em rîşe u serçaweye Efrîqayetî – Kreolî yetiye helwêstiyan dirust bê. Çunkû zor xestet u nîşaney AAVE hen ke le hîçkam lew şêwezare Inglîsiyaney le Duřge Birîtaniyayîyekanda

(Britiŝ Isels) qiseyan pêdekirê nabîndirênewe beŝam lew zimane Kreolî be reçetek Efrîqayîyaneda hen ke le ser binemay zimanî Inglîsî dandirawin u le dewr u berî Uqiyânûsî Atlantîk da qiseyan pêdekirê. Bawekû emeŝ, zor lew nizîkaneda lew bareyewe karêkî zor kirawe ke detê, ew heŝwêstey be Kreolî ayetî danane nek her heŝeye, betkû hemû heqayetekeŝ nagêrêtewe. Hêndêk lew karane le layen Ŝana Poplaçk u hawkarekaniyewe kirawin sebarete be ' tarawgey Emrîkayîye Efrîqayîyekan '. Mebest lew zaraweye amaje kirdine be komeŝgey ew xeŝkaney ke be reçetek Emrîkayîy.

Efrîqayîn beŝam bo çendîn piŝt le derewey dewlête Yekgirtûwekan jiyawin, wekû hêndêk le awedaniyekanî Nova skotia, Kanada, u Samana le komarî Domênîken. Girîngî ew komeŝgeyane bo ew kêŝeyey ke lêre qisey lêwe dekirdirê lew wadanane daye ke axawtinî ewan zor xoparêztire le çaw AAVE y mudêrîn le Dewlête Yekgirtûwekan. Eger ewe wabê, ŝiyawî sirincdanêkî berçawe ke hêndêk le nîŝanekanî taybet be AAVE wekû bo nimûne, be negoř, le axawtinî ewanda nabîndirê. Emeŝ piŝtî ew ruwange ye degirê ke ciyawaziyekanî nêwan AAVE u lehcegelî Sipiyekanî Inglîsiy Emrîkayî akamî be rêje berewpêŝçûnî serbexoy tazen.

Lem saŝaney duwayîda le akamî zêde bûnî zanyarî sebarete be rêzimanî lehcekanî Duřgekanî Birîtaniya (Britiŝ Isles), lêkoŝnewey pêwendîdar kirawin u akamyan geŝtûwete berawurd kirdin u le ber yek ronani ew lehcaneegeŝ forme xoparêzekanî AAVE, ke sebarete bewiŝ be dilniyayiyewe êsta zor lewe ziyatir dezanîn ke demanizanî. Ew kare nîŝan deda ke le jimareyek xeŝlet da AAVE hênd le nizîkewe we lehcekanî Duřgekanî Birîtaniya deçê, yan belanî kemewe deçû u le hênde wurdeřiŝaŝda ke rêgey here jîraney wehîsab hênanîyan eweye bigutirê ke ewan ew formaney lehcegelî Duřgekanî Birîtaniyan ke le layen AAVE we parêzrawin. Bo nimûne, romanînuŝî benêwbangî Emrîkayî Zora Neal Hurston nwênerayetî axêweranî AAVE deka be lehcey Florîda be gutinî ŝitî wek:

Dat's a thing dat's got to go be handled just so, do it 'll kill you.

(le romanî Mules and men, 1935 da)

[êstirekan u piyawekan]

u

Git this spoon betwixt her teeth do she's liable to bite her tongue off.

(le Seraph da, 1948)

Lêre da fořmî do wek pêwelkênîk be kar hêndirawe be manay otheruwise (dena).



Gelo ew forme le kiwêwe dê? tenê serçaweyek heye ke wêdeçê wekû şîkirdineweyek nixî hebê. Ewîş eweye ke le lehce kontirekanî nerîtiy Inglîsî herêmi Angliay Rojezat da, - le bîrman bê her heman herêmi ke he go, şe go şî heye \_ formî be reçetek kirdarî do erkî pêwelkênîş be wurdî be heman mana degêrê bo nimûne nûserêk be lehcey Angliay Rojezat denûsê:

You lot must have moved it, do I wouldn't have fell in.

Sênarîoy here luwaw ewe ye ke em nîşaney lehcey nastandarde le layen mañdaneranî (settlers) Bîrîtaniyayîwe hênra ew cêyey ke êsta Dewlete Yekgirtûwekanî Emrîkaye. Ew core mañdaneraney ke axêwerî lehcegelî Angliay Rojezat bûn u le layen aba u ejdadî axêweranî modêrni AAVE le wan wergîrawe.

Başe ewe demangeyênête kwê ? boçûnî xom eweye ke zor le xesletekanî AAVE renege bikrê be rêgey ew rastiye pasaw bidrên ke zor le yekem Reşekan le Dewlete Yekgirtûwekan be coreyek le kreolî y Inglîsî qiseyan kirdûwe yan her nebê be şêwezarek be nîşanegeli kreolî amalewe - weyekçûn le nêwan AAVE çtreole kanî Rojaway Hîndiy le hêndêk xañ da ewende çawrakêşin ke bo nikûfî lêkirdin naşên. Legeñ eweşda, eme ew şêmane zor pitewe berperç nadatawe ke xesletekanî dîkey AAVE rastewrast le lehce Bîrîtaniyayîkanewe boy be mîrat becê mawin u ewe ke le hêndêk nimûneda kon şêweyî le axawtinî Sipiyan da bizir bûwe dekrê le AAVE da parêzrabê. Le hêndêk nimûnan da, miştumiř u bo yekitr neselmandin sebarete be reg u rîşey AAVE dekrê ta radeyek bê mana bê. Formî kirdarî wek he love, şe do dekrê wek akamî paşxanî kreolî u kartêkerî lehcey Bîrîtaniyayî şî bikrênewe, ke yekyan ewîdiyan be hêz deka.

Dimeteqeyekî dûwem î here serekî u here nizîk sebarete be şitêke ke nêwî lêndirawe ferziyey laderane. Ew lêkoñenewaney ke le sañanî 1990 kanda kirawin deñên, tenanet eger AAVE le kreolî y binema Inglîsîş kewtibête, ke be têpeñîñ sañ u sedan, ziyatir u ziyatir u zor le nizîkewe we ew Inglîsiye deçê ke Emrîkayîkanî dîke qisey pêdeken, êsta ew pêvajoye destî pêkirdûwe ke bikewête rêbazêkî badanewe u pêçewanewe. Pasawî eweş dehênnewe ke êsta AAVE u lehcegelî Emrîkayîye Sipiyan destiyen pêkirdûwe le yekitrî dîr bikewinewe. Be gutinêkî dîke, le lehcegelî Sipiyan gorañ ewto rûdeden ke le AAVE da nîn, u be pêçewaneş her awaye.zor be şêweyekî xořiskî, ew ferziyey le Dewlete Yekgirtûwekan sirincêkî berçawî belay xoyda rakêşawe çunke, eger rast bê, eme tebi'etî dabiřawî komeley Emrîka le ser binemay ciyawazî regezî be şêweyekî diřamatîk u xefetawî denwênê. Manay serdagîrawî ew boçûne eweye ke ew ladan u dîrkewtinewe zimaniyane



le ber nebûnê yekangîrî le nêwan komeşge Reş u komeşge Sipiyekan le Dewlete Yekgirtûwekanî Emrîka da rûdeden, be taybetî le nawçe şariyekanda.

Hafî hazr, zimannasanî Emrîkayî le ser ewe rêk nîn ke be wurdî çî deqewimê. Legeş eweşda, ewe selmawe ew goşane dengiyaney ke le sîstimî wavêlî axêweranî Sipî, bo nimûne, le Philadelphia da rûdeden \_ wekû dirêjkirdinewey wavêl le wuşey wekû write u type da - le Inglîsî axêweranî Reş le 'eynî şar da rûnada. Le layekî diyewe, wêdeçê AAVE kewtibête ber hêndêk goşanî rêzimanî ke be hîç cor şwên Leser lehcegele Sipiyekan naka. Bo nimûne, bekarhênanî doxî dahatûy akamane (future resultative ) y be done wêdeçê dahênanêkî rêzimanî nwê u heta dê ziyatir baw bê le axawtinî axêweranî cwantirî AAVE da, wek ew nimûney xuwarewe ke sirincî zimannasî komeşayetî Emrîkayî

Efrîqayî Cohn Baugh y rakêşa.

I'll be done kişed that motherfucker if he tries to lay a hand on my kid again.  
[emin ew daykî xo...iye dekûjm bêtû carêkî dîke dest le mindafî min heşênêtewe].

#### **Serçawey em wergêrane:**

Peter Trudgill, Sociolinguistics, An introduction to language and society, Fourth edition, Penguin Books, 2000, lapeşey 42 ta 60.

**Têbînî wergêr:** Bo ewey ew çemke zimannasiyaney profêsor Trudgiş lem nûsraweye da bekarî hênanwin baştir bo xwênerewey Kurdî hogirî babetî zimannasane rûn bibnewe le xuwarewe hêndêkyan be kelik wergirtin le

'Şîkirdinewey wuşekanî zimannasî komeşayetî ' A Glossary of Sociolinguistics' y mamosta Trudgiş ke binkey Press Edinburgh University le safî 2003 bişawî kirdûwetewe werdegêşîne ser zimanî Kurdî.

*Substratum* şwêndananî substratum le barî mêjûyiyewe le akamî pêvajoy goşanî zimanda serhe îdeda, ke têyîda, komeşgeyekî axawtin le ber zimanêkî dîke dest le zimanî bûmî xoy heşdegirê, zimanêk ke le sereweşa be serîda sepawe, wate le layen komeşgeyekî zor le xoy be destefatir. Le pêvajoy ew têkeş bûne da axêweranî zimanî seretayî hêndêk le xesîtekanî le zimanî nwê da deparêzin bo nimûne zor car degutrê ke Inglîsiy Irlendî şwêndananî substratum î Gealîkî Irlendî pêwe

diyare. Dij manay zimannasî komefnasaney *sabstratum*, *superstratum* e, ewîş bew şêweyeye ke girûpî zor be destetatir goşanî zimanî de ezimwê, wek ew katey ke derebege bedestetatekanî Frankî Ałmanîzimanî Bakûrî Feřanse destyan le zimanî Ałmanî xoyan hełgirt, bełam hênêk şwênpêy ew zimaneyan beser Feřanseyî modêřin da be cê hêşt. Lem pêwendiyê da zaraweyekî dîkeş heye, ewîş *adstratum* e, emeş be giştî katêk be kar debirdirê ke dû destey komełgey axawtin ke kemptazor destetât u tuwanayîyan wek yek waye u pêwendî leget yekitrî peyda deken u şwên le ser zimanî yekdî deken be bê ewey ke hîçkam le zimanekan biprûkênewe u le nêw biçin. Akamî pêvajoyekî ewto nawçey zimanî "Linguistic area" y lê dekwêtewe.

Pidgin şêwezari zimanêke ke axêwerî bûmî niye u le akamî pêwendî zimanî le barudoxî fire zimanîda saz debê, u erkî zimanêkî hawbeş (Lingua Franca) degêrê. Pîcnekan ew core zimananen ke le zimanêkî serçawe ra be pêvajoy pîcnkirdinda têpeřewin. Derecey ew pîcnandine ewende zore ke têgeyştinî dûlayene leget zimanî serçawe nalwê yan yekcar zor dijwa re. Pîcnekan wek zimanî ronîştû wan. Zorêk le zimananî pîcnî be nêwbang u baş nasraw le zimane serçawe Uřûpayîyekanewe kewtûnetewe wekû Inglîsî u Purtugalî, bełam zor zimanî pîcnîş hen ke rîşeyan le zimane na Uřûpayîyekanewe aw dexonewe.

Creole zimanêke ke ta radeyekî zor kewtûwete ber pîcnkirdin, bełam ew sade kirdinewe u lê kemkirdinewaney ke be pîcnkirdinewe likawin be pêvajoy perepêdan yan kreolî kirdinda tê hefhêndirawnewe, be şêweyekî ewto ke ew zimane komełgeyekî axêwerî bûmî lê saz bûwe u dekrê bo mebestgelî berbiřaw bekar bihêndirê. Ew zimane kreolî aney ke neketûnete ber kreolî lê tekandin be asayî axêweranî zimanî serçawe lêyan têngen. Hêndêk le zimane kreolî here be nêwbangekan birîtîn lew kreolî aney le ser binemay Inglîsî hefnirawin wekû Sranan u Surinam, yek lew kreolî aney ke le ser binaxey zimanî Feřanseyî dandirawe kreolî y Hayîtî ye, zimanî çreolî bineçeke Purtugalî î duřgekanî Çape Verde ye. Çreolekanîş giştyan le ser binemay zimane Uřûpayîyekan danendirawin. Diyare ewe baw bełam nabediře ke her zimanêk zimanî dîkey zor têkef bûbê, şeqfî kreolî y lêdedrê.

## DI ÇAPEMENIYA KURDAN DE TECRÛBEYA NEWPELÊ

**nivîsîn: Roşan Lezgîn**

wergerandin ji zazakî: Husein Muhammed

Merheba beşdarên hêja,<sup>126</sup>

Gava ku em dibêjin “çapemenî (bi tirkî: basın), ji hêla dîrokî ve bi kurtî, tê maneya weşana peryodîk ya çapkirî (metbû) anku rojname û kovarên ku cih didin nûçe û nivîsên fikrî. Lê niha radyo, televîzyon û Înternet jî tevî vê kategoriyê bûne.

Ji ber ku tesîra çapemeniyê li ser civatan anku gel pir zêde ye, vêca her milet, her hêz; desthilat an dijbera, heta her kes, pir pûte û giringiyê dide çapemeniyê. Mirov dişê (dikare) bibêje ku wateya nûjen ya fikra neteweyî, piştî îcadkirina çapxaneyê bi çapemeniyê şikil wergirt û pêşve çû.

Gava ku em behsa “çapemeniya kurdan” dikin, ji ber ku em miletekî bêdewlet in û welatê me bûye çar-pênc parçe, herwiha ji ber ku çend zaravayên me hene, ji ber van sebebana ne hêsan e ku mirov behsa çapemeniyêke birêkûpêk ya hevşêwe û homojen ya kurdan bike. Loma ez dixwazim bi kurtî tenê behsa “çapemeniya kirdkî” (zazakî) bikim. Di vê çarçeviyê de, ez ê hîn zêdetir behsa tecrûbeya rojnameya **Newepelê** bikim.

Eger ez bi kurtî bibêjim, rojnameya *Kurdistan* (22 nîsan 1898) ne tê de, hema bêje, çiqas kovar û rojnameyên ku kurdên Bakur weşandine, kêm-zêde, di hemûyan de kirdkî anku kurdiya zazakî jî cih girtiye.

Bi qasî ku min şiyaye (kariye) tesbît bikim, di van weşanan de kirdkî cih girtiye:

**Hawar** (1932-1943),

**Roja Newê** (1963),

**Roja Welat** (1977),

<sup>126</sup> Bi munasebeta weşana hejmara 100. ya kovara **Deng**, li Diyarbekirê roja 24.01.2016 bi sernavê "**Ji Rabirdû Heta Paşerojê Çapemeniya Kurd**" konferansek hat organîzekirin, ev metin bi awayê axiftinê di vê konferansê de ji aliyê Roşan Lezgînî ve hatiye pêşkêşkirin.

**Tîrêj** (1979-1981),  
**Armanc** (1979-1997),  
**Hêvî** (1983-1992),  
**Rojname** (1991),  
**Nûbihar** (1991-),  
**Nûdem** (1992-2001),  
**Azadî** (1992-1993),  
**Medya Güneşi** (1992-1995),  
**Welat** (1992-1994),  
**Dengê Azadî** (1994),  
**Jiyana Nû** (1994-1995),  
**Ronahî** (1995-1996),  
**Welatê Me** (1995),  
**Azadiya Welat** (1996-),  
**Hêvî** (1996-1999),  
**Nû Roj** (1996),  
**Vate** (1997),  
**Jiyana Rewşen** (1997),  
**Pêşe Roj** (1997),  
**Roja Teze** (1999-2000),  
**Munzur Haber** (2003-2006),  
**Tîroj** (2003-),  
**Kovara W** (2004-2006),  
**Newede Dêrsim** (2009-2010),  
**Rûdaw** (2009),

**Şewçila** (2011-),

**Newepel** (2011-),

**Verroj** (2012),

**Rojnameyê Zazakî** (2013-2014),

**BasNews** (2015)...

Ji van, *Vate*, *Şewçila*, *Newepel*, *Verroj* û *Rojnameyê Zazakî* xwerû bi kirdkî ne. Yên din, wek ku ji navê wan jî diyar e, piraniya wan bi kurmancî ne, hinek jî bi tirkî ne.

Ji van weşanan ez dixwazim behsa rojnameya *Newepelê* bikim.

*Newepel*, wek rojnameyeke kultûrî ya 15-rojî, di eynî demê de wek rojnameya pêşîn a safî bi kirdkî (zazakî) 15ê adara 2011 li Diyarbekirê dest bi weşanê kir. Heta hejmara 50. pazde rojan carekê, piştî wê hejmarê jî mehê carekê li gor peryoda xwe, tam di dema xwe de derdikeve.

*Newepel*, di qebareya tabloîd (28 x 43 cm) û 8-rûpelî ye. Ne rehayî be jî, axlebe rûpela pêşîn bo manşet û nivîsên balkêş, rûpela 2. bo nivîsara edîtorî û xaçepirsê ye. Di hejmarên destpêkê de, li cihê xaçepirsê dersa zimanî û alfabeyê cih digirtin. Rûpela 3. bo nûçeyên kultûrî û ferhengokê ye. Eger nûçeyên giring tine bin, bo nivîsên populer e. Rûpela 4. bo roportajan, roportaj tine bin, nivîsên dirêj yê vekolînê tê de cih digirin. Rûpela 5. jî bo nivîsarên cuda-cuda û helbestan e. Rûpela 6. ya jinan e. Rûpela 7. jî bo berhemên folklorîk e. Û di rûpela 8. de bi piranî nivîsên kurt û navên nebatan cih digirin.

Ji zû ve me niyet kiribû ku li welat, li Diyarbekirê, rojnameyeke safî bi kirdkî biweşînin lê şertên me lê nehatin. Derxistina rojnameya *Newepelê* destpêkê ne wisa hêsan bû. Çimkî baş an xirab me berî wê ti nimûne tine bûn ku em wek nimûne bibînin loma me her tişt ji sifrê dest pê kir.

Berî *Newepelê*, bi alîkariya Sidqî Zîlan û Bîlal Zîlan, me di 2009 de malpera [www.zazaki.net](http://www.zazaki.net) vekiribû. Berî *Zazaki.net*, demeke dirêj min di malpera [www.netkurd.com](http://www.netkurd.com) de bi kirdkî nûçe amade dikirin loma ji aliyê bikaranîna kirdkî di warê rojnameygeriyê û zimanê nûçeyan de gelek tecrûbeya min çêbû. Ev tecrûbe di prosesa *Zazaki.net* de hê pêşve çû. Di vê navberê de min kursên kirdkî jî didan. Kursa ku min li Odeya Tebîban ya Diyarbekirê da, li wir, ji berpîrsên odeyê Dr. Şemsedîn Koç û Dr. Tulîn Savaş û herwiha hin kursiyeran bo heqê dersê nêzîkî 1000 TL berhev kir û da min. Ev cara pêşîn bû ku ji xebatên zimanî pare diketin destê min. Lê min ew pare nexwar, min hejmara pêşîn ya *Newepelê* pê

weşand. Wê demê me bi navê Zivan-Kom komeleyek jî ava kir, ji hêla resmîyetê ve me rojname bi navê vê komeleyê derxist.

Proseya derxistina *Newepelê* pir dijwar borî: destpêkê bi taybetî hin mirovên niyetxirab, hin kesên hesûd, û helbet beşeke endamên tevgerên siyasî xwast xebata me bifetisîn, derketina *Newepelê* bidin rawestin. Lê me bi sebr û sebat, bi ezm û qerar weşandina rojnameyê bi istiqrar dewam kir. Wan kes û derdorên ku dixwastin pêşiya *Newepelê* bigirin, digot “ha filan komele heye, biçin wir kursê bidin, ha bêvan rojname heye, di wê de binivîsin, çima hûn rojnameyeke cuda biweşînin”. Ev derdorên ku xwastin pêşî li xebata *Newepelê* bigirin, kadroyên ku me di çarçoveya xebata *Newepelê* de perwerde kirin, îro ji wan kadroyan istifade dikin, bi wan kadroyan xebatên kirdkî dikin.

Ne ku tenê beşeke kurdan, dewletê jî midaxleyî *Newepelê* kir. Bo nimûne, bi taybetî li Çewligê midaxleyî belavkirina *Newepelê* kir. Hewiha li Xarpêtê, Siwêregê û cihên din rojnameya me li postexaneyê bi zanatî hat windakirin, negihand navnîşana aboneyan. Gelek caran me di encama lêpîrsînan de rojname li postexaneyan tesbît kir.

Em sexbêriyê dikin û dixwazin ku nivîsên di *Newepelê* de bîn weşandin, her yek di warê xwe de wek belge/dokumanî be. Loma nivîsên ku di *Newepelê* de diweşin, ji rojevê nakevin: kengî bîn xwandin, heman tesîrê dikin. Û ji her kategoriyê mirov dikarin her wext wan bixwînin. Di 82 hejmarên *Newepelê* de 1776 nivîsên cuda: helbest, çîrokên nûjen, roportaj, berhevokên folklorî yên wek gotinên pêşyan, îdyom, mamik, lîstik, pêkenîn, çîvanok, stran, metelok û lorik, herwiha nûçe jî tîn weşandin.

Herwiha di 82 rûpelên *Newepelê* de nivîsên 275 kesan weşiyane. Ji van, nivîsên 29 kesan an hatine neqilkirin an jî tercimekirin. 43 jinan û 203 mêran, bi hev re 246 kesan rasterast ji *Newepelê* re nivîsiye. Ji van 246 kesan jî, ji 200 kesan zêdetir cara pêşî di *Newepelê* de dest bi nivîsînê kiriye. Bi sedan kes jî di çarçoveya belavbûna *Newepelê* de hînî xwandina kirdkî bûne. Anku tiştê ku tevgerên kurdan nakin yan jî nikarin bikin, *Newepelê* kir. Hedefa *Newepelê* herdem ew e ku kadroyên zimanî yanî kesên ku bikarin zimanî bi kar binin, pê binivîsin perwerde bike. *Newepel* di vê hêlê de tam wek mektebekê wezîfe dibîne. Anku serkeftina herî berçav ya *Newepelê*, bi vê qaydeyê perwerdekirina nivîskar û xwandevanên kirdkî ye. Beşeke giring ya nivîskarên *Newepelê* êdî herdem dinivîsin. Ji van nêzîkî deh kesî yek an çend kitêbên wan weşiyane. Gelek kesên ku li zanîngehan lîsansa bilind xwand yan jî niha dixwînin, pêşî tecrûbeyan wan di *Newepelê* de çêbû. Herwiha gelek kesên ku niha di televîzyonên kirdkî de dixebitin yan jî ji televîzyonan re metnan tercime dikin, pêşî di *Newepelê* de hînî nivîsîna kirdkî bûne.

Beşa rastkirin û redaktekirina nivîsên kirdkî karê herî zehmet e. Nivîsên ku bo rojnameyê tên, ji hêla edîtor û redaktorê rojnameyê Roşan Lezgînî ve bi her awayî tên rastkirin û redakte dibin. Di karê redaktekirinê de, kîjan herf, peyv yan hevok were rastkirin, bi rengê **sor** yan **şîn** tê îşaretkirin. Û bo ku nivîskar şiklê rastkirî yê nivîsa xwe bibînin, ew ji wan re tê şandin. Eger ne hemû jî, beşek ji nivîskaran bi vî qaydeyê xeletiyên xwe dibînin, di nivîseka din de piçekî din xwe pêşve dibin.

Zimanê hemû nivîsên ku di *Newepelê* de tên weşandin, tam li gor eslê zimanî, li gor rîtm, qeyd û sîstema kirdkî pir paqij redakte dibin û paşî tên weşandin. Gava ku em redakte dikin, ji forma peyvan bêhtir em li hemberî qeydên zimanî hestiyar in. Helbet forma standard ya peyvan jî giring e, lê di redaktekirina *Newepelê* de tiştê eslî, tiştê muhim, tiştê bingeşîn hevoksaziya kirdkî ye anku qeydên zimanî ne.

Gelek kes ji zindanan ji me re dinivîsin. Tabî nivîsên wan bi name wek destnivîs tên. Em nivîsên wan di kompûterê de dinivîsin û dikin dijîtal. Destnivîsên gelek kesan nayên xwandin yan jî pir dijwar tên xwandin.

Piştî ku bi qasî hejmarekê dosye amade dibin, ji edîtorên rojnameyê Bîlal Zîlan rûpelên rojnameyê mîzanpaj dike û ji hevalên ku wek lijneya weşanê ne, ji wan re dişîne. Piştî kontrol- û rastkirinê paşî dosye bo çapxaneyê tê şandin. Eger rojname ji çapxaneyê hat, em bi destê xwe bo aboneyan pakêt dikin û didin posteyê.

Hemû karê rojnameyê em bi destê xwe dikin. Mesrefa çapxaneyê û posteyê jî, li destpêkê û di gelek hejmaran de em ji kîsê xwe didin. Beşek ji firotin û aboneyan, beşek jî hin hevalan wek alîkarî dîrekt daye. Bo nimûne, mesrefa hejmara 34. **Ehmedê Elon**, hejmara 41. **Îsmet Uzelî** alîkariya me kir. Mesrefa hejmara 42 **Xetîce Tepe**, ya hejmara 43 **Nadîre Güntaş Aldatmaz** da. Di hejmara 44. de **Dr. Ahmed Yalinkayayî** alîkarî kir (aboneyî). Mesrefa hejmara 46 **Wedat Saygînî**, ya hejmara 59 **Îdrîs Yazarî** û hevalên xwe, ya hejmara 62 **Uzcan Yilmazî** da. Di hejmara 69 de seyda **Hemîd Hozanî** alîkarî kir. Di hejmara 70. de **Sercan Kişin** û **Memed Emîn Kaçanî** da. Hejmara 71. endamê komeleya me av. **Neymetullah Gunduzî** da (aîdat). Di hejmara 72. de **Hacer Petekkaya** alîkarî kir. Mesrefa hejmara 73. **Necatî Güvenç** û **Aydin Baturî** da. Hejmara 74. **Îdrîs Yazarî** û hevalên xwe, herwiha **Alî Riza Kaya** û **Ugur Sermiyânî**, hejmara 78. **Haşîm Güreli** da. Di hejmara 79. de **Hayrî Bayat**, di hejmara 80. de xanimeke kurmanc alîkarî kir. Hejmara 82. **Cemsî Kaya** û **Hesen Xeyrî Biçici**, hejmara 83. jî **Dr. Muzafer Bahçivanî** da.

Herwiha, herçiqas me navê wan hevalan di rojnameyê de nivîsî, hevalên wek **Roşan Lezgîn**, Av. **Sidqî Zîlan**, **Bîlal Zîlan**, mamosta **Alî Fuad Doğuç**, mamosta **Mistefa Ergüven**, wek aîdata komeleyê be jî Av. **Cîhan Îpek**, Av. **Neymetulah Gunduz** û **Henîfî Pîranij**, hevalên din jî ku nexwast navê wan were nivîsîn, wan jî ji hêla madî ve kê-m-zêde alîkariya madî kir. Ji aliyekî ve şexsen lê ji aliyekî ve jî gelek kesan, abone û bayîyan, herwiha dezgeh, kitêbfiroş û qirtasiyeyan *Newepel* firot lê ji me re pare neşand.

Ji hêla belavkirinê ve, li Almanyayê **İsmet Bor**, li Enqerê **Nûredîn Beltekin** û **Mistefa Şahîn**, li Dêrsimê **Wisif Pîrbab**, li Çewligê **Osman Tetik**, **Newzat Anuk**, **Yaşar Baluken**, **Şahap Laçın** û hevalên din, li Îzmîr û Mêrdînê **Mutlu Can**, herwiha li Mêrdînê **Ednan Oktay** û hevalên din, li li Mûşê **Xetîb Erdoğmuş**, li Diyarbekirê **Dr. Deniz Pîrajmanij**, **Ehmedê Dirihî**, **Seîd Aydoğmuş**, **Hesen Kaçan**, **Henîfî Pîranij**, Av. **Sidqî Zîlan**, Av. **Bîlal Zîlan**, mamosta **Alî Fuad Doğuç** û hîn pir hevalên din demek be jî *Newepel* belav kir.

Belavkirina *Newepelê* zêdetir bi sîstema abonetiye dibe. Aboneyên *Newepelê* di serî de li Almaniya, gelek welatên Ewropayê hene, li Rûsya û Awistralya jî hene. Herwiha li Başûrê Kurdistanê jî hene. Li hindirê Tirkîyê jî, li gelek bajaran aboneyên me hene. Wisa li ser hev li Mêrdîn, Çewlig, Mêrsîn, Enqere, Dêrsim, Mûş, Siwêreg, Solaxan û Stembolê tê belavkirin. Lê li beşek ji van deran, eger mirov ji wir veqetîbe, belavkirina rojnameyê jî sekiniye. Herwiha ji destpêkê heta niha, teqrîben ji nêzîkî sî zindanan re jî em *Newepel* dişînin.

Taybetmendiya *Newepelê* ew e ku ne aîdî ti fikrekê, îdeolojiyekê yan jî hereketeke siyasî ye. Teşebuseke temamen sivil û ferdî ye. Polîtîkaya weşana *Newepelê* kurdîtiyê wek esas digire, weşana xwe li ser zemîna neteweyî devam dike. Mirov dikare xeta fikrî ya *Newepelê* wiha bide nasîn: “Kurdîtî” nasnameyeke makro tarîf dike: di nav vê nasnameya makroyî de gelek nasnameyên mîkroyî hene. Em bibêjin ku kurmancî, soranî, kirdkî, hewramî, lurî û yên din her yek di nav “kurdîtiyê” de nasnameyeke mîkroyî ye, ev hemû vêca “nasnameya kurdîtiyê” tînin meydanê. Loma heqê her nasnameya mîkroyî heye ku xwe organîze bike. Eger wiha nebe, mumkin e ku nasnameyeke mîkroyî di nav yekîtiyê de bihele yan jî ji nav nasmaya makroyî temamen derkeve. Me bi derxistina *Newepelê* ev fikir mişexes kir: fiilen kir heqîqet û aktîv kir.

Berî ku em *Newepelê* derxin, hinek kesan, beşek ji niyeta xwe ya xirab beşek jî ji nezaniya xwe tim gazind dikirin ku çima di televizyonên kurmancî de cih nadin zazakî. Me bi tecrûbeyê *Newepelê* îsbat kir ku eslê problemê ji me dest pê dike. Eger em bi xwe xizmeta kirdkî nekin, kurmanc yan soran



nayên ji me re kirdkî pêşve nabin. Û ji xwe piştî ku me di proseya derxistina *Newepelê* de kadro perwerde kirin, êdî televizyon û rojnameyên kurdan hîn bêhtir cih didin kirdkî.

Xulase tecrûbeya rojnameya *Newepelê* bi taybetî di dîroka pêşveçûna kirdkiya nivîskî de tecrûbeyeke orîjînal û serkeftî ye.\*

---

**Çavkanî:** Nûbihar, Kovara Çandî Hunerî Edebî, Hejmar: 134, Stenbol, Zivistan 2016, r. 71-74

## TEWANG

### *Fêrgîn Melîk Aykoç*

Wekî hemû zimanê Indo – Cermen di zimanê me de jî, gava navdêr di nava hevokê de tên bikaranîn, li gor rewş û bikaranînê tên tewandin, yan jî kişandin. Di vi warî de jî mirov nikane tewanga navdêrên zimanekî li gor zimanên din bikarbîne. Divê mirov her zimanî di nava têgîhîştina wî zimanî de binirxîne.

Li gel gelek zanyarên zimanê Indo-germanî, li gor Prof. Hans Krahe jî di bingehê zimanê Indo – Cermen de heşt awayê tewangê, yanê heşt tewînek hene. Lê îro di piraniya zimanan de hin ji van tewînekan funktionên xwe wenda kirine, yan jî wekî zimanê me, hin ji van bi alîkariya daçekan tên çêkirin. Gava em van tewînekên bingehîn rêz bikin wiha ye:

**1 – Nominativ (xwerû / radêr), 2 – Akkusativ (tewandî), 3 – Dativ (tewanga jêre), 4 – Genitiv (xwedîtî /peywendî), 5 – Ablativ (Jêve, jêder), 6 – Lokativ (cîgehî), 7 – Vokatîv (bangî), 8 – Instrumentalis (hogirî /hevrêyî).**

Dema mirov tewînekên ku bi alîkariya daçekan tên kişandinê jî wek tewînek binirxîne, van hemû tewînekan di zimanê me de dibîne. Emê di vir de tewangê di bin sê xalan de binirxînin. **Yek; tewanga dijî. Du; tewanga di nav hev de helyayî. Sê; Tewanga bi alîkariya daçekan tê têçêkirin.**

### N 27 – Tewanga dijî

Di Kurdî de bi tevê forma danasînê çar tewînekên dijî hene.

-Di tewangê de du awayên hêjmaran hene. Yek yekhêjmar du gelhêjmar

Mînak:

yekhêjmar    gelhêjmar

mêr	mêr
Mêrek	mêrine
jin	jin
jinek	jinine

Di hevokê de:

Mêr hatin. (Yanê mêran, pirr mêr hatin.)

Mêrên çê hatin. (Di tewangê de gelhêjmarî xuya dike.)

Jin çûn. (Ango jinan, pirr jin çûn.)

Jinên bedew çûn. (Piranî di tewangê de bi zelalî xuya dike.)

**1- Tewîneka xwerû (radêrî, nomînatîv, rectûs, yalin hal)**

Di vê tewînekê de dengdêrên navdêran nerm nabin, navdêr ti paşgîn û pêşgînan nagirin. Wek rewşa xwe ya bingehîn dimînin.

Mînak:

Ez Kurd im.	Kurd
Dar hişk bûye	dar
bizin çilo dixwe	bizin, çilo
Nêrî kol e	nêrî
Hêvî lê nemaye.	hêvî ûwd.

Mînakên C. Bedirxan.

Hesp hat.

Mehîn dibeze.

Dotmam dikene.

Ji klasîkên me:

„Ew ruh û cesed bi yek ve mînzem.“

(Ehmedê Xanî. „Mem û Zîn.“)

„Her av, mal xirab, bi bez

Qewî bi fûr dikişê her lez.“

(F. Teyran. „Hey Av“)

**2-Tewîneka tewangî (deklînîrte, obliquus -Akkusatîv, Ismîn „î“ ve „e“ halî)**

Ev hima bigire wekî bikaranîna zayendê ye.

I- Bi paşgîna zayendê

Mînak:

Yekhêjmar

Rengê hespî (Ev forma ji bo nêran li bakur gelek kêr, li başûr gelek caran tê bikaranîn.)

Rengê mehîne (ev zayend li her derê tê bikaranîn.)\*

Gelhêjmar

Rengên hespan.

rengên mehînan.

Li Amedê,

Ez li Amedê me.

Ez ji Amedê tēm

Wî mērî nan nexwar.

Wê keçikê li min nêrî

Mêran nan nexwrin

Mêrên gund nan nexwarin

Keçikên bedew kilam gotin

Keçikên gund kilam gotin.

II- Bi alîkariya nermbûna dengên stûr.

Bi giranî navdêrên yek tej (kîte) û navdêrên pirr tej (kite) de tîpa „a“ ya di teja dawî de nerm dibe. Li hin deveran wek hin deverên Serhedê nermbûna dengên stûr rabûye, tenê zayend tê bikaranîn. Yanê di cîhê „bajêr“ de „bajarê“ tê bikaranîn.

Di Kurdî de bi giranî di navdêrên nêr de tîp „a“ ya di nav teja (kîteya) dawî de nerm dibe. Hin peyvên bi tîpa „a“ diqedin jî, nerm dibin.

Mînak. 1

Tewînek I

tewînek II

bikaranîn

aş

êş

ez diçim êş.

ba

bê

bide ber bê/bayê. \*\*

axa

axê

cîh bide axê.

xanî

xênî

dîwarê xênî.

bajar

bajêr

ez diçim bajêr

ziman

zimên

wî derdê xwe anî zimên.

çiya

çiyê

ez diçim çiyê

beran

berên

Ez berên difiroşim

ga

gê

Ez giha didim gê.

III- Di pêyvên mê yên bi tîp „e“ diqedin de tenê ya dawiyê xwe diguhezîne „ê“. Forma wan ya dirêj jî li hin deveran tên bikaranîn.

<u>Peyv</u>	<u>Forma qurçimîforma fireh</u>	
Mase	li ser masê	li ser maseyê binêre.
Şûşe	di şûşê de	di şûşeyê de.
Maşe	li ber maşê	li ber maseyê
Gore	di gorê de	di goreyê de.
Pencere	li ber bencerê	li ber pencereyê rawestiyaye.
Ode	li odê rûniştiye	li odeyê rrûniştiye.

IV- Eger navdêr bi tîpa „a“ biqede tîpa a nerm dibe.

Mînak:

<u>Peyv</u>	<u>nermbûn /qurçim</u>	<u>forma fire</u>
Manga	Mangê giha xwar.	Mangeyê giha xwar
Çira	Çirê vêxe.	Çireyê vêxe.
Reşeba	reşebê avêtiye juniyê min.	reşebeyê (reşebayê /romathizma)

Mînakên C. Bedirxan:

Yekhêjmar

Nêr mê.

Ez hespî dibînim.

Ez mehîne dibînim.

Ez mirovî dibînim.

Ez dotmamê dibînim.

Gelhêjmar

Ez hespan dibînim

Ez mehînan dibînim.

Ez mirovan dibînim.

Ez dotmaman dibînim.

Ji klasîkên Me:

„Ji kezevê dadixilî

Her dil bike şîn û gîrî.

....

Li nav xelkê belav kiriye.“

(F. Teyran.)

„Bi rojê ra tu hevdeng î,

Du roştêzên sîyah reng î.“

(Meleyê Cizirî)

### **3-Tewîneka xwedîtiyê (genîtîv)**

Bi tevhevî wek bikaranîna zayendê ye. Mînak:

Binavkirî (penî)

a- Zayenda mê:

Pirtuk

Pirtuk<sub>a</sub> min.

Pirtuk<sub>a</sub> qalind y<sub>a</sub> bavê min e

Pirtuk<sub>a</sub> dîrokê y<sub>a</sub> bavê min wenda bûye.

b-Zayenda nêr

bav

Bavê min

Dilê bavê min dêşe (têşe).

Beranê sor.

Beranê sor yê mala bavê min e.

Hespê şê yê hevalê min e. (şê: hespê çîmik /ling spî)

Nêriyê kel yê apê min e.

c-Gelhêjmarî

Pirtûkên qalind yên li ser teregê. (tereg = raf /ref)

Bavan nan xwar.

Beranên sor yên li mêrgê diçêrin.

Hevalên çê yên bavê min li mala me nan xwarin.

Nebinavkirî (nepenî)

Yekhêjmar

Nêr

mê

mêrekî çeleng

Jineke bedew

kevirekî sor

pirtûkeke qalind



Gelhêjmar.

mêrine zana	jinine bedew
kevîrine sor	pirtukine qalind.

d-Di bikaranînê de kurtbûna dengan. ji ber ku dengdarê „y“ niv dengdêr e, „ê, î“ ya lî pêş tîpa „y“ kurt dibin û xwe diguhezîne „i“.\*\*\*

Pê	piyê min dêşe.
dê	diya min hat
rê	riya azadiyê dirêj e.****
Mî	miya me
Bî	biya gelî
Sî	siya daran

Mînakên C. Bedirxan:

Binavkirî (penî)

Yekhêjmar

<u>Nêr</u>	<u>mê</u>
------------	-----------

Destê min	mala spî
Hespê boz	mehîna qenc (bi rengdêr re)
Nanê tenûrê	Şeva baranê (bi naveke re)
Goştê wî	kera wî. (bi cînavan re)

Gelhêjmarî

Hespên boz.

Nanên tenûrê

Mehînen Soro.

Nebinavkirî (nepenî)

Yekhêjmar

Nêr

Mê

Hespekî boz

Mehîneke qenc

Nanekî hişk

Dareke mezin.

Gelhêjmarî.

Hespine boz

Mehînine axê (axa).

Ji klasikên me:

„Ey dîlbera gerden zerî  
way nazika dem qemerî.

(...)

Ferman ji destê keserê

Avik ji ava kewserê...”

(F. Teyran. Dîlber.)

„Yek rengêkî sirfê alemê xeyb

Zahîr dikir îtîhadê lareyb.“

(E. Xanî. Mem û Zîn.)

„Ji bûka ziman ra ku pêşkêş kirin.“

(Cîgerxwîn.)

e)Di zimanê me de formeke kevin jî heye. Ev form hima bigire ji qada bikaranînê rabûye. Ji hozanên me Elî Harîrî bigire hetanê tê digêhêje Mîr Celadet Bedirxan piraniya wan bikaranine. Em mîna keke bidin.

„Hûn bar mekin xemên di zor

Le hesreta vardên di sor

Çavên di reş bisk têne dor,

Eniya bi nûr tarî dike.“

(Eli Harîrî)

Binavkirî (penî)

Yekhêjmar:

Forma gurçimî

Forma fire

Ev beranê di Sîdar e,

Ev beran yê di Sîdar e.

Ev bizina di Sîdar e

Ev bizin ya di Sîdar e.

Beranêd Sîdar.

Gelhêjmar

Forma gurçimî

Forma fire

